



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

FRAZ DI KURMANCÎ DE

Halil AKGÜL

TEZA LÎSANSA BILIND

Şêwirmend
Doç. Dr. Zafer AÇAR

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KURMANCCADA SÖZ ÖBEKLERİ

Halil AKGÜL

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Danışman
Doç. Dr. Zafer AÇAR

NAVEROK

NAVEROK	I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	III
TEZ ONAY SAYFASI	IV
PÊŞGOTIN	V
KURTE	VI
ÖZET	VII
ABSTRACT	VIII
LÎSTEYA TABLOYAN	IX
LÎSTEYA ŞEKLAN	X
KURTEPEYV	XIII
DESTPÊK	1
Pirsa Lêkolînê û Mijara Tezê	3
Armanca Tezê	4
Rêbaza Tezê	5
Lîteratûr	6
Sînor û Zehmetiyên Tezê	8
1. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ	10
1.1. Fraz	24
1.1.1. Binavkirin û Dabeskirina Frazan	26
1.1.2. Binyada Frazan û Dara Sentaksê	27
1.2. Ji Perspektîva Teoriyan ve Fraz	32
1.2.1. Rêzimana Veguherînî-Hilberîner (Transformational-Generative Grammar)	34
1.2.2. Teoriya X-Barê (<i>X-Bar Theory</i>)	34
1.2.3. Teoriya Rêvebirin û Girêdanê (<i>Government & Binding Theory</i>)	37
1.2.4. Programa Mînîmalîst (<i>Minimalist Program</i>)	39
1.2.5. Hevparî û Cudahiyên van Teoriyan	40
1.2.6. Binyada Avaker (<i>Constituent Structure</i>)	41
1.2.6.1. Testê Avakeriyê (<i>Constituency Tests</i>)	42
1.2.6.1.1. Testa Beşa Risteyê (<i>The Sentence Fragment Test</i>)	42
1.2.6.1.2. Pirsêñ Dengvedanê (<i>Echo Questions</i>)	45
1.2.6.1.3. Hevokên Veqetandî (<i>Cleft Sentences</i>)	45
1.2.7. Rêzikên Binyada Frazan (<i>Phrase Structure Rules</i>)	48
2. FRAZ DI KURMANCÎ DE	56
2.1. Îzafe û Ravek	56

2.2. Cureyên Frazan	67
2.2.1. Fraza Navdêrî (<i>Noun Phrase</i>)	67
2.2.2. Fraza Daçekî (<i>Adpositional Phrase</i>)	82
2.2.3. Fraza Hokerî (<i>Adverbial Phrases</i>)	90
2.2.4. Fraza Rengdêrî (<i>Adjectival Phrase</i>)	96
2.2.5. Fraza Lêkerî (<i>Verb Phrase</i>)	102
ENCAM	122
ÇAVKANÎ	125
PÊVEK	135
Ferhengoka Têgehan	135

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım “*Fraz di Kurmancı de*” adlı çalışmanın her aşamasında, başlangıçtan sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğim ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu taahhüt ederim.

26/06/2024

Halil AKGÜL

TEZ ONAY SAYFASI
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Halil AKGÜL tarafından hazırlanan **FRAZ DI KURMANCÎ DE** başlıklı bu çalışma, 27.06.2024 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliği* başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Danışman	: Doç. Dr. Zafer AÇAR	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDÖĞDU YÜCEL	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YONAT	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/....../2024 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen juri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

PÊŞGOTIN

Ziman, ji amûreke ragihandinê wêdetir e; lêdana dilê çandê, olandana dîrokê û hilgirê nasnameyê ye. Di nav tora aloz a zimanê însanan de, zimanê kurdî, li ber xwe daye û ûroroj jî bi hemû qewîniya xwe ve, li ser xwe ye, zindî ye. Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûdê Bazidî, Celadet Alî Bedirxan û bi sedan xemxurên zimanê kurdî nasnamaye berxwedêr a neteweyî ava kirine û emanetî zimên kirine. Îro, wekî ferdekî vê nasnameyê gelekî şanaz im ku bi vê xebatê besdarî hewla xurtkirin û bipêşxistina zimanê kurdî dibim.

Mijara frazan ji bona fahmkirin û têgihiştina binyada zimanekî gelekî giring e. Têgeha frazê li gorî dîroka xebatêni li ser zimên, têgeheke nû ye û di diyalekta kurmancî de xebatê berfireh kêm in. Ji ber vê egerê min xwest bi teoriyên nûjen ên zimannasiyê ve binyada frazên kurmancî di lîteratûrê de cih bigirin. Bi vî awayî, hevî ev e ku bi fahmkirin û têgihiştina mijara frazan re, dê hem hînbûn hem jî hînkirina kurmancî hêsanter bibe û dê axêverên/bikarînerên kurmancî karibin ji aliyê wateyê ve risteyên xurttir ava bikin. Dê ragihandin xurttir bibe û ji bo zimanekî standard bingehek ava bibe.

Ev xebat, ji bo ku -hema bes bi gavekê be jî- hêzê bide zimanê kurdî da ku lêdana dilê çanda kurdî û olandana dengê dîroka kurdî bidome, bi alîkariya xemxurên kurdî temam bû. Şêwirmendê min Doç. Dr. Zafer AÇAR ji destpêkê heta dawî di hemû merheleyan de helwesteke ferzane nîşan da. Mamosteyên min, Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN, Dr. Hêmin Omar AHMAD, Dr. Ömer DELİKAYA, Zafer ATLI, Şerif GÜZEL, Buşra GÖKALP û Muhammed İkbal DENİZ her ku min li deriyê wan xist, bi germahiya malbatî derî ji min re vekirin û alîkariya min kirin. Hevalên min, Suzan YALÇIN, Serhat ARÎ û İhsan ARSLAN çavkaniyên sereke yên moralê min bûn. Malbata min, bi sebr û xweşbîniyê hertim piştgiriya min kir. Spas ji we tevan re, mala we ava, mala kurdî ava...

Halil AKGÜL

06.06.2024

KURTE

Ev tez giringiya frazên diyalekta kurmancî ya di nava yekpareyiya binyadî û wateyî ya zimên de berçav dike. Fraz, wekî hêmanên avaker ên zimên kar dîkin û ev hêman bi roleke giring radibin ji bo diyarkirina wateya risteyê. Di kurmancî de mijara frazan di nav du mijarêng rîzimana klasîk de heliyaye. Ravek û Îzafe ev du mijar in ku heta îroroj nehiştine komepeyvîn kurmancî bi rîzikên rîzimana gerdûnî were vekolîn.

Mijara ravekan kiriye ku frazên kurmancî xelet werin senifandin û binavkirin. Ji ber mijara îzafeyê jî hin fonksiyonêng girêdanê yên kurmancî nehatine dîtin, lewma hin taybetmendiyêng binyadî û wateyî yên zimên hatine pişguhkirin. Mijara frazan giring e ji ber ku dihêle xusûsiyetêng gramatîk ên sentaksa zimanekî baştir bê fehmkirin û risteyêng aloz bi hêsanî bêng verisandin. Herwiha, bi xêra fahmkirina frazan, ziman ji aliyê wateyê ve jî geş dibe ku axêverên zimên dikarin risteyêng kompleks saz bikin.

Heger frazên kurmancî baş neyên fahmkirin an jî xelet bêng senifandin û binavkirin, dibe ku di xebitîna zimên de pirsiyarêng mezin rû bidin. Ji ber vê egerê, di vê xebatê de frazên kurmancî di çarçoveya rîzikên rîzimana gerdûnî de tên vekolîn.

Armanca sereke ya vê xebatê ew e ku binyad û fonksiyonêng frazan di kurmancî de bi rîbazên modern ên zimannasiyê analîz bike û wan di çarçoveya rîzikên rîzimana gerdûnî de binixîne. Mijara frazan ji bo têgihiştina binyada zimanekî gelekî giring e, lê mixabin di kurmancî de xebatêng berfireh ên li ser vê mijarê kêm in. Ev tez hewl dide ku vê valahiyê dagire û bi teoriyêng nûjen ên zimannasiyê ve binyada frazên kurmancî di lîteraturê de bi cih bike.

Me xebata xwe bi rîbaza şayesî, li ser nimûneyêng kurmancî ava kir û hin caran me nimûneyêng kurmancî dan ber zimanêng din. Ji ber ku xebatêng li ser mijara frazên kurmancî kêm in, me piranî ji çavkaniyan biyanî sûd wergirt. Derbarê têgehan û kurtkirinêng têgehan de, beramberî zimanê İngilîzî me hewl da têgeh û kurtkirinêng kurmancî bi kar bînin û pêşniyaz bikin.

Ev tez bi taybetî li ser frazên di diyalekta kurmancî ya zimanê kurdî de disekine. Lêkolîn bi awayekî giştî li ser pênc cureyêng sereke yên frazan hatiye kirin: fraza navdêrî, fraza daçekî, fraza hokerî, fraza rengdêrî û fraza lêkerî. Ji ber ku mijara frazan di kurmancî de gelekî berfireh e, ev xebat tenê li ser binyad û taybetmendiyêng bingehîn ên van frazan rawestiyaye. Herçiqas carinan berawirdkirin bi zimanêng din re hatibe kirin jî, armanca sereke ya vê xebatê ne berawirdkirina kurmancî bi zimanêng din re ye. Di vê lêkolînê de, ji bilî diyalekta kurmancî, diyalektêng din ên zimanê kurdî nehatine vekolîn.

Di encamê de me dît ku binyada frazî ya kurmancî li gorî rîzikên rîzimana gerdûnî dikare bê ravekirin û pênasekirin. Bi vî awayî hat dîtin ku senifandin û binavkirina ravekan xelet e û îzafe hin fonksiyonêng kurmancî diniximîne. Ravekirin û pênasekirina frazên kurmancî di çarçoveya rîzikên gerdunî de, dê siruştîya gerdunî ya kurmancî bikirpîne û têkariyê li lîteratûra zimannasiyê bike. Herwiha, ev xebat dê bibe alîkar da ku taybetmendiyêng binyadî û fonksiyonî yên kurmancî bêng fahmkirin. Bi vî awayî, di hînbûn û hînkirina zimên de dê nêrînêng nû ava bike.

Miftepeyvîn Sereke: Kurmancî, Komepeyv, Fraz, Ravek, Îzafe.

ÖZET

Bu tez, Kürtçenin Kurmancca lehçesindeki söz öbeklerinin dilin yapısal ve anlamsal bütünlüğü içindeki önemini vurgulamaktadır. Söz öbekleri, dilin kurucu yapı öğeleri olarak işlev görür ve cümlenin anlamını belirlemede önemli bir rol oynarlar. Kurmanccada söz öbekleri konusu, klasik dilbilgisinde yer alan tamlama ve izafe konuları içerisinde erimisti. Bu iki konu, Kurmancca söz öbeklerinin evrensel dil bilgisi kuralları ile incelenmesine engel olmuşlardır.

Tamlama konusu Kurmancca söz öbeklerinin yanlış sınıflandırılması ve adlandırılmasına sebep olmuştur. İzafe konusu nedeniyle de Kurmanccadaki bazı bağlama fonksiyonları göz ardı edilmiştir. Bu yüzden, dilin bazı yapısal ve anlamsal özelliklerine degeinilmemiştir. Söz öbekleri konusu önemlidir çünkü bir dilin söz diziminin dilbilisel özelliklerinin daha iyi anlaşılmasını ve kompleks tümcelerin daha kolay parçalanmasını sağlar. Ayrıca, söz öbekleri konusunun anlaşılmasıyla beraber tümceler anlam bakımından zenginleşir, böylece dil konuşucularının daha karmaşık tümceler üretmelerine olanak sağlar.

Kurmanca söz öbeklerinin tam olarak anlaşılmaması veya yanlış sınıflandırılıp adlandırılması, dilin işleyişinde büyük sorunlara neden olabilir. Bu yüzden, bu çalışmada Kurmancca söz öbekleri evrensel dilbilgisi kuralları çerçevesinde incelenmektedir.

Bu çalışmanın temel amacı, Kurmanccadaki öbeklerin yapısını ve işlevlerini modern dilbilim yöntemleriyle analiz etmek ve bunları evrensel dilbilgisi kuralları çerçevesinde değerlendirmektir. Öbek konusu bir dilin yapısını anlamak için çok önemlidir, ancak ne yazık ki Kurmanccada bu konuda kapsamlı çalışmalar azdır. Bu tez, bu boşluğu doldurmayı ve modern dilbilim teorileriyle Kurmancca söz öbeklerinin yapısını literatüre kazandırmayı amaçlamaktadır.

Çalışmamızı betimleme yöntemi ile Kurmancca örneklerle destekleyip gerektiğinde diğer dillerle karşılaştırdık. Kurmancca söz öbeklerilarındaki çalışmaların yetersizliği nedeniyle çoğunlukla yabancı dildeki kaynaklardan faydalandık. Kavram ve kavram kısaltmaları konusunda İngilizce kavramlardan yararlanıp Kurmancca kavram ve kısaltmalar kullandık ve öneri olarak sunduk.

Bu tez özellikle Kürtçe dilinin Kurmancca lehçesindeki söz öbekleri üzerine odaklanmaktadır. Araştırma genel olarak beş ana öbek türü üzerine yapılmıştır: ad öbeği, edat öbeği, zarf öbeği, sıfat öbeği ve fiil öbeği. Kurmanccada öbek konusu çok geniş olduğundan, bu çalışma sadece bu öbeklerin temel yapı ve özelliklerini üzerinde durmuştur. Zaman zaman diğer dillerle karşılaştırmalar yapılmış olsa da, bu çalışmanın temel amacı Kurmanccayı diğer dillerle karşılaştırmak değildir. Bu çalışmada, Kurmancca lehçesi dışında, Kürt dilinin diğer lehçeleri incelenmemiştir.

Sonuç olarak, Kurmancca söz öbeklerinin evrensel dilbilgisi kuralları ile açıklanabilip tanımlanabildiğini görmekteyiz. Böylece görüldü ki tamlama sınıflandırılması ve adlandırılması hatalıdır ve izafe konusu bazı Kurmancca dil işlevlerini gizlemektedir. Evrensel dilbilgisi kuralları çerçevesinde Kurmancca söz öbeklerinin açıklanması ve tanımlanması Kurmanccanın evrensel doğallığını vurgulayacak ve litaretüre katkı sağlayacaktır. Ayrıca, bu çalışma Kurmanccanın yapısal ve işlevsel özelliklerinin anlaşılmasını sağlayacak ve dilin öğrenme ve öğretilmesinde yeni bakış açıları yaratacaktır.

Anahtar Kelimeler: Kurmancca, Kelime Grupları, Söz Öbekleri, Tamlama, İzafe.

ABSTRACT

This thesis emphasizes the importance of phrases in the structural and semantic integrity of the Kurmanji dialect of Kurdish. Phrases function as constituent elements of the language and play an important role in determining the meaning of a sentence. In Kurmanji, the topic of phrases has been merged into the classical grammatical topics of "ravek" and "ezafe". These two topics have prevented the study of Kurmanji phrases with universal grammatical rules.

The "ravek" issue has led to the misclassification and naming of Kurmanji phrases. Due to the issue of "ezafe", some linking functions in Kurmanji have been ignored. Therefore, some structural and semantic features of the language have not been addressed. The topic of phrases is important because it provides a better understanding of the grammatical features of a language's syntax and makes it easier to break down complex sentences. Moreover, with an understanding of phrases, sentences become richer in meaning, thus enabling speakers to produce more complex sentences.

Incomplete understanding or misclassification of Kurmanji phrases can cause major problems in the functioning of the language. Therefore, this study analyzes Kurmanji phrasal verbs within the framework of universal grammatical rules.

The main purpose of this study is to analyze the structure and functions of phrases in Kurmanji using modern linguistic methods and to evaluate them within the framework of universal grammatical rules. The topic of phrases is very important for understanding the structure of a language, but unfortunately there are few comprehensive studies on this subject in Kurmanji. This thesis aims to fill this gap and bring the structure of Kurmanji phrasal verbal phrases to the literature with modern linguistic theories.

We have supported our study with examples in Kurmanji using the descriptive method and compared it with other languages when necessary. Due to the insufficiency of studies on Kurmanji phrases, we mostly used foreign language sources. In terms of concepts and abbreviations, we utilized English concepts and abbreviations, used Kurmanji concepts and abbreviations, and presented them as suggestions.

This thesis focuses specifically on phrases in the Kurmanji dialect of the Kurdish language. The research is mainly focused on five main types of phrases: noun phrase, prepositional (adpositional) phrase, adverb phrase, adjective phrase and verb phrase. Since the topic of phrases in Kurmanji is very broad, this study focuses only on the basic structure and features of these phrases. Although comparisons with other languages have been made from time to time, the main purpose of this study is not to compare Kurmanji with other languages. In this study, other dialects of Kurdish language other than Kurmanji were not analyzed.

As a result, we see that Kurmanji phrases can be explained and defined with universal grammatical rules. This shows that the classification and nomenclature of phrases is erroneous and that attribution conceals some Kurmanji linguistic functions. Explaining and defining Kurmanji phrases within the framework of universal grammatical rules will emphasize the universal naturalness of Kurmanji and contribute to the literature. Moreover, this study will provide an understanding of the structural and functional features of Kurmanji and create new perspectives in the teaching and learning of the language.

Keywords: Kurmanji, Word Groups, Phrases, Ezafe.

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1.1. Hêmanên sereke yên risteyê.	16
Tablo 1.2. Rêzika cihguhertina hêmanên risteyê.	16
Tablo 1.3. Rêzika pevguherîna hêmanên risteyê.	17
Tablo 2.1. Veqetandekên kurmancî.	57
Tablo 2.2. Li gorî Açar (2014) veqetandekên serbixwe yên berî rengêderan.	64

LÎSTEYA ŞEKLAN

Şekl 1.1. Hêmanên avaker.....	18
Şekl 1.2. Morfemên risteyê û tekiliyên wan ên bi hev re.....	18
Şekl 1.3. Têkiliya morfeman bi binyada risteyê re.	18
Şekl 1.4. Têkiliya di navbera yekeyên risteyê de. (Kayabaşı, 2018: 280)	21
Şekl 1.5. Dara sentaksê ya "Zarok nêñ dixwe".....	22
Şekl 1.6. Rêzikên kategoriyî û hilbijêrandinê.	23
Şekl 1.7. Hêmanên avaker ên risteya "Dîlan dimeşe".....	28
Şekl 1.8. Hiyerarşıya dara sentaksê.....	29
Şekl 1.9. Girêk (nodes) û etîketên kategoriyan.....	29
Şekl 1.10. Dara sentaksê ya fonksiyona (rola gramatîk) pêkhateyan.	33
Şekl 1.11. Li gorî Teoriya X-Barê diyagrama avaker.....	35
Şekl 1.12. <i>The tall student of physics with red hair.</i> (Carnie, 2020c)	36
Şekl 1.13. Modela Teoriya Rêvebirin û Girêdanê. (Black, 1999: 2)	37
Şekl 1.14. Prensibên Teoriya Girêdanê.....	38
Şekl 1.15. Prensîba girêdana anaforê ji bo zimanê endonezî. <i>Kakak Adi memuji dirinya.</i>	39
Şekl 1.16. Verêsına rêzikên binyada risteya zimanê îngilîzî.	49
Şekl 1.17. Dara sentaksê ya " <i>A burglar shot the man with a gun</i> " (Dizekî, bi çekê berda zilêm).	51
Şekl 1.18. Dara sentaksê ya " <i>A burglar shot the man with a gun</i> " (Dizekî berda zilamê bi çek).	52
Şekl 1.19. Dara sentaksê ya " <i>The children hope that the teacher knows that the principal said that the school closes for the day</i> ".	54
Şekl 2.1. Dara sentaksê ya "Xelîlê Mihemedî dikare bi herikbarî pirtûkên kurmancî bixwîne".....	66
Şekl 2.2. Dara sentaksê ya "Xelîl û Mihemed dikarin pirtûkan bi kurmancî, herikbar û nermok bixwînin".	66
Şekl 2.3. Dara sentaksê ya "Zarokê li kuçê yê di nav heriyê de".....	72
Şekl 2.4. Dara sentaksê ya "*Zarokê li kuçê di nav heriyê de".	73
Şekl 2.5. Dara sentaksê ya "Zarok û dikê li kuçê yên di nav heriyê de".....	74
Şekl 2.6. Dara sentaksê ya "keç û xortêñ jîr û jêhatî".	74
Şekl 2.7. Dara sentaksê ya Teoriya X-Barê "Lawê şivêñ yê di nava heriyê de".	75

Şekl 2.8. Dara sentaksê ya "ev keçika ku ez jê hez dikim".....	76
Şekl 2.9. Dara sentaksê ya "ev keçika ku ez jê hez dikim".....	76
Şekl 2.10. Dara sentaksê ya "ev keçika cîrana me ya ku ez jê hez dikim".	77
Şekl 2.11. Dara sentaksê ya "ev keçika cîrana me ya ku ez jê hez dikim".	77
Şekl 2.12. Dara sentaksê ya "qîza xalê bavê min".	78
Şekl 2.13. Dara sentaksê ya "qîza xalê bavê min ya li Mêrdînê".....	79
Şekl 2.14. Dara sentaksê ya "*lawê mezin ê xalê min".	80
Şekl 2.15. Dara sentaksê ya "lawê xalê min ê mezin".	80
Şekl 2.16. Dara sentaksê ya "herdu lawên xalê min ên mezin".	81
Şekl 2.17. Dara sentaksê ya "Qîzeke min nehatiye".	81
Şekl 2.18. Dara sentaksê ya "Ez bi bavê xwe re axivîm".	86
Şekl 2.19. Dara sentaksê ya "Ew du sal berê li Mêrdînê bû".....	86
Şekl 2.20. Dara sentaksê ya (69b)yê: "Pirtûka min li malê li ser masê di qutiya bîçûk de ye".	87
Şekl 2.21. Dara sentaksê ya (69c)yê: "Pirtûka min li malê li ser masê di qutiya bîçûk de ye."	88
Şekl 2.22. Dara sentaksê ya (70b)yê: "Pirtûka li malê ya li ser masê ya di qutiya bîçûk de."	89
Şekl 2.23. Dara sentaksê ya (70c)yê: "Pirtûka li malê ya li ser masê ya di qutiya bîçûk de."	89
Şekl 2.24. Dara sentaksê ya "Li mala ku em lê raketin".....	90
Şekl 2.25. Dara sentaksê ya "Ew bi derengî çû".	93
Şekl 2.26. Dara sentaksê ya "Min bi xwesî ji te re got".	93
Şekl 2.27. Dara sentaksê ya "Ew ji dil hez dike".	93
Şekl 2.28. Dara sentaksê ya "Ez bi lez hatim".	94
Şekl 2.29. Dara sentaksê ya "mala me ya nû".	98
Şekl 2.30. Dara sentaksê ya "mala me nû ye".	98
Şekl 2.31. Dara sentaksê ya "alaya kesk û sor û zer."	99
Şekl 2.32. Dara sentaksê ya BiLBe(SVO)yê. " <i>I ate an apple.</i> "	104
Şekl 2.33. Dara sentaksê ya BiBeL(SOV)ê. "Min sêvek xwar."	104
Şekl 2.34. Dara sentaksê ya "Serhedo hêdîka pişkiya".	106
Şekl 2.35. Dara sentaksê ya "Zozan çû malê".	106
Şekl 2.36. Dara sentaksê ya "Zozan dizîka çû malê".	107

Şekl 2.37. Dara sentaksê ya "Serhedo li Mêrdînê piştî nîvro bi kêfxweşî derket ser dikê".....	107
Şekl 2.38. Dara sentaksê ya "Ew mamotoye".....	108
Şekl 2.39. Dara sentaksê ya "Navê wî Azad e".....	108
Şekl 2.40. Dara sentaksê ya "Qehwe şêrîn e".....	108
Şekl 2.41. Dara sentaksê ya "Serhedo xwê xist nav nav xwarinê".....	109
Şekl 2.42. Dara sentaksê ya cihguhertina lêkera cotgerguhêz. (Carnie, 2010 :241)	110
Şekl 2.43. Dara sentaksê ya " <i>Morag gave Clay a book</i> ". (Carnie, 2020b)	110
Şekl 2.44. Dara sentaksê ya "*Serhedo xist xwê nav xwarinê".....	111
Şekl 2.45. Dara sentaksê ya "*Serhedo xist nav xwarinê xwê".....	111
Şekl 2.46. Dara sentaksê ya " <i>Briana put the mug on the counter</i> ". (Carnie, 2020a).....	112
Şekl 2.47. Dara sentaksê ya "Serhedo xwê xist nav xwarinê".....	113
Şekl 2.48. Dara sentaksê ya "Xelîl firaq şûştin".....	114
Şekl 2.49. Dara sentaksê ya "Firaq hatin şûştin".....	114
Şekl 2.50. Dara sentaksê ya "Firaq têñ/dê bêñ/dihatın şûştin".....	115
Şekl 2.51. Dara sentaksê ya "Firaq ji aliyê Xelîl ve hatin şûştin".....	115
Şekl 2.52. Pêşniyaza Songül Gündogdu ji bo lêkerêñ xwedî argûmenta paşlêkerî ya armancî.....	116
Şekl 2.53. Dara sentaksê ya "Serhedo xwê xist nav xwarinê", li gorî pêşniyaza Gündogdu (2018).....	116
Şekl 2.54. Dara sentaksê ya "Firaq hatin şûştin".....	117
Şekl 2.55. Dara sentaksê ya "Firaq ji aliyê Xelîl ve hatin şûştin".....	117
Şekl 2.56. Dara fraza kêşanî (FK). (Carnie, 2010: 244)	118
Şekl 2.57. Dara sentaksê ya "Ez ê biçim Mêrdînê".....	118
Şekl 2.58. Dara sentaksê ya "Ew hatibû Mêrdînê".....	119
Şekl 2.59. Dara sentaksê ya "Ez dikarim/dixwazim/divê biçim Mêrdînê".....	119
Şekl 2.60. Dara sentaksê ya "Ez naçim Mêrdînê".....	119
Şekl 2.61. Dara sentaksê ya "Ez nikarim biçim Mêrdînê".....	120
Şekl 2.62. Dara sentaksê ya "Serhedo serê sibê taştê xwar û çû zanîngehê".....	120

KURTEPEYV

ACC	: Accusative Case/Rewşa Akuzatîv (Berkarî)
Adj	: Adjective
AdjP	: Adjective Phrase
AdpP	: Adpositional Phrase
Adv	: Adverb
AdvP	: Adverb Phrase
AgrO	: Agreement Object (Rêkeftina Berkarê)
AgrOP	: Agreement Object Phrase (Fraza Rêkeftina Berkarê)
AP	: Adjective Phrase
Art.	: Artikel
Be	: Berkar
Bi	: Biker
BiBeL	: Biker + Berkar + Lêker
BiLBe	: Biker + Lêker + Berkar
Bn	: Berkara Nerasterast
C	: Cînav
Comp	: Complementizer
CompP	: Complementizer Phrase
CP	: Complementizer Phrase
Cv	: Cînava Vegerok
D	: Daçek
d.t.	: dîrok tune
DAT	: Dative Case/Rewşa Datîv (Berpêbûnê)
Deg	: Degree
Avanî	: Voice
Det	: Determiner
Dk	: Diyarker
Dm	: Dem (Tense)
Dp	: Paşdaçek
FD	: Fraza Daçekî
FAvanî	: Fraza Avanî (VoiceP)
FDk	: Fraza Diyarker (Determiner Phrase)
FDm	: Fraza Demê (Tense Phrase)

FDp	: Fraza Paşdaçekî
FGih	: Fraza Gihanekî
FH	: Fraza Hokerî
FÎz	: Fraza Îzafî
FK	: Fraza Kêşanî
FL	: Fraza Lêkerî
FN	: Fraza Navdêrî
FpD	: Fraza Pêşdaçekî
FR	: Fraza Rengdêrî
FTk	: Fraza Temamkir
Gih	: Gihanek
H	: Hoker
hww.	: her wekî wan
îng.	: îngilîzî
iO	: indirect object (berkara nerasterast)
Îz	: Îzafe
K	: Kêş
L	: Lêker
LH	: Lékera Hevedudanî
LM	: Lékera Modal
N	: Noun, Navdêr
NP	: Noun Phrase
pD	: Pêşdaçek
Poss	: Possessive (Xweyîtfî)
PP	: Preposition Phrase
Prep	: Preposition
R	: Riste
Rd	: Rengdêr
S	: Sentence
SOV	: Subject Object Verb
ss.	: sedsal
SVO	: Subject Verb Object
T	: Tense
Tew.	: Tewang

TGG	: Transformational-Generative Grammar
Tk	: Temamkir (Complementizer)
tr.	: tirkî
V	: Verb
Veq.	: Veqetandek
vghz.	: veguhêzer
VL	: Linking Verbs
VP	: Verb Phrase
ww.	: wekî wan
yd.	: yên din

DESTPÊK

Ziman, wekî amûrekî ku di navbera kom û civakên mirovan de ragihandinê saz dike û fîkr û ramanên mirovan vediguheze, bi roleke heyatî radibe. Bi alîkariya zimên em çanda xwe ava dîkin û bi yên din re parve dîkin. Bi rêya zimên em di nav civakê de ji xwe re cih ava dîkin, têkîliyên civakî saz dîkin, hukim dîkin, li ber xwe didin, nîqaş dîkin, îbadet dîkin û xeyal dîkin. Digel wê, ziman keresteya xebatêñ zimannasiyê ye. Ziman pergaleke kompleks e û her ziman xwedî hin taybetmendiyêñ binyadî, teşeyî û wateyî ye. Têgihiştin û famkirina vê pergala kompleks û livdar bûye babetâ sereke ya lêkolînên zimannasiyê. Zimannasiyê, (zanyarêñ vê qadê) ji bo binyad, werar û xebitîna zimên têbîgihe hin çarçoveyêñ teorîk berpêş kirine û li ser zimên bi kedeke mezin xebatêñ zanistî kirine. Di vê pêwendiyê de, zimannasî bûye dîsîplînek ku hertim ketiye dû bersivêñ pirsêñ li ser sirûşa zimên û bi vî awayî teoriyêñ zimannasiyê û prensipêñ gerdûnî yên zimên kemilandiye.

Ziman, kombînasyoneke bikaranîna deng, peyv û komepeyvan e ku komek an jî civakek, wê ji bo ragihandinê bi kar tîne. Rêzman jî dîsîplenek e ku binyad û hêmanên zimên vedikole, avabûna van kombînasyonan bi hin rêzikan ve girêdide. Rêzman ji bo fahmkirina xebitîna zimên amûreke giring e. Peyvrêzî¹ qadeke fireh û giring e ku bi sepandina rêzimana zimên, vedikole bê peyv çawa têñ cem hev û çawa risteyê ava dîkin. Xebatêñ peyvrêziyê gelempêrî komepeyvêñ (fraz) zimanekî analîz dîkin û dixwazin fahm bikin bê binyada risteyê çawa tê dayîn.

Fraz (îng. *phrase*, tr. *söz öbegi/sözcük öbegi*) ku di peyvrêziyê de têgeheke sereke ye, yek ji hîmîn bingehîn a risteyê ye. Di ferhenga etîmolojiyê de ji bo rehê frazê ev agahî hene:

Di zimanê yewnanî de *phrasis* “axaftin, şêwaza axaftinê, bilêvkirin, agihandin”; *phrazein* “vegotin, daxuyandin, diyarkirin, nîşandan, agihandin”; û bi awayê tebatî *phrazomai*, “ji xwe re diyarkirin, ramîn an jî li ser fîkrîn, hay jê hebûn, bawerkirin, xeyalkirin, serwextbûn, çavdêrîkirin” e. Di zimanê latîniya dereng de *phrasis* jî tê wateya dîksiyonê (*diction*). Di sedsala XVIem de êdî bi wateya “helwest an jî şêwaza

¹ Di kurmancî de, ji bo têgeha "syntax"ê ji bilî "peyvrêzî"yê têgehêñ "hevoksazî" û "ristesazî"yê jî têñ bikaranîn. Lîbelê, heger em hevoksazî an jî ristesaziyê bi kar bînin dê sazkirina komepeyvan (fraz) li derive bimîne. Lewma û ji ber ku mijara me derbarê frazan de ye, me çêtîr dît ku em têgeha "peyvrêzî"yê bi kar bînin.

axaftinê” û “derbirîna kurt ku wateyeke hevgirtî dihewîne; du an jî zêdetir peyvên ku têgehekê derdibirin” hatiye bikaranîn (Harper, d.t.).

Fraz dikare ji peyvekê an jî zêdetir peyvan pêk bê. Fraz ji risteyê biçûktir e, pêwendiya biker û pêveberê bi hev ve tune, berevajî risteyê fraz ne darazî ye lê wateyeke hevgirtî derdibire. Ev têgeh, fraz, amûreke sereke ye ji bo fahmkirina binyada peyvrêziyî ya zimên û ji bo mirov têbîgihe bê ziman çawa dixebite. Mijara frazan di dîroka zimannasiyê de bi zemên ve dirûviye û kemiliye.

Wer tê qebûlkirin ku gava herî mezin a di zimannasiyê de bi teoriya zimannasiya binyadî (îng. *structural linguistics*) ya Ferdinand de Saussure ve hatiye avêtin. Li gorî Saussure divê ziman wekî pergalekê bê dîtin û bi vî awayî pêwendiyêndi hundirê pergalê de bênlêkolîn. Saussure zimên wekî tevayiyeke binyadî qebûl dike lewma fraz têgeheke giring e ku piştgiriya fikra Saussure dike. Li gorî wî, her yekeyeke di zimên de bi têkelbûna yekeyêndin re dibe xwedî wate, ev jî giringiya frazan nîşan dide.

Wextê Noam Chomsky bi xebatêñ xwe yêñ derbarê zimannasiyê de derdikeve ser dikê, bizava binyadiyî cihê xwe dide van du têgehêñ giring ên wê serdemê: binyada kûr (îng. *deep structure*, tr. *yüzey yapı*) û binyada rûser (îng. *surface structure*, tr. *yüzey yapı*). Binyada kûr, binyada wateyî ya sereke ya risteyêñ zimanekî nîşan dide û teşeya razberkirî ya rêzikêñ rêzmanî ye. Binyada rûser jî teşeya fizîkî ya zimên e ku nîşan dide bê wateya di binyada kûr de çawa li gorî rêzikêñ fonetîkî yêñ zimên tê derbirîn. Li gorî Chomsky binyada kûr a zimanekî xwedî taybetmendiyêñ hevpar û gerdûnî ye lê ev binyada kûr di her zimanî de dikare bi binyadêñ rûser yêñ cuda bêñ derbirîn. Têgeha frazê, di peresîna rezimaniyî ya Chomsky de, ji bo wê yekê hate bikaranîn ku em fehm bikin û têbigihêjin bê ka binyadêñ wateyî yêñ di binyada kûr de çawa vediguherin binyada rûser.

Fraz, bi werara xwe ya di zimannasiyê de, bûn amûreke bivênevê ji bo têgihiştina taybetmendiyêñ binyadî û wateyî yêñ zimên. Zimannasan bi bikaranîna vê têgehê xwestine fam bikin bê ka ziman çawa ava dibe û dixebite. Digel wê, mijara frazan kiriye ku taybetmendiyêñ gerdûnî yêñ zimên û wekheviyêñ di navbera zimanêñ cuda de bêñ ravekirin.

Digel famkirina taybetmendiyêñ binyadî yêñ zimên û têgihiştina binyadêñ rêzmanî, fraz ji bo pêkanîna ragihandineke karîger jî bi roleke giring radibe. Di

fêrbûna zimên de lêkolîna frazan derfetê dide xwendevanan ku ew ne tenê bi peyvên ïzole, di heman demê de bi peywendiya van peyvan a di hundirê risteyê de, rêzikên rêzimanê fêr bibin. Ev gelek giring e ji bo mirov fam bike bê rêzikên rêzimanî di pêwendiya bikaranîna rast/heqîqî de çawa dixebitin.

Bo nimûne, kesek ku hînî zimên dibe, digel ku tûrikê xwe yê peyvan tije bike û ferhenga xwe fireh bike, di heman wextê de heger hîn bibe bê ev peyv/fraz di hundirê risteyê de çawa rast tên bikaranîn, dikare şiyana xwe ya ragihandinê jî xurttir bike. Fraz, bi diyarkirina têkiliyên di navbera hêmanên din ên risteyê ve, wateya risteyê zelaltir dike û pergala binyadî ya zimên saz dike. Bi vî awayî herikbariya risteyê jî xurttir dibe û peyvrêziya wî zimanî baştir tê famkirin. Fraz çarçoveyekê dide fêrberan ku taybetmendiyên binyadî yên zimên biferikînin û wan di rewşen rast/heqîqî yên axaftin û nivîsinê de bi kar bînin. Axirî, bikaranîna rast a frazan dike ku ragihandin fambar be û hêza derbirîne xurttir be. Bi vî awayî, fraz ji fêrberên zimên re dibin alîkar da ku ew qîma xwe bi jibekirina rêzikên rêzimanî neynîn, li şûna wê, xebitîna sirûştî ya zimên fam bikin û vê têgihiştînê di ragihandina rojane de bi kar bînin.

Bi vî awayî, têgeha frazê, di peresîna paradîgma û pêşketinên teorîk ên zimannasiyê de cihekî giring werdigire. Ji Saussure bigire heta Chomsky, layenêrînên zimannasan ên li ser vê têgehê ji bo famkirina sirûşta zimên bûne gavên mezin. Ev têgeh û peresîna wê, hêmanên bivênevê ne ji bo zimannasên ku dixwazin taybetmendiyên binyadî yên zimên û xebitîna wê vekolin.

Pirsa Lêkolînê û Mijara Tezê

Kurmancî bi çavkaniyên xwe yên dîrokî û pêwendiya çandî ve diyalekteke dewlemend a zimanê kurdî ye. Zimanê kurdî ji malbata Hînd-Ewropî ye, ji ber ku ev malbat malbateke berfireh e û ji ber sedemên siyasî zimanê kurdî bi gelek zimanên derdorê re danûstandin kiriye. Ev danûstandin dibe ku erêni an jî neyînî be lê ji ber sedemên polîtîk ev diyalekt, kurmancî, ligel ku li ser erdnîgariyeke berfireh berbelav e jî xebatêni li ser wê gelek dereng dest pê kirine. Ev derengmayîn piştî ku derfet ketiye destê lêkolerên kurd, kiriye ku xebatêni lezûbez û di bin bandora zimanên cîranan de bêni kirin. Lewma, pirîcaran xebatêni li ser diyalekta kurmancî dûrî pîvanên gerdûnî mane.

Xebatê li ser kurmancî yên heta niha hatine kirin, pareke mezin ji wan ne li gorî pîvanên zimannasiyê lê li gorî rêzikên rêzimanî hatine lêkolîn. Lêkolînen rêzimanî armanc dikan ku zimên standard bikin, lewma hin pîvan û qayîdeyên hişk dîkte dikan, lêbelê lêkolîna zimannasiyî li ser bikaranîna zimên a sirûştî, werara wê û curbicuriya wê disechine û dişayesîne. Ligel ku armanca lekolînen rêzimanî hînkirin e, armanca lêkolînen zimannasiyî ravekirin û şayesandin e. Lêkolîna rêzimanî guherbariya zimên paşguh dike lewma ji bo ragihandineke kartêker dibe asteng. Aydogan (2013: 119) jî vê rewşê dipeyîtîne û dibêje “pirraniya rêzimanên kurdî ji ber rêzimanên din û bi xema fêrkirina zimanê kurdî hatine amadekirin”. Ji ber van sedeman hin problemen binyadî û semantîk di peyvrêziya kurmancî de rû dane. Xebatê li ser komepeyv û frazan yek ji van mijaran e ku îroroj jî ev mijar hê nehatiye zelalkirin. Senifandin û binavkirina komepeyvên kurmancî weke problemeke sereke derdikeve pêş me. Komepeyvên kurmancî bi têgeha “ravek”ê hatine binavkirin û li gorî birra “raveker”ê hatine senifandin. Ev rewş dijî mijara frazan e ku fraz berevajî ravekan, ne bi ravekerê (modifiyeker), bi sereyê (îng. *head*, tr. *baş öge*)² tên binavkirin û senifandin. Bo nimûne, “sêva sor” li gorî qayîdeyên ravekan dibe “raveka rengdêri” lê li gorî qayîdeyên frazan ew dibe “fraza navdêri”.

Herwiha, bi mijara ravekan ve têkildar, mijara îzafeyê jî ji ber van sedemên ku me behskirî, gelekî berfireh û bi ser ve hatiye vekolîn. Mijara îzafeyê bi vegetandekan û avakirina ravekan ve sînordar maye. Fonksiyonên îzafeyê yên wekî avakirina rewşa xweyîtiyê (*possessive*) an jî artîkilê (*article*) hatiye piştguhkirin. Ji ber ku îzafe di avakirina frazan de bi roleke giring radibe, em ê li ser îzafeyê û fonksiyonên wê jî bixebitin.

Armanca Tezê

Îcar, ji ber ku li ser frazên kurmancî xebatê akademîk kêm in, bi kurmancî tezeke akademîk tune û gelek xusûsiyetên frazên kurmancî nehatine ronîkirin, ev mijar giring e û hêjayî xebat û lêkolînan e. Bi nîşandana binyada xweser a diyalekta kurmancî û rola frazên kurmancî ya di hundirê zimên de, ev xebat ji bo kurmancî armanc dike ku di qada zimannasiyê de têkariyê li lîteratûrê bike û pêşıya xebatê nû veke.

² Ji bo fraza navdêri piranî “*head noun*” (sereya navdêri) tê bikaranîn.

Ev tez dixwaze wate û binyada frazên diyalekta kurmancî lêbikole û analîzeke zimannasiyî pêşkêş bike. Lêkolînên zimannasiyî, çawa ku ji me re dibin alîkar da ku em taybetmendiyêngerdûnî yên zimên û şiyana hilberandina ziman a hişê însen fahm bikin, di heman wextî de, dikin ku em wate û binyada bêhempa ya zimanênauda jî keşf bikin. Bi vê hişmendiyê, em bi vê xebatê armanc dikin ku qayideyên gramatîk û taybetmendiyênginyadî yên frazên diyalekta kurmancî bêş şayesandin û fonksiyona wan a di nav risteyê de bêş famkirin. Di vê tezê de em ê hewl bidin li gorî pîvanêngerdûnî yên zimannasiyê ku di rohniya xebat û teoriyên modern de êdî di qada zimannasiyê de bi awayê zanistî têqebûlkirin, avaniya frazên kurmancî nîşan bidin. Bi vê nîşandanê em dixwazin dakevin kûrahiya binyada frazan û fahm bikin bê di kurmancî de, bi pîvanêngerdûnî fraz/komepeyv çawa dixuyê. Fraz bi ci awayî ji ravekan cuda dibin û rol û fonksiyona iżafeyê di binyada frazan de ci ye.

Bi vî awayî, ewilî em ê li gorî pîvanêngerdûnî, frazên kurmancî yên leksîkal diyar bikin, wan bisenifînin û binav bikin. Herwiha, heger hewce bê dîtin em ê behsa fraza fonksiyonî ya têkildar jî bikin û fonksiyona wan jî diyar bikin. Ji bo her cureyeke fraz em ê analîzeke binyada gramatîk bikin, li ser rol, fonksiyon û bandora wan a di risteyê de bixebeitin.

Rêbaza Tezê

Ev tez dê bi rêbaza şayesandinê li ser mijara frazên kurmancî bisekine. Şayesandin di hemû şaxesaniztan de qonaxa pêşîn e, armanca wê ew e ku di nava mijarê de diyardeyan û pêwendiyêngi navbera diyardeyan de diyar bike û wan bisenifîne (Kıran û Kıran, 2018: 228). Weke hêmaneke giring a zimannasiyê, şayesandin, ji bo famkirina binyad û xebitîna zimên tê bikaranîn. Zimannasiya şayesi (îng. *descriptive linguistics*, tr. *betimleyici dilbilim*) xwe ji rê û rêzikên hişk ên rêzimanî (*prescriptive grammar*) dûr dixe û bikaranîna zimên a senkronîk dışayesîne û nîşan dide. Bi vî awayî, wextê hêmanêngîzimanî têlêkolîn hêza derbirînê û dewlemendiya zimên tê nîşandan. Di vê xebatê de jî ji bo ku frazên kurmancî bi hûrgilî bêş biwatekirin û ravekirin, em ê berê xwe bidin şayesandina binyadêngîzimanî yên kurmancî. Bikaranîna rêbaza şayesandinê di kifşkirina kûrtir a binyada hundirîn ya zimên û analîza pêwendiyâ bikaranîna frazan de û têgihiştina dewlemendiya di vê pêwendiyê de, dê çarçoveyeke sereke ji bo naskirin, famkirin û hînbûna diyalekta kurmancî berpêş bike.

Ev xebat, ji bilî destpêkê ew ê ji du beşên sereke pêk bê. Di beşa yekem de, di bin sernavê Çarçoveya Giştî de em ê berfirehtir behsa dîrok û werara xebatêñ zimannasiyê bikin û cih û rola frazan a di nava van xebatan de derxin pêş. Bi vî awayî em ê ji bo mijara xwe lîteratûreke têr û tije jî pêşkêş bikin. Piştre, dîsa di beşa yekem de em ê têgeha frazê pênase û rave bikin û em ê li bersivêñ van pirsan bigerin: Têgeha frazê di nava teoriyêñ zimannasiyê de çawa cih girtiye? Kîjan teorî bi kîjan layenêrînê têgeha frazê vedikole? Armanca beşa yekem ew e ku di dawî de em têgeha frazê bi her awayî têbigihêñ. Beşa duyem dê bibe beşa me ya pratîkê. Di beşa duyem de, ewîlî em ê amaje bi xebatêñ peyvrêziyê yên kurmancî bikin ku piraniya wan behs bi frazan nekirine lê li şûna frazan mijara ravekan kirine armanc. Herwiha bi mijara ravekan ve têkildar, em ê berê xwê bidin mijara ïzafeyê û fonksiyonêñ ïzafeyê jî. Piştre, bi piştgiriya pîvanêñ gerdûnî yên frazan ku di beşa yekem de me ew bi berfirehî rave kirin, em ê frazêñ kurmancî pênase bikin, bisenifînin û bi nav bikin. Ji bo her cure frazê em ê mînakîn bidin û wan li gorî teoriyêñ behskirî bişayesînin.

Digel rîbaza kevaneka goşeyî “[]” em ê mînakîn xwe li ser dara sentaksê nîşan bidin û wan rave bikin. Ji darêñ sentaksê, em ê bêtir berê xwe bidin dara sentaksê ya X-Barê ku bi prensîp û parametreyêñ xwe binyada frazan dikare baştıñ dîtbar bike. Divê neyê jibîrkirin ku ev teoriyêñ ku em ê behs bikin, hewldanek e ji bo famkirina zimêñ û roj bi roj ev teorî tên pêşxistin. Ji ber ku teorî li ser zimanê ìngilîzî tên avakirin, dibe ku zimanê ìngilîzî bêqisûr li van teoriyan bê sepandin lê gelek prensîp û parametreyêñ van teoriyan dibe ku li zimanêñ din bi awayekî kemîlî neyêñ sepandin. Lewma pirîcaran, zimannas hin îdîayêñ nû dîkin û çareseriyêñ xwe wekî pêşniyaz berpêş dîkin.

Derbarê kurtkirinêñ (kurtepeyv) têgehan de jî heta ji destê me hat me kurtkirinêñ kurmancî bi kar anîn. Gelek ji van kurtepeyvan li kar bin jî me hin ji wan cara ewîlî bi kar anîn. Em wan wekî pêşniyaz pêşkêş dîkin. Digel wê, em ê ferhengokeke têgehan jî li dawiyê bi cih bikin ku me ew di teza xwe de bi kar anîne.

Lîteratûr

Di kurmancî de xebatêñ akademîk ên derbarê frazan de gelekî kêm in. Di pirtûkîn rezimanan de jî mijar di bazineya ravekan de maye. Xebata herî berçav a derbarê fraza navdêrî de nivîsara Mikail Bülbül (2017) a bi navê “*Peyvrêzî di Frazêñ Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)*” ye. Bülbül di vê xebatê de li ser modîfiyekerêñ fraza

navdêrî sekiniye û lêkolaye bê li gorî rewşa topîkalîte, fokûsê û hiyerarşıya semantîk peyvrêziya frazêr navdêrî çawa ava dibe.

Songül Gündogdu (2011) li Zanîngeha *Boğaziçiyê* teza xwe ya lîsansa bilind li ser binyada frazêr kurmancî bi berawirdkirina devoka standart û devoka Mûşê (*The Phrase Structure of Two Dialects of Kurmanji Kurdish: Standart Dialect and Muş Dialect*) amade kiriye. Gündogdu bi taybet bala xwe daye rewşa ergatîviyê di binyada frazêr kurmancî de.

Songül Gundogdü (2018), di teza xwe ya doktorayê (Zanîngeha *Boğaziçiyê*) de dîsa li ser sentaksa kurmancî xebitiye. Gündogdu, di vê xebata xwe de bihûrgilî li ser frazêr lêkerî yên devoka Mûşê sekiniye û di nav senifandina temamker û veserên (*argument, adjunct*) frazêr lêkerî yên kurmancî de bala xwe dide hêmanên armancî yên paşlêkerî (*postverbal goals*), frazêr daçekî (*adpositional phrases*) û hêmanên navdêrî yên lêkerên komleks.

Saniya Cebar Ebuzeyd (2019) li Zanîngeha Zaxoyê, bi navê “*Cihgihorîna Keristan di Ristê da (Govera Behdînî)*” teza xwe ya doktorayê li ser cihguhertina/barkirina (*movement*) hêmanên risteyê amade kiriye. Ebuzeyd di xebata xwe de lêkolaye bê li gorî teoriyê peyvrêziyê di kurmancî de cihguhertin/barkirin heye an tune. Ew di encamê de diyar dike ku di kurmancî de cihguhertina hêmanan çêdibe.

Waria Omar Amin (1979) li Zanîngeha Londonê teza xwe ya lîsansa bilind li ser “Xuyanga Avaniya Lêkerî di Kurdî de” (*Aspects of The Verbal Construction in Kurdish*) amade kiriye. Teza Amin bi îngilîzî ye û bi zimanê kurdî diyalekta soranî qest dike. Amin di vê xebatê de hewl daye binyada lêkerî ya diyalekta soranî rave bike û paşgirêr kesî yên cuda li gorî fonksiyonên wan pênase bike. Amin, di beşa sêyem a teza xwe de li ser rêzikên binyada frazêr kurdî xebitiye.

Rebeen Kareem (2016) li Zanîngeha *Newcastleê*, teza xwe ya doktorayê bi navê “Peyvrêziya Kêşana Lêkerî di Kurdiya Navendî de (*The Syntax of Verbal Inflection in Central Kurdish*) amade kiriye. Kareem di teza xwe de berê xwe daye binyada dem, xuyang, rêkeftin û hêmanên frazêr lêkêrî yên soranî.

Rebwar Shafie Tahir (2018) li Zanîngeha *Newcastleê*, teza xwe ya doktorayê li ser “Binyada Fraza Diyarkerî di Kurdiya Navendî de” (*The Structure of DP in Central*

Kurdish) amade kiriye. Tahir di çarçoveya *Minimalist Programê* de li ser fonksiyonên ïzafeya kurdiya navendî (soranî) sekiniye û lêkolaye bê têkiliya van fonksiyonan bi navderê re çi ne.

Karwan Juma Raheem (2018) di nivîsara xwe ya bi navê “Binyada Fraza Lêkerî di Zimanê Kurdî de” (*The Structure of Verb Phrase in the Kurdish Language*) binyada frazên lêkerî yên soranî û îngilîzî dane ber hev û hewl daye binyada frazên lêkerî yên soranî rave bike.

Tahereh Afshar û Ne'mat Jahanfar (2018) jî bi navê “Analîza Binyada Fraza Navdêrî di Zimanê Kurdî de (Kelhorî) bi Bingeha Teoriya Sentaksê ya X-Barê” (*The Study of Noun Phrase Structure in Kurdish Language (Kalhori) Based on X-Bar Theory Syntax*) nivîsarek weşandine. Nivîsara wî bi farisî ye û binyada frazên navdêrî yên kelhorî û yên farisî dane ber hev.

Saman Ramazan Abdullah Khoshnaw (2023) di teza xwe ya lîsansa bilind de “Firawankirdina Girêyî Naw le Zarî Kirmancî Nawnerastî Zimanî Kurdî da” (Di Kurmanciya Naverast a Zimanê Kurdî de Berfirehkirina Frazên Navdêrî), li ser frazên navdêrî xebitiye. Bala xwe dayê modîfyekerên frazên navdêrî yên soranî û fonksiyonên rewşê û rêkeftinê bi rîbaza şayesandinê berpêş kiriye. Li gorî Khoshnaw, di diyalekta soranî de fraza navdêrî heta hetayê dikarê bê berfirehkirin. Teza Khoshnaw bi diyalekta soranî û bi tîpêner erebî ye.

‘Ebdulcebar Mistefa Me’rûf (2010) bi navê “Dirusteyî Frêz le Zimanî Kurdî da” (Dirustkirina Frazan di Zimanê Kurdî de) xebatek amade kiriye û çap kiriye. Xebat bi diyalekta soranî û bi tîpêner erebî ye. Me’rûf bi teoriya hilberîner û bi layenêrîna şayesî li ser binyada frazên diyalektên zimanê kurdî xebitiye.

Axirî, me dît ku di lîteratûrê de xebatêni li ser binyada frazên zimanê kurdî kêm in û xebatêni berfireh ên derbarê frazên diyalekta kurmancî tune ne. Digel wan, di çarçoveya giştî de, derbarê teoriyên zimnanasiyê de em ê piranî ji çavkaniyan zimanê îngilîzî sûd wergirin.

Sînor û Zehmetiyêñ Tezê

Ev tez li ser diyalekta kurmancî ya zimanê kurdî dixebite. Çawa ku di bin sernavê lîteratûrê de jî me behs kir, di qada peyvrêziyê de ji bo kurmancî bingehêke xurt tune. Xebatêni heyî piranî li ser diyalekta soranî ne û bi zimanê îngilîzî, soranî û farisî ne.

Lewma, ji bo çarçoveya teorîk me bêtir ji xebatê zimanê îngilîzî û ji van çavkaniyan sûd wergirt. Di van xebatan de gelempêrî têgehêن îngilîzî hatine bikaranîn. Me di xebata xwe de tercîh kir ku em têgehêن kurmancî bi kar bînin. Lewma me beramberî têgehêن îngilîzî, têgeh û kurtkirinêن kurmancî çêkirin. Heta ji destê me hat me ji bo mînakêن kurmancî têgehêن kurmancî û kurtkirinêن wan bi kar anîn. Ev têgeh û kurtkirinêن ku me bi kar anîn, em wan wekî pêşniyaz pêşkêş dikin.

Ji ber ku xebata me bi frazêن leksîkal ên diyalekta kurmancî sînordar e, me ji bo her mijarê mînakêن kurmancî dan lê wextê pêwîst bû me ev mînak dan ber mînakêن zimanêن din jî. Herwiha, me mînakêن xwe bi dara sentaksê dîtbar kirin lê ji ber ku teoriyêن zimannasiyê roj bi roj bi pêş dikevin, hin nîşandan wekî idâ û pêşniyaz têن pêşkêşkirin. Me mînakêن xwe piranî bi diyagrama X-Barê nîşan dan û wextê li ser nîşandanê nezelaliyek hebe me wekî jêrenot hişyariyêن xwe kirin.

BEŞA YEKEM

1. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ

Ji agahiyê berdest diyar dibe ku di dîroka mirovan de xebatên pêşîn ên li ser zimêni bo bikaranîn û famkirina rast a zimêni, ango di qada rêzimanê de hatine kirin. Çavkaniyê me yên berdest (Campbell, 1998: 194) ji bo xebata pêşîn me dibe sedsala 5em (BZ) a Hindistana Berê, rêzimana sanskrîti ya Panini. Pirtûka Panini *Ashtadhyayi* (Heşt Kitêb), derbarê fonetik û morfolojiya zimanê sanskrîti ye û ji bo ku metnêni dîni yên hindî bêqisûr bêni xwendin û bêni famkirin nêzî 4.000 rêzikêni zimanî daniye. Bloomfield (1933: 11) vê pirtûkê weke yek ji abîdeyêni (*monument*) herî mezin ên aqilê însen dihesibîne. Xeynî Panini, pirtûka Yaska ya bi navê *Nirukta* ji ji bo heman sedsalê tê tesnîfkirin (Macdonell, 1900: 281). *Nirukta* li ser rehnasiya (etymology) metnêni dîni yên Vedayan³ e.

Wextê em derbasî Yewnana Berê dibin, em dibînin ku feylesofêni yewnanî di çarçoveya felsefeyê de serê xwe bi mijara zimêni re êşandine û derbarê sirûşti binyada zimêni de pirs pirsîne. Berhemekî nivîskî ya Sokrates (469-399 BZ) a rasterast li ser zimêni tune be jî raman û nêrînêni wî di berhemêni xwendekarê wî de têni dîtin. Berhemekî Platon (427-347 BZ), *Cratylus* (Diyalog), behsa sirûşti wateya sembolîk a zimêni dike. Di berhemekî Platon de ev mijar tê vekolîn: “Gelo peyv (navdêr) sirûşti ne an wateyêni wan ên civakî (rêkeftî) hene?” (Sedley, 2003: 2-4). Berhemekî Aristotle (384-322 BZ) *Peri Hermeneias* (Li ser Hermenotîkê), yek ji wan berhemêni giring e ku li ser mijarêni curbicur ên zimêni sekiniye. Têkiliya zimêni bi mentiqê (hizr) re, navdêr, kar û riste, ango binyada zimêni bûye babeta vê berhemê (Çiçekdağı, 2015: 105).

Di sedsala 2yem de (BZ), li Ewropayê navê Dionysius Thrax (170-90 BZ) derdikeye pêsiya me. *Techne Grammatike* li ser fonetik û morfolojiya zimanê yewnanî sekiniye (M. Aydin, 2007: 20). Tan (2018: 10-11) diyar dike ku ev berhemêni li Ewropayê berdewamiya xebatêni Yewnana Berê ne û mijara wan gelempêri morfolojî ye. Mijara peyvrêziyê (*syntax*) bi Apollonius Dyscolus (110-175) ve dibe mijara sereke ya xebatêni derbarê zimêni de. Serdema Yewnana Berê bingehêni hizra zimannasiyê

³ Veda ji reha “vid”ê ya sanskrîti dariştiye ku tê wateya “zanîn”ê. Îroroj, ev têgeh ji bo binavkirina çar pirtûkêni pîroz (Rigveda, Yajurveda, Samaveda, Atharvaveda) ên dîni Hinduîzmê tê bikaranîn (Yitik û Arslan, 2011: 226).

danîne û bûye hêlîna hewldanêñ hîzrî yên li ser wate, bikaranîñ û sirûşta zimêñ. Berhemêñ van bîreweran li ser peresîna zimêñ bandorêñ giring kirine.

Li Rojhilat, erdnîgariya ereban, bi hatina dînê Îslamê xebatê li ser zimên dest pê kirine. Al-Nassir (1985: xiii) teza xwe ya doktorayê li ser pirtûka Ebûl Eswed ed Dualî - Sibawayh (607-668) ya bi navê *El-Kîtâb* (الكتاب) amade kiriye. Li gorî wî ev pirtûk di nava ereban de xebata pêşîn ya li ser zimên e. Ev pirtûk li ser rêziman û fonetîka zimanê erebî ye. Ji ber ku ji xwendin û famkirina Quranê re bibe alîkar hatiye amadekirin, lewma jî ev pirtûk di nava ereban de cihekî giring werdigire. Dîsa li Rojhilat, Tan (2018: 11) dibêje ku xebatê erebî bandor li xebatê îbranî kiriye û di sedsala 9em de Saadya bin Josef el Feyyûmî (882-942) yekem pirtûka rêzimanê nivîsiye û ferhenga zimanê îbranî derxistiye.

Çína Berê û Misira Berê çendî du şaristaniyên qedîm û giring bin jî lêkolerên ku li ser mijarên zimên û zimannasiyê xebitîne, teqez bala wan çûye ser ku wextê behs tê ser xebatê zimannasiyê gelek kêm navê van herdu şaristaniyan derbas dibe. Li gorî Gökenç (2022: 369), nivîstekên remlan (*Jiaguwen*) ên li ser hestiyên ajalan û qalikên kûsiyan ku bi 2 hezar sal berî zayînê ve têr nîsbetkirin, nimûneyên pêşîn ên nivîsa çînî ne. Li Misira Berê jî ji ber ku nivîs bi hiyeroglîfan⁴ (*hieroglyph*) hatibû sazkirin, û herwiha derbarê vê pergalê de tu çavkanî negihiştiye ber destê me, heta wextekî nêz jî me derheqê Misira Berê tiştek nizanibû. Cara pêşîn Jean-François Champollion di sala 1822yê de da zanîn ku ew êdî dikare hiyeroglîfên misirî bixwîne. Li Misirê Kevirê Rosettayê (*Rosetta Stone*) hatibû kifşirin ku ev kevir bi sê zimanîn bû, hiyeroglîfên misirî, *demotik*⁵ û yewnaniya kevn (Kayaoğlu û Çetinoğlu, 2013: 43), bi vî awayî, piştî xebatê dûdirêj Champollion bi xêra van hersê nivîsên wergerên hevdu, raza hiyeroglîfên misirî eskere kiribû.

Whitney (1873: 201), vê sedemê (çima di xebatê zimannasiyê yên serdema berê de navê van zimanan derbas nabe) bi malbata zimanan ve girêdide û dibêje: Çendî ku peyvên zimanê misirî ji kûrahiya serdemên berê -ku ên din nikarin nêzî wê jî bibin-gihiştine me lê ji ber ku hema bêje ji hemû malbatan vejetiyaye û gelekî sade ye,

⁴ Ji “*hieros*” (pîroz) û “*glypho*”a (nivîstek) yewnanî tê. Weke alfabyeke şematîk, hiyeroglîf ji aliyê misirî, mayayı, hîftîfî û aztekian ve hâtine bikaranîn. Fonetik in, tenê beramberî dengên nebizwên tê bikaranîn û ideoogram (sembol) in, 700 hiperoglîfîn misirî hene (Kayaoglu û Cetinoğlu, 2013: 40-41).

⁵ Bi wateya “zimanê gel” hatiye bikaranîn. Zimanê misirîyan ê pişî hiyeroglîfan e (Kayaoglu û Çetinoğlu, 2013: 41)

zehmet e mirov behsa dîroka vî zimanî bike. Whitney, ji ber ku aîdî malbateke ciyawaz e heman sedemê ji bo zimanê çînî jî diyar dike. Ji xeynî van, bi referansa nêrîna Whitney, ji ber ku nivîsa bizmarî bi kar anîne, zimanê sûmerî û akadî jî ji malbatêن zimanan veqetiyane û derveyî xebatêن zimannasiyê mane.

Di Serdema Navîn de ku bi hilweşîna Împaratoriya Romayê dest pê dike û heta destpêka Ronesansê berdewam dike (500-1400), xebatêن li ser zimêن gelempêri di bin bandora dêr û keşîşxaneyan de hatine kirin. Mîrata zimannasiyî ya serdema Yewnana Berê û ya Romayê bûye bingeh ji bo xebatêن li ser zimanê latînî û xebatêن pragmatîk û semantîk hatine kirin. Bloomfield (1933: 6), *Ars grammaticaya* Donatus (ss. 4em) û *Institutiunes rerum grammaticaruma* Priscianus (ss. 6em) wekî du berhemêن giring ên Serdema Navîn dihesibîne. Aksan (2009: 19) berhema rêzmanê ya Alexander de Villa-Dei jî ji bo vê serdemê giring dibîne û dibêje ji ber ku zimanê latînî bûbû zimanê dêrê û êdî hewce pê hebû ku were fîrbûn, xebatêن vê serdemê piranî li ser rêzman, ferheng û pirtûkêن xwendinê bûn.

Dante Alighieri (1265-1321) kesê yekem e ku hewl daye zimanêñ ewropî yên serdema xwe bisenifîne (Matasović, d.t.: 2). Alighieri di berhema xwe de *De vulgari eloquentia* (Li ser rewanbêjiya zimanê xwech), bi temsîliyeta yewnanî û silavî cudahiyeke teqezi xistiye navbera zimanêñ cermen û roman. Digel vê, Matasović (d.t.: 2) diyar dike ku Alighieri ferq kiribû ku ziman bi demê re cihêreng dibin -ji hev vediqetin- û zaravayêñ zimêñ derdikevin meydanê, ji ber ku li herêmêñ cuda yên ku yek ziman tê axaftin guherîn di zimêñ de çêdibin.

Di serdema Ronesansê, sedsala 17em û destpêka sedsala 18em de gelek zanyaran derbarê “zimanê orijinal ê mirovatiyê” de fikrên xwe diyar kirine. Di serî de zimanê ïbranî, çînî û heta zimanê holendî jî bûne namzet. Matasović (d.t.: 3) li aliyê erêni yê van nîqaşan dinihêre ku li gorî wî bi xêra van angaştan haya lêkoleran ji rêjeya (*scale*) curbicuriya zimêñ û berbelavbûna guherîna zimanî çêbûye. Bi weşandina pirtûkêñ rêzmanê û ferhengêñ zimanan meyleke xurt çêbûye ji bo derbarê zimanêñ dinyayê de danegehek ava bibe. Rêzimana yekem a zimanê lehî (polonî) di sala 1586ê de, rêzimana yekem a zimanê baskî di sala 1587ê de, yên zimanêñ Çermsorêñ Emerîkî *nahuatl*, *quechua* û *guaraní* jî bi rêzê di sala 1547, 1560 û 1595ê de hatine weşandin (Matasović, d.t.).

Di sedsala 17em de li Fransayê bi nûnertiya Ekola Port-Royalê (*Grammaire de Port-Royal*), li şûna rêzimana klasîk hewlên danîna hîmên rêzimana giştî çêbûne. Rêzimana giştî li ser fikarêن teolojîk û normatif ên rêzimana klasîk bilind bûye û li ser zimên teoriyên rasyonalîst ava kirine. Rêzimana giştî, ji mentiq derdikeve rê û bi pîvanêن gerdûnî yên aqilê însên, dixwaze rêzikên zimên piştrast bike. Leibniz bi xebata xwe *Dissertation sur l'origine des nations* (Ravekirinek li ser Rehê Neteweyan) (1710) ve, Condillac bi xebata xwe *Grammaire* (1775) ve, xwendekarê Condillac, Destutt de Tracy bi xebata xwe *Éléments d'idéologie* (Hêmanên Îdeolojiyê) (1801-1815) ve, Volney bi xebata xwe *Discours sur l'étude philosophique des langues* (Gotarek li ser Vekolîna Felsefî ya Ziman) (1820) ve û bi xebatêن Rask ve rêzimana giştî her bi pêş ketiye û rêya rêzimana dîrokî û berawirdî vekiriye (Perrot, 2021:107-109).

Di sedsala 18em û sedsala 19em de di qada zimannasiyê de geşedanêن giring pêk hatine. Di vê heyamê de zimannasan li ser peresîna zimên, malbatêن zimanan û binyada zimên sekinîne û bi vî awayî berê vê dîsîplînê dane aliyê pergaleke rîkûpêktir û zanistî. Di sedsala 18em de agahiyêن derbarê zimanê sanskrîtî de belav dibin û lêkolerêن ewropî ev agahî ji xebatêن xwe re kirine kereste. Digel ku gelek lêkoleran sedema şibîna peyvîn zimanê sanskrîtî û yên zimanên ewropî bi kontakta zimanan (*language contact*) re girêdane jî ev mijar diviya zelaltir bûbûya. William Jones (1746-1794) wextê li ser zimanê sanskrîtî dixebite, fîkrê “deynkirin”ê pê re çêdibe. Dibe ku hevşibîna di navbera peyvîn *pitar-* "bav", *mâtar-* "dê" ve *bhrâtar-* "bira" yên zimanê sanskrîtî û peyvîn *pater*, *mater* û *frater* ên zimanê latînî de ji ber sedema deynkirinê bûbe. Wate, diviya ev peyvîn ji zimanêن cuda ku dişibin hev ji çavkaniyeke hevpar (belkî zimanekî ku îroroj tune) zabin. Digel wê, Aksan (2020: 21) navê Sasseti, Scaliger, Leibniz, Rask, Bopp, Grimm û Schleicher jî dide ku wan jî bi xebatêن xwe eşkere kirine ku di nava zimanan de hin hevşibîn û xizmatî hene û ev delîl e ji bo hebûna malbatêن zimanan. Çendî navê William Jones derkeve pêş jî bi vî awayî kifşa malbata zimanê Hînd-Ewropî çêbûye.

Di sala 1816yê de zimannasê alman Franz Bopp (1791-1867), bi bikaranîna bergindêن pergalêن devkî yên zimanê sanskrîtî, yewnanî, latînî û hin zimanê din ên malbata Hînd-Ewropî, xizmatiya genetîk a van zimanan piştrast kirine û piştî wî jî Jakob Grimm (1785-1863) bergindêن dengî yên di navbera nebizwênen zimanêن cermenî û zimanê din ên Hînd-Ewropî de diyar kirine (Matasović, d.t.: 3). Cara ewil

F. Schlegel di sala 1808ê de behsa “gramera berawirdî” dike (Kerimoğlu, 2019: 17). Xebatêni bi vî rengî yên xurt rê vekiriye ji bo xebatêni din ên li ser xizmatiya zimanan û bi pêşengiya Franz Bopp di sedsala 19em de zimannasiya berawirdî (*comparative linguistics*) weke şaxeke zimannasiyê ava bûye (Aksan, 2020: 21).

Sedsala 20em ji bo zimannasiyê destpêka serdemeke nû ye ku pêşveçûnên giring çêbûne û hin daraz hatine danîn ku dikarin bibin prensîbêni zimannasiyê (Aksan, 2020: 21). Di dawiya sedsala 19em de M. Grammont bi kitêba xwe *Dissimilation consonantique dans les langues indo-européennes et dans les langues romanes* (Cihêbûna Nebizwênan di Zimanêni Hînd-Ewropî û Roman de) ve bingeha dengnasiyeke (*phonology*) giştî daniye. Anatole Antoine Meillet (1866-1936), di sala 1906ê de li *Collège de France*ê, di axaftina destpêkê de wiha dibêje “dîrok, ji bo zimannasan ne armanc e, ew hew dikare bibe amûrek” (Perrot, 2021: 110). Di heman demê de Ferdinand de Saussure li Zanîngeha Cinêvê (*Geneva*) dest bi dersdariyê dike. Fîkr û ramanêni Saussure yên van dersan dê ji bo teoriya Saussure bibin bingeh. Têbiniyêni Saussure yên dersan piştî mirina wî, di sala 1916yê de bi navê *Cours de linguistique générale*’i (Dersêni Zimannasiya Giştî), ji aliyê xwendekarêni wî ve hatine weşandin.

Nêrîna Saussure ew e ku ziman pergaleke nîşanekan (*sign system*) e ku di navbera wan de tevneke pêwendiyê ya diyarkirî heye. Nêrîn û fîkrêni Saussure, Teoriya Binyadîgeriyê (*structuralism*) ava dike. Teoriya binyadîgeriyê zimên wekî pergalekê dibîne û xebatêni binyadî deriyê serdema nûjen a zimannasiyê vedikin. Saussure aliyê şexsî û civakî yê însen ji hev cuda dike û aliyê şexsî bi gotinê (*parole*), aliyê civakî jî bi zimên (*langue*) nîşan dide. Ziman koda hevpar a civakê ye, wekî ferhengekê li cem her kesan heye û wextê kesek hewl bide biaxive, li wê ferhengê dinêre û diaxive. Ev kod, ferheng, yanî ziman ji bo civakê di rewşa rêkeftinê (*agreement*) û bêegeriyê (*arbitrary*) de ye. Gotin jî bikaranina zimên e; di axaftinê de ji ferhengê hin nîşanek tênil hilbijartin û bi teşeya xêzikî tênil rêzkirin û tênil vegotin. Saussure bi têgeha şiyana zimên (*language competence*), mirovan ji hemû heyberêni din cuda dike (Toklu, 2021: 20-21).

Di sedsala 20em de zimannasî êdî ji zanistêni din veqetiyaye û êdî weke zanisteke serbixwe hatiye dîtin (Yozgat, 2018: 36). Teoriya Binyadîger bandoreke mezin li zimannasan û li civaka zimannasiyê kiriye û êdî li şûna xebatêni li ser peyvan, xebatêni

derbarê taybetmendiyên binyadî yên zimanan hatine çêkirin. Ekola Pragê (Roman Jakobson, Nicholay Trubetskoy, Sergey Karchevsky û yd.) li ser bergindên di navbera yekeyên zimanî de xebitiye û bala xwe daye pergala ku li gorî van bergindan teşe girtiye, bi vî awayî Dibistana Pragê bingeha Dengnasiyê (*phonology*) daniye. André Martinet û Émile Benveniste bi navê Ekola Zimannasiya Fonksiyonî ya Fransayê têr nasîn. Martinet li ser vê angaştê ye ku ziman binyadeke du tebeqeyî ye ku yek “wateyî” ye û ya din jî “dengî” ye. Martinet vê binyadê jî wekî taybetmendiya “cot movikkirin” (*double articulation*) ya zimên pênase dike. Benveniste jî di çarçoveya Teoriya Vegotinê (*Theory of Enuncitation*) de, li gorî pêwendiyê xebitîna/karkirina zimên vekolaye. Ekola Kopenhagê (Viggo Brondal, Louis Hjelmslev, Hans J. Uldall), dibistaneke din e ku binyadîgeriya Saussure ji xwe re kiriye bingeh. Ekola Kopenhagê hewl daye lêkolînên xwe yên li ser zimên di çarçoveya bingehê mentiqî û matematîkî (*glosematik*) de çêke (Aksan, 2020: 22; Kîran û Eziler Kîran, 2018: 42; Rifat, 2008: 32; Yozgat, 2018: 37-38). Temamê van ekol û lêkoleran bi layenêrîna binyadîgerî ziman şayesandine lê ji nav wan Ekola Pragê, li ser vê fîkrê bûn ku bêyî fonskiyonên zimên nabe ku ziman bê lêkolîn. Ligel ku binyadîger ziman wekî pergalekê didîtin, Ekola Pragê bi çavê pergaleke fonksiyonan li zimên dinêrî (Toklu, 2021: 36).

Dema ku li Ewropayê xebatêni li ser zimên di çarçoveya binyadîgerî û fonksiyongeriye de berdewam bûn, li Emerîkayê xebatêni derbarê zimên piranî ji aliyê antropologan ve dihatin meşandin (Robins, 1997: 236). Ligel ku binyadîgeriya ewropî bala xwe dide ser pêwendî û têkiliyên li hemberî hev ên di navbera hêmanan de, binyadîgeriya emerîkî giringî daye cihê hêmanên zimanî, pevguherîna wan û berbelavbûna wan a di hundirê binyadê de (Rifat, 2008: 52). Antropolog û zimannasên wekî Franz Boas, Edward Sapir, Leonard Bloomfield û Zellig Sabbatai Harris ku bi taybetî li ser zimanên xwecih (*native*) ên emerîkî xebitîne, bi layenêrînen senkronîk û şayesî (*descriptive*), di çarçoveya binyadîgeriyê de xebatêni xwe kirine. Di serî de Harris bi vê angaştê pêşengî kiriye ku bi rîbaza lêbelavgerî (îng. *distributionalism*, tr. *dağılımcılık*) û bikaranîna korpûsê (*corpus*), mirov dikare binyada rîzimanî ya zimanan bipeyîtîne. Li gorî vê rîbazê, di hundirê korpusê de belavbûna yekeyên ku dişibin hev têr tesbîtkirin û di bin heman kategoriyê de têr civandin, bi vî awayî kategori têr avakirin ku bi pîvanêن teşeyî hatine diyarkirin (Kîran û Eziler Kîran, 2018: 197).

Li vir, xwendekarê Harris, Noam Chomsky vê nêrînê rexne dike û dibêje nabe ku kategoriyên rêzimanî tenê bi korpusê ve bêñ diyarkirin, li gorî wî, heger di korpusê de tune be jî axiverên zimanê zikmakî dikarin heta hetayê risteyan hilberînin û wan fahm bikin. Chomsky vê nêrîna xwe kûrtir dike: her şexs di hîzrê xwe de xwedî şiyana zimên a zimanê xwe ye û bi vî awayî ev şexs dizane bi rêzikên zimanê xwe dengan bîne cem hev û peyvan çêke, peyvan bîne cem hev û frazan çêke, frazan bîne cem hev û risteyan saz bike (Yozgat, 2018: 39). Chomsky ji bo tevahiya van rêzikên ku li cem şexs hene dibêje pêkarîn (îng. *competence*, tr. *edinç*) ku Saussure wekî ziman (*langue*) diyar kiribû, ji bo bikaranîna van rêzikân jî dibêje pêkirin⁶ (îng. *performance*, tr. *edim*) ku Saussure wekî gotin (*parole*) diyar kiribû (Radford, 2012: 2).

Ji rêzimana klasîk cuda, peyvrêziya binyadîger di lêkolînên xwe de bi bikaranîna rêbazên zanistî yên teqez û yên ku dikarin bêñ kontrolkirin û bi piştrastkirina pîvanêñ hevgirtî dixwaze binyadêñ peyvrêziyî vekole. Armanca peyvrêziya binyadîger ew e ku binyadêñ risteyan bişayesîne û binêre bê ji aliyê rêzimanê ve sazkirina risteyêñ rast bi kîjan qayîde û pîvanan çêdibe. Şibîna rêzimana klasîk û peyvrêziya binyadîger di perçekirina risteyan de tê dîtin. Rêbaza perçekirin û frazkirinê rêbaza sereke ya peyvrêziya binyadîger e (Toklu, 2021: 104). Ger em risteya “Bavê min sêvan dikire” weke nimûne bidin:

Tablo 1.1. Hêmanên sereke yên risteyê.

Bavê min	sêvan	dikire.
Biker	Berkar	Pêveber

Cihguhertina/barkirina (*movement*) hêmanên risteyê rêzikeke din e ji bo analîza risteyan. Ev pêvajo bi rêzikî (îng. *syntagmatic*, tr. *dizimsel*) diqewime. Li gorî vê rêzikê em dikarin risteya nimûne wiha biguherînin.

Tablo 1.2. Rêzika cihguhertina hêmanên risteyê.

Bavê min	sêvan	dikire.
Sêvan	dikire	bavê min.
Dikire	bavê min	sêvan.

⁶ Zafer Açar ji bo şiyana zimên (*competence*) têgeha “pêkarîn”ê, ji bo performansê (*performance*) jî têgeha “pêkirin”ê bi kar tîne. (<https://youtu.be/g63KvADBT3A> 20.02.2024). Ji ber ku ev têgeh nêziktirî wateyên têgehêñ zimanê îngilîzî ne, me jî ev bi kar anîn.

Rêzikeke din jî pevguherîna (*replacement*) peyvên di heman birrê de (*word class*) ye. Ev pêvajo bi rêzeyî (îng. *paradigmatic*, tr. *dizisel*) çêdibe.


Tablo 1.3. Rêzika pevguherîna hêmanên risteyê.

Bav-ê	min	sêv-an	di-kir-e.
Heval-ê	te	pirtûk-an	di-kir-e.
Qîz-a	wî	stran-an	di-bêj-e.
Bizin-a	wan	lotik-an	di-d-e.
Ew		helbest-an	di-nivîs-e.

Herwiha, jêbirin (*deletion*) jî tê kirin ku ji bo diyar bibe ka kîjan hêman hêmanên sazkar ên risteyê ne ku nabe ji risteyê bênen derxistin û bê ka kîjan hêman dikarin bênen derxistin. Di risteya “Bavê min sêvan ji sûkê dikire” de, hêmana “ji sûkê” dikarê bê jêbirin. Perçeyê mayî “Bavê min sêvan dikire” risteya kakil e û ji sê hêmanan pêk hatiye. Heger lêkereke negerguhêz be wê çaxê riste dikare tenê ji du hêmanan jî pêk bê (Bavê min dimeşe).⁷

Fries, Harris û Gleason di analîza risteyan de berê xwe dane rîbaza morfolojiyê ya analîza peyvan, ew ji xwe re kirine pêlik. Bi vî awayî, di rîzkirina perçeyên risteyê de -di xeta asoyî (*syntagmatic*) de- dibînin ku “perçeyek” hertim wekî hêmana avaker (*constituent*) derdikeve pêş, ango di nava hêmanan de rewşeke hiyerarşiyî heye. Riste avaniyek e ku ji avakeran pêk tê û dikare bi avakeran ve bê perçekirin. Wextê riste tê perçekirin giringî bi têkiliya morfeman a bi hevûdu re û têkiliya morfeman a bi risteyê re tê dayîn (Toklu, 2021: 106). Bi vê rîbazê êdî riste dikare bi dara peyvrêziyê (*syntax tree*) bê nîşandan. Lewma ji vê rîzimana binyadîgerî re û ji rîbaza wê re Analîzên Avakerên Rasterast (*Immediate Constituents Analysis/IC Analysis*) hatiye gotin (Pelz, 1998: 147-179, vghz. Toklu, 2021: 106). Risteya “Bav sêvan dikire” ji sê hêmanên avaker pêk hatiye:

⁷ Di kurmancî de, di hin rewşan de lêker gireyên kesandinê werdigirin. Di rewşeke wiha de mirov dikare bibêje ku di kurmancî de pêveber dikare bi tena serê xwe jî risteyekê saz bike. Di dema niha de, bi hemû lêkeran (têper û têneper) ve (têm, têyi, tê, têñ, dixwim, dixwî, dixwe, dixwin), di dema borî de bi lêkeren têneper ve (hatim, hatî, hat, hatin) risteyên tenê bi pêveberê dikarin bênen sazkirin lê dîsa jî ji ber ku kesandina kesên pirjimar bi heman gireyê ve têñ çekirin, di pêveberên pirjimar de biker ne diyar e. Di dema borî de lêkerên têper li gorî berkarê têñ kişandin (min sêv xwar-in), lewma heger biker ji risteyê bê derxistin problemên wateyî dertên. Herwiha, di risteyên pasîv (*passive voice*) de jî biker ne diyar e (sêv hat-in xwarin, sêv tê-n xwarin). Lewma, meriv nikare weke qayîde, bibêje di kurmancî de lêker bi tena serê xwe dikarin risteyan saz bikin.




Şekl 1.1. Hêmanên avaker.

Dara sentaksê derfetê dide me ku em risteyên dirêtir jî li gorî hêmana avaker perçe bikin. Bi vî awayî riste, li gorî têkiliya ku bi hev ve saz dikan, bi peyv an jî komepeyvan (fraz) tê perçekirin.



Şekl 1.2. Morfemên risteyê û tekiliyên wan ên bi hev re.

Çawa ku ji dara sentaksê ya li jor tê fahmkirin, riste dikare heta bi morfeman jî ji hev bê perçekirin. Bi vê perçekirinê têkiliya morfeman ya bi hev re tê tesbîtkirin. Di qonaxa pêş de êdî têkiliya van morfeman ya bi binyada risteyê re dikarê bê nîşandan.



Şekl 1.3. Têkiliya morfeman bi binyada risteyê re.

Tê dîtin ku ji dara risteyê ewilî du çiqil vediqetin, yanî riste ji frazeke navdêrî û frazeke lêkerî pêk hatiye. Herwiha ev komepeyv jî di nava xwe de bi çiqilan vediqetin. Binê her çiqileke darê (*node*) pêkhateyeke risteyê nîşan dide û her pêkhate li gorî birra xwe ya rêzimanî hatiye binavkirin. Anglo, fraza navdêrî û fraza lêkerî du avakerên risteyê ne; peyvên “bav” û “min” jî avakerên fraza navdêrî ne. Ev rîbaz ji bo Rêzimana

Veguherînî-Hilberîner (*Generative-Transformational Grammar*) ya Harris û ji bo Rêzimana Hilberîner (*Generative Grammar*) a Chomsky dê bibe bingeh.

Harris, di xebata xwe *Methods in structural linguistics*⁸ de rîbazên perçekirin û frazkirinê pêşve birine û li ser têgeha veguherînê sekiniye (Aksan, 2020: 129). Li gorî wî, ew risteyên bêhed ên di zimanekî de bi alikariya veguherîna risteyên kakil ên kêmjimar ava dibin. Harris li ser vê layenêrînê neh cure veguherîn tesbît kirine: Veguherîna pasîv, veguherîna destpêkê, veguherîna cihguhertinê/barkirinê, veguherîna navdêrkirinê, veguherîna rengdêrkirinê, veguherîna îzafekirinê, veguherîna bêjandinê/neqandinê, veguherîna neyîniyê (Gross, 1998: 73-79, vghz. Toklu, 2021: 109). Di bin sernavê vê teoriyê de em ê berfirehtir li ser van veguherînan bisekinin.

Wextê sal dibe 1957, xwendekarê Harris, Noam Chomsky berhema xwe *Syntactic Structure*⁹ (Binyadêن Peyvrêziyî) diweşîne. Gelek zimannas li ser vê li hev dikin ku bi vê xebatê, piştî Saussure, di qada zimannasiyê de gaveke gelek giring hatiye avêtin. Bi vê xebatê, deriyê Rêzimana Hilberîner (*Generative Grammar*) hatiye vekirin. Chomsky heta tê sala 1965ê gelek xebatê din jî dike û di teoriya xwe de gelek guherîn û sererastkirinan dike. Di sala 1965ê de xebata xwe *Aspects of the Theory of Syntax*¹⁰ (Xuyangêن Teoriya Peyvrêziyê) diweşîne. Bi vî awayî bingeha Rêzimana Gerdunî (*Universal Grammar*) datîne.

Wekî me berê jî gotî, Saussure di teoriya xwe de têgehêن ziman (*langue*) û gotinê (*parole*) ji hev cuda kiribû. Herçi mirov wextê ji derive lê binêre, belkî bişibin hev lê ji hundir ve ji hev cuda, Chomsky li şûna têgehêن Saussure têgehêن pêkarîn (îng. *competence*, tr. *edinç*) û pêkirinê (îng. *performance*, tr. *edim*) bi kar tîne. Li cem Saussure “ziman” hevpar û civakî bû, lê şiyana zimên (*competence*) a Chomsky şexsî û gerdunî ye, bi jidayikbûnê, jixwe bi her mirovî re heye, zanîn û famkirina hîzrî ya zimanekî ye û axiver dizane di zimanê wî de çi rast e çi xelet e. Têgeha *parole*¹¹ (gotin) ya Saussure bikaranîna zimên a şexsî ye ku heqîqî û rojane ye, girêdayî bijartinê şexsî ye û li gorî pêwendiyê dikare biguhere lê ji encama zimên (*langue*) û li gorî rêzikên

⁸ *Methods in structural linguistics* di sala 1951ê de hatiye weşandin. Halê dawî yê xebatên wî yên derbarê binyadîgeriya şayesi de ye ku ji sala 1945ê vir pê de li ser wan dixebeitî.

⁹ Herçend di serî de navê teoriyê wekî *Generative Transformational Grammar* be jî her ku teorî kemili, Chomsky bi nêrîna mînîmalîst (*minimalist program*) kirariyên yekkirin (*merge*) û barkirin (*move*) tevî teoriyê kirine û êdî hewce bi kirariyên veguherînî (*transformational*) nedîtiye.

zimên (*langue*) tê sazkirin.¹⁰ Ligel wê, têgeha *performance*ê ya Chomsky, bikaranîna zanîna hizrî (*competence*) ye. Ev bikaranîn derûnî û reftarî ye.¹¹ Di teoriya Chomsky de şiyana zimên/pêkarîn kod (*code*) e, pêkirin (*performance*) jî kodkirin an jî vekirina kodê ye.

Chomsky wextê behsa şiyana zimên (*competence*) dike, dibêje zanîna zimanekî ew e ku mirov dişê bi hejmareke bêhed risteyan fam bike. Lewma Rêzimana Hilberîner jî bi pergala rêzikên xwe divê bişê heta hetayê risteyan hilberîne. Pergala rêzikên Rêzimana hilberîner ji sê beşan pêk tê: peyvrêzî, dengnasî û watenasî. Peyvrêzî, wan heyberên teşeyî yên bêhed diyar dike ku her yek ji wan ji bo avakirina risteyê agahiyên hewce dihewînin. Dengnasî binyada dengî ya risteya bi rêzikên peyvrêziyê sazkirî misoger dike. Watenasî jî şiroveya wateyî ya risteyê diyar dike; binyada bi rêzikên peyvrêziyê sazkirî bi wateyeke diyar pêşkêş dike (Aksan, 2020: 133)

Chomsky, di Rêzimana Hilberîner de dara peyvrêziyê (*syntax tree*) ya rêzimana avakerên rasterast (*immediate constituents analysis*) bi kar anije lê ne ji bo şayesandina risteyên hazir ên di korpusê de. Chomsky dara sentaksê ji bo kifşirina demajoya hilberandina risteyan bi kar anije ku ew riste heta niha nehatine hilberandin (Toklu, 2021: 112). Di hilberandina risteyê de têgehêن binyada kûr (*deep structure*) û binyada rûser (*surface structure*) jî cihêن giring digirin. Binyada kûr ew e ku di navbera yekeyan de têkiliyên mentiqî tê sazkirin. Bilêvkirina risteyan jî binyada rûser temsîl dike. Kayabaşı (2018: 287) ji Aydin (2007) neqil dike ku risteyên bi rêzikên frazkirinê hatine avakirin di tebeqeya binyada kûr de ne û çawa ku ji merheleya guherînan derbas dibin, tên binyada rûser. Ji bo binyada kûr û ya rûser ev mînaka îngilîzî tê dayîn: *You do go where. > Where do you go?* Di vê mînakê de risteyeke agihandinî ya di binyada kûr de diguhere (bi veguherîna cihguhertinê/barkirinê) dibe risteyeke pirsê. Ji bo kurmancî em dikarin bi veguherîna pasîvê vê minakê bidin: Te ez dîtim. > Ez (ji aliyê te ve) hatim dîtin.

¹⁰ Li vir em dikarin behsa mînaka Saussure ya kişikê (*chess*) bikin. Di teoriya Saussure de ziman (*langue*) rêzikên kişikê temsîl dike ku kesen bi kişikê bilîzin divê li gorî van rêzikên hevpar bilîzin. Gotin (*parole*) jî hemû hereketên mimkin yên lîstikvanan temsîl dike. Ziman pergal (*system*) e, gotin bikaranîna pergalê ye.

¹¹ Di teoriya Noam Chomsky de şiyana zimên (*competence*) îdealîzekirî ye, ji kêmasiyên bîyolojîk bêpar e. Axiverê xwecih derbarê fonetik, dengnasî, peyvrêzî, teşenasi û watenasiya zimanê xwe de xwedî agahî ye, rast û xeletiyên zimanê xwe dizane. Lê wextê vê şiyane bi kar tîne (*performance*), jibîrkirin, kelecanî, kêmasiya baldariyê, gêjbûn û xeletiyên axaftinê dikare bandorê li bikaranîne bike şêweya vegotinê bidirûvîne.


Di Rêzimana Hilberîner de rêzikên binyadêna frazî û frazkirinê (avakirina frazan) ji bo hilberandina risteyê zimanekî tê formûlekîn. Ev formûl ji bo analîza binyada risteyê tê bikaranîn. Ji ber ku di besêñ din de em ê berfirehî li ser mijara frazan bisekinîn, em ê li vir dûvdirêj behs nekin lê ji bo Rêzimana Hilberîner baş bê famkirin em ê bi çend mînakân behsa frazkirin û formûlekîrina frazan bikin. Kayabaşı (2018: 280) vê mînakê dide û mijarê rave dike: “Zarokê çûr pirtûkên te yên dersê xwendine.” Mirov wer têdigihê ku riste ji peyvîn li kêleka hev rêzkiр pêk hatiye. Rast e ku wextê li ser kaxezê ye û wextê mirov wê bi lêv dike riste di xeta asoyî (xêzikî) de dixuyê; lê ew ji ber wê ye ku binyadêna merheleyî yên hizrî mecbûr e ku li dinyaaya fizîkî bi rêzikî bêñ derbirîn. Lê wextê bi awayê li jêr ristê bê analîzkirin dê were dîtin ku têkiliya di navbera yekeyan de -ku risteyê saz dikin- ne di heman wesf û astê de ne.

[Zarokê çûr
[[pirtûkên te [yên dersê]] xwendine]]

Şekl 1.4. Têkiliya di navbera yekeyen risteyê de. (Kayabaşı, 2018: 280)

Tê dîtin ku hin peyv bi hev ve zêdetir têkildar in, yanî zêdetir nêziktirî hev in. Ev nêzikbûn ne ku li ser kaxezê ye an jî di bilêvkirinê de ye, ew nîşanê bi pêwendiya binyadî dike. Yanî, riste ji aliyê binyadî ve ji hin merheleyan derbas dibe û ava dibe. Ji bo her yekeya ku binyada risteyê ava dike, avaker (*constituent*) tê gotin. Yekeyen avaker tê cem hev û frazan ava dikin, fraz jî risteyan ava dikin. Bo nimûne, “zarok” û “çûr”, du yekeyen avaker bi ïzafeyê bi hev ve hatine girêdan û fraza “zarokê çûr” ava bûye ku êdî ev fraz jî avakerek e lê êdî mezintir e. Di senifandin û binavkirina frazan de sere (*phrase head*) diyarker e. Li gorî birra (*word class*) sereyê fraz tê binavkirin û senifandin. Di fraza “zarokê çûr” de sere “zarok” e, peyva “zarok”ê ji birra navdêran e lewma ev fraz frazeke navdêrî ye. Di senifandin û binavkirina frazan da carinan hin taybetmendiyê zimanî yên zimanê behskirî jî bibandor in. Li bin sernavê frazan em ê berfirehî vê mijarê rave bikin.

Armanca sereke ya Chomsky şayesandina pêvajoya hilberandina risteyan e. Bi vî awayî dikare ji bo frazkirina binyada zimên formûlan bi dest bixe. Bi xêra formûlên bidestxistî jî meriv dikare risteyan hilberîne ku hêj nehatine hilberandin. Bo nimûne em risteyeke bi hêmanê sereke sazkirî analîz bikin:



Şekl 1.5. Dara sentaksê ya “Zarok nê dixwe”.

Di vê risteyê (R) de em dibînin ku avakerên risteyê fraza navdêrî (FN) û fraza lêkerî (FL) ne. Lê ew jî ji hêmanên din hatine avakirin. Fraza navdêrî ji navdêrekê (N) “zarok”, fraza lêkerî jî ji frazeke navdêrî û lêkerekê (L) pêk hatiye. Yanî, meriv dikarê rêzikên frazkirina vê risteyê wiha formûle bike:

$$\begin{array}{ll}
 R \rightarrow FN + FL & N \rightarrow Zarok, nan \\
 FN \rightarrow N & \\
 FL \rightarrow FN + L & L \rightarrow dixwe
 \end{array}$$


Li gorî vê, $R \rightarrow FN + FL$ formûla risteyeke kakil e û bi vê formûlê meriv dikare gelek risteyan saz bike: zarok godt dixwe, zilam penêr dixwe,¹² zarok pirtûkê dixwîne, keçik mîhan didoşe, dayê şîr dikirî... Herwiha, bi alîkariya veguherînan meriv dikare ji risteya kakil gelek risteyê din bidarêjîne: dayê şîr dikirî û mast dimeyand (veguherîna gihanekê), lêwik nan nedixwar (veguherîna neyîniyê û ya demê), gelo zilam penêr dixwe?¹³ (veguherîna pirsê)...

Chomsky, wextê di sala 1965ê de *Aspects of the Theory of Syntaxê* (Xuyangêن Teoriya Peyvrêziyê) diweşîne, kêmasiya wateyî ya teoriya xwe ji holê radike. Di Binyadêن Peyvrêziyî de, di frazkirin û sazkirina risteyê de wate hatibû piştguhkirin. Li gorî wan rêzikan “Fikrên kesk ên bêreng bihêrs radikevin” (*Colorless green ideas sleep furiously*) risteyeke rêzmanî be jî ji aliyê wateyê ve tu wateyê dernabire. Lewma Chomsky hin rêzikên kategorîk/birrî diyar kirine. Di hilberandina fraz û risteyê de di hilbijartina peyvan de rêzikên binkategorî û hilbijêrandinê têr bikaranîn. Rêzikên kategoriyî ji bo ahenga rêzikî ya di navbera hêmanên risteyê ne, rêzikên hilbijêrandinê

¹² An jî: Zarok godt dixwe. Zilam penêr dixwe.

¹³ An jî: Gelo zilam penêr dixwe.

jî ji bo ku risteyên bêwate neyên hilberandin, taybetmendiyên wateyî yên wekî “zindî, mirov, razber, jimarbar, têper, têneper û hwd.” kontrol dike (Toklu, 2021: 114-116).



Şekl 1.6. Rêzikên kategoriyî û hilbijêrandinê.

Di herdu risteyên li jor de, hilbijartina peyvan û rêzikên hilbijêrandinê di cî de ne. Ji ber ku “keçik” zindî ye, lêkera risteyê jî “dimeşe” taybetmendiyên zindî dihewîne. Herwiha, ji ber ku lêker têneper e, di risteyê de berkar tune ye. Di risteya duyem de “Keçik stranan dibêje”, ji ber ku lêker “dibêje” lêkereke têper e, berkara “stran”ê wergirtiye. Li gorî wê, em bi rihetî dikarin bibêjin ku ev riste ne li gorî rêzimanê ne: *Pirtûk nêñ dixwe. #Pirtûk radikeve.¹⁴ *Zarok sêv dimeşe.¹⁵

Axirî, Rêzimana Hilberîner ya Chomsky teoriyeke zimannasiyê ye ku xebitîna zimanê însen vedikole û dixwaze bidestxistin û şiyana hilberandina zimên a însen rave bike. Teorî, ji sala 1957ê heta roja me, hem ji aliyê têgehî hem jî ji aliyê rîbazî ve gelekî guheriye, ji gelek aliyan ve hatiye kontrolkirin û sererastkirin û gihiştiye rewşa xwe ya rojane (Kayabaşı, 2018:325). Teoriya Chomsky di zimannasiyê de bûye çavkaniyeke sereke û bandor li gelek zimannasan kiriye. Bi saya xebatêñ wî, taybetmendiyên gerdûnî yên zimên eşkere bûne û bi vî awayî jî zimannasî bûye zanistekte gerdûnî. Bi taybet jî xebatêñ derbarê frazan de kir ku em binyad û xebitîna zimên baştır têbigihin.

Di bin vî sernavî de, me bi kurtasî ji destpêkê heta roja me behsa xebatêñ li ser ziman û zimannasiyê kir, cih ûrola frazan a di nava van xebatan de diyar kir û me ji

¹⁴ Nîşana hejmarê [hash] (#) tê wê wateyê ku herçi riste li gorî qayîdeyên rêzimanê be jî ji aliyê wateyê ve ew ecêb û nexweş e.

¹⁵ Nîşana stêrkê (*) tê wê wateyê ku ev riste ne li gorî rêzikên rêzimanê ye.

peyvrêziya kurmancî nimûneyên kurmancî jî lê zêde kîrin. Îcar, di dewamiya vê besê de em ê ewilî bala xwe bidin mijara frazê, mijarê rave bikin û piştre jî binêrin bê giringiya frazan ji bo teoriyên zimannasiyê çi ye, di nava van teoriyan de çawa cih werdigire.

1.1. Fraz

Peyv, yekeyên zimên in ku têgehan yek bi yek nîşan didin. Dema ku ragihandin bi zimên pêk tê, bona meriv karibe li ser têgehan biaxive pêdivî bi wê peyvê heye ku wan tiştan nîşan dike. Bo nimûne; di kurmancî de peyva “qedeh” an jî “piyale”yê navên wan tiştan in ku ji bo pêvexwarina şîlavê têن bikaranîn. Wekî peyv, qedeh, beramberî objeyekê tê û wextê ragihandinê, bi bikaranîna vê peyvê mirov dikarin bêpirsiyar li hev bikin (Gökdayı, 2010: 1299).

Lê dibe ku peyv, her gavê bi tena serê xwe nekaribe ragihandineke biwate û kîrhatî saz bike. Divê hûrgilî û çawaniya têgehan jî bêñ diyarkirin. Lewma hewce bi peyvên din hene da ku xwîner an jî guhdar wateyeke hevgirtû wergire. Bo nimûne; bona meriv karibe hin taybetiyêne peyva “mal”ê diyar bike pêdivî bi koma peyvan heye (mala min, mala mezin, mala dengbêjan, mala sor a li serê kolanê). Herwiha, di ziman de hin têgeh hene ku tenê bi peyvekê ve nikarin bêñ diyarkirin. Bakurê Kurdistanê, Gola Wanê, Qada Çarcîra, Wezîrê/a Karûbarê Derve, Sala Şewatê çend mînakêñ baş in bo van têgehan ku meriv wan perçe bike êdî wateya wê têgehê nade.

Îcar, ev komên peyvan, di zimanê îngilîzî de wekî *phrase* hatine binavkirin û di zimanê tirkî de jî *söz öbegi* (komika peyvan) û *kelime grubu* (grûba peyvan) têñ bikaranîn. Di kurmancî de em vê têgehê bi navê “ravek”ê nas dikin lê Ciwan (1992) û Bülbül (2016) peyva “fraz”ê bi kar anîne û peyvên “firaz” û “firêz”ê jî têñ bikaranîn. Erê em frazan bi navê ravekê nas dikin lê divê bê zanîn ku her ravek fraz be jî her fraz ne ravek e. Têgeha ravekê ji bo rewşa ïzafeyê têñ bikaranîn û herî kêm du peyv hewce ne bo ravekê, lê di frazan de ne pêwîst e ku rewşa ïzafeyê hebe.

Di ziman de li gorî teoriyên sentaksê dibe ku pênameya frazê û binavkirina besêñ frazan biguhere jî lê fraz gelempêri wiha tê terîfkirin: Girêdana du an jî zêdetir peyvan e ku ji aliye semantîk ve wateyeke hevgirtî nîşan didin lê ne xwedî daraz in. Ji aliye binyadî ve, komik dikarin ji du, ji duyan zêdetir û weke rîbazî, heta-hetayê ji peyvan pêk bêñ (Uzun û Aydin, 2006: 68). Lê peyvek bi tena serê xwe jî ku bi

morfemeke bestî ve bê diyarkirin an jî modîfeyekirin, ew jî fraz e. Peyvên ku frazan ava dikan bi awayekî biqayîde têr rêzkirin, navdêrek an jî navdêren ku bi gihaneka “û”yê ve hatine girêdan dibin sere (Bülbül, 2016: 23). Ev sere ji hêla peyvên din ve têr modîfiyekirin. Modîfiyeker bi erka firehkirin, xurtkirin, diyarkirin û wesfandina wateyê radibin (Karahan, 1999: 11). Modîfiyeker dibe ku li pêş sereyê an jî li paş sereyê be. Herwiha, di frazan de dibe ku çend frazêni ji hev cuda bi hev re bibin cureyeke frazekê.

(1)

- a) Deriyê sor.
- b) Pêncî derî.
- c) Hevalekî ez dîtim.
- d) Heval hat.
- e) Dê û bavê min.

Di mînaka (1a)yê de navdêrek û rengdêrek bi veqetandekê bi hev ve hatine girêdan û rewşa îzafeyê çêbûye. “Derî” bi rengê “sor” ve hatiye modîfiyekirin. “Derî” sere û “sor” jî modîfiyekera sereyê ye. Di vê mînakê de ewilî sere, piştre modîfiyeker hatiye. Di mînaka (1b)yê de bêyî veqetandekan fraz pêk hatiye. Sereya frazê “derî” ye, ew navdêr e û ketiye dawiya frazê. “Derî” ji hêla peyva “Pêncî”yê hatiye modîfiyekirin. Hejmara sereyê hatiye diyarkirin. Di mînaka (1c)yê de bikera hevokê (Hevalekî) gireya tewangê ya yekjimar, nêr û nenasnyariyê wergirtiye. Ligel ku tenê peyvek e jî ji ber ku wateyeke wê ya hevgirtî heye û em dikarin wê wekî “yek hevalî” (*a friend*) an jî bi cînavan “wî/wê” diyar bikin, ew dibe fraz. “Heval” sere ye û jî hêla hejmar, zayend û nenasnyariyê ve hatiye modîfiyekirin. Lê ji bo avabûna frazekê ne hewce ye ku peyv gireyan bigire. Peyvek bi tena serê xwe jî dikare bibe fraz ku ev sereya frazê be (Delahunty û Garvey, 2010: 275). Di (1d)yê de ligel ku sere xwerû ye, tu gire wernegirtiye jî ji ber ku di kurmancî de navdêren xwerû bixwe nasyar in (*zero morfem*), sereya xwerû dikare bibe fraz. Di mînaka (1e)yê de sere ji du navdêran pêk hatiye (Dê û Bav) û ev herdu navdêr bi gihaneka “û”yê ve bi hev hatine girêdan.

Di kurmancî de modîfiyeker piranî têr paş sereyê û ji bona rewşa îzafeyê çêbibe, peyv bi veqetandek û gihaneka “û”yê bi hev re têr girêdan. Bülbül (2017), sînorêni frazan wiha diyar dike; “Sereyek û modîfiyekera wê di heman demê de yekîneyeke sentaktîk jî pêk tînin û ji ber ku yekîneyeke sentaktîk in jî dema ku têr gotin weke

yenîneyekê têñ gotin.” Di jihevveqetandina frazan de em serî li prosodiyê (*prosody*) didin. Prosodî, di zimêñ de tiştêñ wekî intonasyon, ton, navber (*break*), guvaş û teqla (*rhythm*) axaftinê ifade dike. Di navbera frazan de em piçekî disekinin, dûre dewam dikan. Di xebatêñ zimannasiyê de navberêñ prosodîk yêñ kurt bi xêzekê (I) û navberêñ dirêj bi du xêzan (II) têñ nîşandan (Bülbül, 2017: 92). Navbera kurt ji bo fraz û ravekan, navbera dirêj jî ji bo risteyan têñ bikaranîñ da ku wateya hevgirtî ya frazan û risteyan xera nebe. Di nivîsînê de jî divê em ji xalbendiyê istîfade bikin.

(2)

- a) Tiştek (I) ji Xwedê nayê veşartin.
- b) Tiştek ji Xwedê (I) nayê veşartin.

Weku tê dîtin hem (2a) hem jî (2b) ji heman peyvan pêk hatine lê li gorî rîbazêñ prosodîk wateya wan diguhere. Di mînaka (2a)yê de wate ew e ku: “Xwedê her tiştî dibîne, ne mimkin e meriv tiştekî, ji Wî veşere.” Di mînaka (2b)yê de wate diguhere, dibe: “Ne mimkin e ku meriv wî tiştî veşerê ku ew tişt aîdî Xwedê ye, perçeyek ji Xwedê ye.”

Axirî, di teoriyên sentaksê de ku bi armanca rîzmaneke gerdûnî bê avakirin ev teorî hatine avakirin, fraz û binyada frazan bi hin prensîban (*principle*) û li gorî zimanêñ cuda jî bi hin parametreyan (*parameters*) hatine diyarkirin. Em ê di bin sernavê teoriyan de berfirehtir li ser van prensîb û parametreyan bisekinin.

1.1.1. Binavkirin û Dabeşkirina Frazan

Di zimanen de fraz li gorî cureya peyvê ya sereyê têñ binavkirin û dabeşkirin. Sere di navenda frazê de ye û wate li gorî sereyê diyar dibe. Peyv an jî gireyên din li sereyê zêde dabin. Tallerman (1998: 108) ji bo zimanê ìngilîzî ev qayîde bi kar anije û Gökdayı (2010: 1317) jî di zimanê tirkî de ji bo dabeşkirina frazan ev qayîdeyên gerdûnî hewce dîtiye. Ligel ku ev qaîde hevpar bin jî li ser dabeşkirina wan lihevkirinek tune û iro jî li ser vê mijarê xebat têñ kirin.

Gökdayı (2010: 1317) di xebata xwe de balê dikişîne ser vê mijarê û derdibire ku di binavkirin û dabeşkirina frazêñ zimanê tirkî de aloziyên mezin hene. Altun (2011), frazêñ di zimanê tirkî de li gorî avabûnê dike du beş: frazêñ bi morfemên bestî ava dabin û frazêñ bi morfemên serbixwe ava dabin. Ev herdu beş jî di nava xwe de dabin 10 beş, yanî 20 beşen frazêñ zimanê tirkî nîşan dane. Gökdayı (2010: 1317), li

gorî qayîdeya “binavkirina li gorî cureya peyva sereyê” ku ev qayîdeyeke gerdûnî ye, hejmara frazên zimanê tirkî dadixîne pêncan û wan wiha rêz dike; fraza navdêrî (*ad öbegi*), fraza rengdêrî (*sifat öbegi*), fraza hokerî (*zarf öbegi*), fraza daçekî (*ilgeç öbegi*) û fraza lêkerî (*eylem öbegi*). Tevî ku baneşan, gihanek û cînav cureyên peyvan in jî ji bo frazan nabin sere (Uzun, 2000: 31).

Di zimanê îngilîzî de jî ev alozî heye lê di xebatêñ zimannasiyî yên dawî de frazên zimanê îngilîzî jî gelempêrî bi van cureyan hatine dabeşkirin: fraza navdêrî (*noun phrase*), fraza rengdêrî (*adjective phrase*), fraza hokerî (*adverb phrase*), fraza pêşdaçekî (*prepositional phrase*) û fraza lêkerî (*verb phrase*) (Delahunty û Garvey, 2010: 274).

Digel wan, Chomsky di xebata xwe *Barriersê* (1986) de dibêje hêmanêñ alîkar ên di risteyê de divê wekî kategoriyên leksîkal di asta frazan de bêñ temsîlkirin. Bi vî awayî frazên lêkerî bi projeksiyona berfirehtir a lêkerê ve ketine bin hukmê kategoriyên fonksiyonî yên wekî *Inflection Phrase* (IP)¹⁶ û *Complementizer Phrase* (CP)¹⁷ (Šarić, 2018: 13). Yanî, li gorî fonksiyona kategoriyê meriv dikare frazê binavîne. Bo nimûne em dikarin ji bo fonksiyona ïzafeyê, Fraza Îzafî (Fîz), ji bo rewşa neyîniyê Fraza Neyînî (FNe), ji bo gihanekê Fraza Gihanekî (FGih) û ww. bi kar bînin (Chomsky, 1898; Pollock, 1989 vhgz. Kareem, 2016: 2).

Herwiha, Abney (1987) di Hîpoteza Fraza Diyarker (*Determiner Phrase Hypothesis*) de, nîşan dide ku heger digel navdêrekê (*noun*) diyarkerek (*determiner*) hebe, diyarker dibe sere, lewma divê wekî DP (*Determiner Phrase*) bê binavkirin (Sideeg, 2016: 18).


1.1.2. Binyada Frazan û Dara Sentaksê

Dara sentaksê (*syntax tree*) yan jî diyagrama darê ji Noam Chomsky vir de ji bo nîşandana binyada frazan tê bikaranîn. Givon (2001a: 110-114) di xebata xwe *Syntaxê*

¹⁶ Ev kategoriya fonksiyonî hem kişandina navdêran hem jî kişandina lêkeran nîşan dide. Li gorî cureya kişandinê dikare navê frazê biguhere. Bo nimûne heger lêker bi xuyangê (*aspect*) hatibe kişandin dê fraza lêkerî bibe projeksiyona *Aspect Phrase*ê (AP) an jî li gorî kişandina dema lêkerê bibe *Tense Phrase*ê (TP).

¹⁷ *Complementizer* (temamker) ew hêmanêñ zimêñ in ku hukmê li ser hevokêñ temamker dikan. Di zimanê îngilîzî de “that, whether, wh-words” wekî temamker têñ bikaranîn. Di rîzimanê de wekî gihanek jî têñ qebûlkirin ku hevoka temamker didin nasîn (Brown û Miller, 2013: 90-1; Trask, 2007: 48). Di kurmancî de senifandineke teqez nehatibe diyarkirin jî em dikarin çend temamkirêñ kurmancî wekî mînak bidin: Zozanê got **ku** Dîlan nehatiye. Me mereq kir **bê** tu yê werî an na. Ez nizanim **gelo** hûn ê çi bikin. Ew dibêje **qey** baran dibare.


de çar aliyêñ baş û çar aliyêñ nebaş ên dara sentaksê (nîşandana frazan bi şikl ve) diyar dike. Avakerî (*constituency*), hiyerarşî (*hierarchy*), efíketên kategorîyan ên girêkan (*category labels of nodes*) û nîşandana xeta rêzikî (*linear order*) aliyêñ baş in ku bi dara sentaksê ve binyada frazan tê fehmkirin. Givon dibêje, riste ne ev tişt e ku hema peyv û morfem di xeteke asoyî de hatine rêzkirin. Berevajî wê, riste xwedî binyadeke hiyerarşik e ku ji avakeran pêk tê. Anglo, riste dabeşî besên sereke dibe û ev besên sereke jî dabeşî binbeşan dabin. Kûrahiya vê binyada hiyerarşik nîşana pileya kompleksbûna risteyê ye ku girêdayî lêkerê an jî cureya pêveberê, hin hêman pêwîst in, hin hêman jî li gorî daxwazê tevî risteyê dabin. Hêmanêñ pêwîst ji bo ravekirina wateyî ya lêker an jî cureya pêveberê bivênevê ne. Hêmanêñ li gorî daxwazê, ci ferhengî ci rêzimanî, ji bo rûdanê têñ zêdekin lê ji bo ravekirina wateyî ya lêker an jî cureya pêveberê ne pêwîst in (Givon, 2001a: 110-11).



Şekl 1.7. Hêmanêñ avaker ên risteya "Dîlan dimeşe".

Di risteya “Dîlan dimeşe” de du avakerêñ pêwîst hene. Biker li vir navekî taybet e, pêveber jî lêkerî ye. Herdu hêman jî ji yek peyvê pêk hatine lê bi hêmanêñ nepêwîst meriv dikare rewşa biker û pêveberê biguherîne. Ev riste dikare wiha be jî: Dîlana biçûk bi lez dimeşe. Wê çaxê, biker dibe “Dîlana biçûk” ku ew jî frazeke navdêrî ye. Fraza lêkerî jî “bi lez dimeşe” ji hokerekê û lêkerekê pêk hatiye.


Îcar, ku hêmanêñ risteyê zêde dabin û riste aloz dibe, li vir hiyerarşî ava dibe. Riste (R) serdest e û hukmê li perçeyêñ li jêr dike. Parçeyêñ (frazêñ) di bin hukmê risteyê de jî hukmê li perçeyêñ bin xwe (cureyêñ peyvan) dikin. Li gorî vê, dê dara sentaksê ya “Dîlana biçûk bi lez dimeşe” wiha be:



Şekl 1.8. Hiyerarşiya dara sentaksê.

Riste ji du perçeyên sereke pêk hatiye. Biker fraza navdêrî ye û pêveber jî fraza lêkerî ye. Fraza navdêrî jî ji du hêmanan pêk hatiye. Sereya frazê “Dîlan” navdêr e, sere bi rengedêrekê “bicûk” hatiye modîfiyekirin û ji bo rewşa ïzafî çêbibe bi veqetandeka mî, yekjimar û nasyar “-a”yê ve hatiye girekirin. Di fraza lêkerî de jî lêker “dimeşe” bi hêmana hokerê “bi lez” ve hatiye temamkirin.

Givon (2001a: 112), diyarkirina girêkên (*nodes*) dara sentaksê û etîketkirina kategoriyan wekî aliyekî baş, bisûd diyar dike. Di dara sentaksê de her hêmana avaker ku tê bin çiqilê/xêzika darê, girêkek e û tê etîketkirin.



Şekl 1.9. Girêk (nodes) û etîketên kategoriyan.

Di dara sentaksê de çi leksîkal (*lexical*) çi jî rêzimanî (*grammatical*), hemû hêman dikarin bêñ nîşandan û binavkirin. Bi vî awayî, hemû hêmanên/morfemên risteyê (avaker, modîfiyeker, temamker, peyv, gire û yd.) bi erk û fonksiyonên xwe ve têñ nasîn. Axirî, weke xala dawî ya bisûd, Givon (2001a: 114) dibêje diyagrama darê bi teşeya xwe, bi awayekî jixweber ji bo hemû girêkên hiyerarşiyê rêzeke hişk diyar

dike. Teşeya li ser kaxezê ya çeperast bi rêza zemanî ya morfeman û peyvên axaftinê re hevteşeyî (*isomorphic*) ye. Lewre, di heman demê de, herdu rehendan; ji çepê ber bi rastê ve rêza zemanî û ji jêr ber bi jor ve binyada hiyerarşik nîşan dide.

Givon (2001a: 114) dibêje, ev diyagrama darê ji bo nîşandana hêmanên avaker, hiyerarşî, etîketkirina girêkan û rêzkirina zincîreyî bi feyde be jî her ku lêkolerên Rêzimana Hilberîner xwestine rehendên watenasî, pragmatîk û morfo-sentaksê lê zêde bikin, hin pirsgirêk derketine. Ew van pirsgirêkan bi çar sernavan diyar dike: Morfolojî, FN û FD û têkiliyên rêzimanî, Çarçoveya wateyî û pragmatîk, Risteyên aloz.

Jihevcudakirina hêmanên leksîkal û yên gramatîk pirsgirêka sereke ya morfolojîk e. Hêmanên leksîkal û rêzimanî di heman asta hiyerarşîk de têr nîşandan, herwiha nîşandana klîtîkan (*clitics*)¹⁸, gireyên tewangê, îzafe, portmanto (*portmanteau*)¹⁹ û hww. problemeke din e. Riste ji aliyê wateyî û pragmatîk ve çiqas berfireh bibe jî cihêن morfemîk ên hêmanan eyîn dimîne an jî tengtir dibe.

Ji ber ku daçek bi tena serê xwe nayêن bikaranîn, hewce bi navdêran dîkin û têkiliya wan a bi navdêran re xurt e, derbarê wan de hin pirsgirêkên morfolojîk û sentaktîk hene. Givon (2001a: 116) ji zimanê îngilîzî, japonî û latînî mînakan dide; di mînaka zimanê îngilîzî de, “*The man gave a book to the boy*” (Zilam pirtûkek da [bi] lawikî), pêşdaçeka (*preposition*) “*to*”yê aîdî berkara nerasterast e û ew “*to the boy*” wekî fraza daçekî tê binavkirin. Lê di mînaka japonî “**Onna-ga otoko-ni tegami-o kaita**”²⁰ (Jinik-ê zilam-**DAT** name nivîsî) û ya latînî “**vir[Ø] puerō librum dedit**”²¹

¹⁸ Teşeyeke rêzimanî ye ku ne peyveke serbixwe ye ne jî gire ye. Klîtîk bi peyvekê ve dizeliqe û herdu hêman bi hev re têr bilêvkirin lê di asta sentaksê de ji hev cuda têr hesibandin (Brown û Miller, 2013: 81; Trask, 2007: 38). Trask ji bo zimanê îngilîzî van mînakan dide: ‘s, ‘ll, ‘m (*he’s/he’ll/I’m running*). Brown û Miller jî digel wan gireya îzafeyê (‘s)yê ji dike klîtîk (*he’s book*). Li gorî van pênase û mînakan em dikarin veqetandekên kurmancî têxin kategoriya klîtîkan (Haig, 2011; Haig û Öpengin, 2018).

¹⁹ Morfemeke serbixwe ye ku di eslê xwe de wateya du an jî zêdetir morfeman dihewîne. Bo nimûne, *mice* (pirjimariya peyva mişkê) bi vî awayî çêbûye: *mouse* (mişk) + pirjimarî. *Portmanteau* peyveke fransî ye, navê cureyekî çenteyan e ku saqo û bedilan dixinê (Brown û Miller, 2013: 349). Ferqa portmantoyê ji peyvên hevedudanî ev e ku peyva nû di formeke nû de ye, ne ku du peyv hatine cem hev (*Breakfast + Lunc > Brunch, Motor + Hotel > Motel*). Di kurmancî de gireya “-in”ê hem cînava kesandinê ye hem jî pirjimariyê diyar dike (*hatin*). Herwiha, {-an} hem rewşa tewangê hem jî pirjimariyê diyar dike (pirtûka hevalan). Delikaya (2023: 61) ji bo peyvên portmanto yêن kurmancî van mînakan dide: tirkmancî, sormancî, zazmancî.

²⁰ Jinikê ji zilêm re nameyek nivîsî.

²¹ Zilêm pirtûk da lawikî.

(zilam[Ø] lawik-**DAT** pirtûk-**ACC** da) de daçek wekî morfemên serbixwe nayêñ dîtin. Lewma, diyarkirin û binavkirina frazêñ bi daçekan, mijareke nezelalkirî ye.

Japonî:	Onna-ga	otoko- ni	tegami-o	kaita
Kurmancî:	Jinik-ê	zilam- DAT .	name	nivîsî
		“Jinikê ji zilêm re nameyek nivîsî.”		
Latînî:	vir[Ø]	puero	librum	dedit
Kurmancî:	zilam-î	lawik- DAT	pirtûk- ACC	da
		“Zilamî pirtûk da lawiki”		

Bi Rêzimana Hilberîner, zimannasan hêdî hêdî dev ji vê formalîzmê berdane ku di zimanekî diyarkirî de rastiyêñ morfolojîk û sentaktîk ên binyada rasteqîn dihatin nîşandan. Li şûna wê, êdî darêñ binyada frazî (*phrase structure trees*) bi awayê razber dest bi nîşandana binyadêñ hîzrî yên gerdûnî kirine. Bi vî awayî, ku formalîzm ji morfo-sentaksa rast hate rizgarkirin, peyrewêñ Rêzimana Hilberîner êdî azad bûn ku -bêyî bala xwe bidinê bê di eslê xwe de cihê wê ku der e- operatorêñ (*operator*) semantîk an jî pragmatîk di her asta hiyerarşîk/rêzê de di dara sentaksê de nîşan bidin. Lewma Givon çend mînakân dide û dibêje çi astengî tune ku zimannasek van mînakân ji aliyê semantîk ve nêz-wekhev in, bi sentakseke cêwî nîşan bide (Givon, 2001a: 116).

(3)

- a) **Ez dibêm qey** ew ê sibê were.
- b) **Mimkin e ku** ew sibê were.
- c) **Bi îhtîmaleke mezin** ew ê sibê were.
- d) **Dibe ku** ew sibê were.

Digel wê, êdî têgehêñ pragmatîk ên wekî *topic*²² û *focus*²³ bêyî ku diyardeyêñ morfo-sentaktîk li ber çavan bêñ girtin, dikarin di her asta hiyerarşiyê de bêñ nîşankirin. Wekî xala dawî, herçî dara sentaksê ji bo risteyêñ sade gelek bikêrhatî be jî, her ku riste aloz dibe, nîşandana wê ya bi dara sentaksê jî zehmettir dibe.

²² Perçeya riste an jî vegotinê ye ku diyar dike bê riste an jî vegotin derbarê çi de ye. Ji aliyê naveroka agahiyê ve riste ji *topic* (mijar) û *comment*ê (şirove) pêk tê, û ew beramberî “given” (dayî) “new”ê (nû) ne lê hin fonksiyonê rêzimanî ên *topic*ê jî hene (Brown û Miller, 2013: 445; Trask, 2007: 209). Bo nimûne: “Zozan nameyekê dinivîse.” Li vir bikera risteyê “Zozan” mijar e û nivîsandina nameyê jî şirove ye.

²³ Hilbijartina hêmaneke risteyê ye ji bo nîşandana agahiya nû ya herî giring. Fokûskirin bi avakeran û bi agahiya li wan barkirî re têkildar e. Pêşderxistineke wiha dikare xizmetî gelek armancan bike; pêşkêşkirina heyîn an jî pêşniyazeke nû, berawirdkirina heyînekê bi yeka din ve, lîstekirina berfireh [diyarkirina heyîneke taybet û ne yên din] (Brown û Miller, 2013: 174; Trask, 2007: 91).


1.2. Ji Perspektîva Teoriyan ve Fraz

Fraz ji yek an jî zêdetir peyvan pêk têr û yekeyên rêzimanî ne. Fraz, di nava risteyê de fonksiyoneke diyarkirî tînin cih û bi hêmanên din ên risteyê ve têkildar dîbin. Ji bo analîza binyadêr rêzimanî û sazkirina wateyê, cih, giringî û rola frazan a di nava risteyê de gelekî giring e. Di peyvrêziyê de fraz wekî perçeyên risteyê têr dîtin, pêkhateyên cuda ava dîkin û di diyarkirina wateyê de bi roleke giring radibin. Fraz di nava risteyê de dikarin wekî fraza navdêrî, fraza rengdêrî, fraza lêkerî, fraza hokerî û fraza daçekî cih bigirin û her yek ji wan di binyada risteyê de xwedî fonksyonên cuda ne.

Huddleston û yd. (2022: 53), sê pêsbîniyêr giring diyar dîkin ji bo meriv karibe baştır binyada fraz û risteyan têbigihê. Ya yekem “avaker” in ku dikarin ji peyvekê an jî ji peyvekê zêdetir bin (avakerek dikare avakeran bihewîne). Bi alîkariya avakeran em dikarin pêkhateyên risteyê diyar bikin. A duyem “kategorî” ye ku bi vî awayî em perçeyên/pêkhateyên risteyê li gorî cureyên wan disenifînin. A sêyem ku di gramerên klasîk de piranî bi ya duyem ve tê xelitandin, “fonksiyon” an jî rola rêzimanî ya van kategoriyyêr diyar in. Ji bo mijar bê fehmkirin vê mînakê didin: *Almost every pig loves acorns* (Hema [bêje] her beraz ji berûyan hez dike).

Ev riste ji du avakerên sereke pêk hatiye. Ya yekem “hema her beraz”, ya duyem “ji berûyan hez dike”. “Hema her beraz” jî ji du avakeran pêk hatiye: “hema” û “her beraz”; “ji berûyan hez dike” jî dîsa ji du hêmanan pêk hatiye: “ji berûyan” û “hez dike”. Axirî, riste ji avakeran pêk têr û avaker dikarin avakerên din bihewînin.

Her avakerek jî ji cureyekê ye ku em wan bi kategoriyan disenifînin. “Beraz” û “berû” navdêr in; “her” diyarker e (çendîker/*quantifier*); “hema” hoker e; “hez kirin” lêker e; “ji” daçek e. Li gorî wê, “hema her beraz” dibe fraza diyarker, “ji berûyan hez dike” jî dibe fraza lêkerî û “ji berûyan” jî fraza daçekî ye. Ango, di risteyê de her hêman/pêkhate aîdî kategoriyeke ye.



Şekl 1.10. Dara sentaksê ya fonksiyona (rola gramatîk) pêkhateyan.

Axirî di xala sêyem de, digel avaker û kategoriya avakeran em dibînên bê avaker bi çi fonksiyonê/rolê radibe. Di mînakê de “hema her beraz” bikera risteyê ye; li gorî hîpoteza fraza diyarkerê (*DP Hypothesis*) çendîkera “her”ê sereya fraza diyarkerê ye; fraza lêkerî “ji berûyan hez dike” pêvebera risteyê ye; lêkera “hezkirin”ê sereya fraza lêkerî ye; fraza daçekî “ji berûyan” berkara rasterast a fraza lêkerî ye; û wiha berdewam dike (Huddleston û yd., 2022: 57).

Bi vî awayî em dibînin ku fraz di nava binyada hiyerarşîk ya risteyê de wekî pêkhateyên sereke cih werdigirin û ji bo hêsinkirin û watedarkirina ragihandinê bi roleke giring radibin. Di encamê de fraz wekî yekeyên avaker radibin, fonksiyonên rêzimanî tînin cih, agahiyêne wateyî dikodînin (*coding*) û bi veguherînen sentaksî têkariyê li hevgiriya risteyê dikan.

Rêzimana Veguherînî-Hilberîner (*Transformational-Generative Grammar*), Teoriya X-Barê (*X-Bar Theory*), Teoriya Rêvebirin û Girêdanê (*Government and Binding Theory*) û Programa Mînîmalîst (*Minimalist Program*) çend teoriyên sereke yên peyvreziyê ne ku di navendê de fraz hene û fraz bi awayekî cuda lê bi hev ve têkildar têن vekolîn. Ji ber ku teoriyên zimannasiyê ji hev re bûne pêlik, gelekî zehmet e ku meriv ji bo her teoriyekê sînorên zexm xêz bike. Lewma, ji ber ku mijara me ya sereke fraz e, ne teoriyên zimannasiyê ye, em ê derbarê van teoriyan de kûr neçin lê em ê rol û fonksiyona frazan a di nava van teoriyan de berçav bikin.

1.2.1. Rêzimana Veguherînî-Hilberîner (Transformational-Generative Grammar)

Rêzimana Veguherînî-Hilberîner (*Transformational-Generative Grammar*, *TGG*) ku di nîveka sedsala 20em de ji aliyê Noam Chomsky ve hatiye kemilandin, hewl dide rêzik û qayîdeyên sereke yên ku di zimanekî de risteyan saz dikan, bi rêkûpêk bêñ eßkerekirin. Di Rêzimana Veguherînî-Hilberîner de fraz wekî binyadêñ hiyerarşik êñ bi avakerêñ peyvrêziyî sazkirî têñ qebûlkirin ku li derdora sereyeke navendî (*central head*) organîze bûne. Ev teorî, binyadêñ kûr û rûser pêşniyaz/ferz dike ku li gorî wê, ji bo teşeyêñ rûser yên cuda bêñ hilberandin divê bi kirariyêñ veguherînî temsîla peyvrêziyî ya kûr biguhere (Chomsky, 2002). Rêzimana Veguherînî-Hilberîner, ji bo hilberandina risteyêñ rêzimanî û analîza diyardeyêñ zimannasiyî, balê dikişîne ser rola rêzikêñ binyada frazê, rêzikêñ veguherînî û rêzikêñ gerdûnî.


Di Rêzimana Veguherînî-Hilberîner de fraz ji bo modelkirina (*modeling*) binyada peyvrêziyî ya risteyan bi roleke giring radibin û dibin bingeh ji bo hilberandin û veguherandina risteyêñ rêzimanî. Fonksiyon û rola frazan a di Rêzimana Veguherînî-Hilberîner de bi çend xalêñ sereke dikare berfirehî bê ravekirin: Binyada avaker (*constituent structure*), rêzikêñ binyada frazan (*phrase structure rules*), binyada kûr û binyada rûser (*deep structure and surface structure*), kirariyêñ veguherînî (*transformational operations*), rêzimaniyî û derbasdarî (*grammaticality and acceptability*).

1.2.2. Teoriya X-Barê (X-Bar Theory)

Teoriya X-Barê nûnertiya berfirehkirin û başkirina rêzikêñ binyada frazan ên di navâ Rêzimana Veguherînî-Hilberîner de dike û ji bo organîzasyona frazan a di navbera zimanâñ de şemayeke gerdunî (*universal scheme*) pêşniyaz dike. Li gorî Teoriya X-Barê, fraz binyadeke hiyerarşik nîşan dide ku ji pozîsyonêñ diyarkir (*specifier*), sere (*head*) û temamker (*complement*) pêk tê û her pozîsyon bi hêmaneke zimanî tê dagirtin. Ev teorî, rêzikêñ (*principle*) sereke yên ku binyada frazan bi rê ve dibin ên wekî: têkiliya sere û temamkerê, rêzika projeksiyonê (*projection*) û şemaya diyarker-sere-temamkerê derdixe pêş²⁴ (Chomsky, 1986: 3-4).

²⁴ Rêzbûna hêmanêñ di vê pêñaseyê de ji bo zimanê îngilîzî ye. Di zimanêñ din de dibe ku cihê hêmanan li gorî binyada sentaksî (SOV, SVO, ...) biguhere.

Di destpêkê de teşeya X-Barê di eslê xwe de ji bo projeksiyona kategoriyên leksîkal hatiye perisandin (bnr. Jackendoff 1977: 53) lê piştre, kategoriyên fonksiyonî yên wekî morfemên kişandine²⁵ (*inflectional morphemes*) yên lêkeran, diyarker (*determiners*) û gihanek (*conjunctions*) li nav projeksiyonên leksîkal wekî diyarkirê²⁶ (*specifiers*) wan hatine entegrekirin (Wilson û Keil, 2001: 898). Li ser vê rewşê û ji ber vê rewşê nîşandanên cuda peyda bûne. Bo nimûne, hin zimannas artîkila zimanê îngilîzî (*the*) wekî sere qebûl dikan û wextê ev artîkil bê pêşîya navdêrekê, wê frazê wekî fraza diyarker (FDk, *DP*) dihesibînin. Li gorî paratmetreyên (*parameters*) zimanê îngilîzî diyagrama X-Barê wiha ye:




Şekl 1.11. Li gorî Teoriya X-Barê diyagrama avaker.

Li vir, “X” sereyê nîşan dide, “XP” jî li gorî kategorîya leksîkal ya sereyê kategorîya frazê nîşan dide. Yanî, “X” navdêr be “XP” dibe “NP” (fraza navdêrî, FN). Têgeha “bar”ê ya di X-Barê de (X’), projeksiyona di navberê de nîşan dide. Ev projeksiyona di navbêrê de, derfetê dide me da ku frazên kompleks bi awayê hiyerarşiktir bên nîşandan. Derbarê prensib û rêzikên vê teoriyê de em ê di bin sernavê Rêzikên Binyada Frazan de agahiyê berfirehtir bidin lê em ê li vir jî çend mînakan bidin, ji ber ku divê haya me ji çend rêzikân hebe. Di Teoriya X-Barê de her fraz xwedî sereyekê ye. Di hin frazan de dibe ku diyarkir (*specifier*) hebe. Di zimanê îngilîzî de diyarkir berî sereyê tê. Di hin frazan de dibe ku temamker (*complement*) hebe. Di zimanê îngilîzî de temamker li dû sereyê tê û wextê temamker ji frazê bê derxistin, binyad û wateya frazê xera dibe. Di hin frazan de dibe ku pêkhateyên alîkar/veser

²⁵ Di nav kişandina peyvan de kategorîyeke zimannasiyê heye ku jê re dibêjin “Agreement” (rêkeftin, lihevkirin). Cureya kişandinê ye ku ji bo hemû peyvên wî zimanî bi heman awayî pêk tê. Hin cureyên kişandinê rêkeftinî yên di kurmancî de ev in: Zayend, hejmar, nasyarî/nenasyarî, cinavên kesandinê. Gündogdu (2011: 41) van rêkeftinan dike sê bêş: Biker-Pêveber, Berkar-Pêveber û Lihevkirina sifirê (*zero agreement*).

²⁶ Saniya Cebar Ebûzeyd di teza xwe ya doktorayê de ev têgeh bi kar anîye (Ebûzeyd, S. C., 2019: 14). 35

(*adjunct*) hebin.²⁷ *Adjunct*, argûmaneke (*argument*) opsîyonel e, dema meriv wê ji frazê derdixe, binyad û wateya frazê xera nabe. Teoriya X-Barê dibêje bi pêvajoya projeksiyonê, fraz bi awayê xwedubarekir dikare berfirehtir bibe. Di Teoriya X-Barê de temamker qîza “bar”ê, xwişka sereyê ye. Lê veser (*adjunct*) hem qîz hem jî xwişka “bar”ê ye.



Şekl 1.12. *The tall student of physics with red hair*.²⁸ (Carnie, 2020c)

Di şiklê li jor de fraza pêşdaçekî (*of pyhsics*) qîza “N-bar”ê û xwişka “N”yê, lewma ew temamker e û nabe ku ji frazê bê derxistin. Lê fraza pêşdaçekî ya din (*with red hair*) û fraza rengdêrî (*tall*) hem qîz hem jî xwişka “N-bar”ê ne. Yanî ev argûman dikarin neyên bikaranîn jî.

Diyagrama X-Barê ji bo zimanê îngilîzî gelekî zelalkirî be jî mixabin wextê mesele tê ser zimanê kurdî²⁹ ku di hemû diyalektên zimanê kurdî de gireyên fonksiyonel hene, nîşandana fraz û risteyên zimanê kurdî gelekî zehmet dibe. Gireyên fonksiyonî yên wekî ızafeyê û yên ku rehê lêkerê xera dikin astengiyên mezin derdixin pêş zimannasan. Lewma wextê me li lîteratûra kurmancî nihêrî, me dît ku di xebatê sentaksî de lêkoleran xwe ji nîşandan diyagramê dûr xistine û nîşandana bi kevaneka goşeyî “[]” tercîh kirine. Lewma em ê jî piranî vê rîyê bi kar bînin da ku di vê mijara nezelalkirî de em daneyên xelet peyda nekin.


²⁷ Peyva “veser”ê di fershengê de bi wateya “perçeyê lêzêdebûyî” hatiye pênasekirin (Farqînî, 2022: 2406). Di xebatê berî ya me de em ji bo vê tegehê rastî têgeheke kurmancî nehatin, lewma ji ber wateya wê, me ev peyv bi kar anî.

²⁸ Xwendekarâ/a bejndirêj ê/a fizikê yê/ya porsor (Xwendekara bejndirêj a fizikê ya porsor).

²⁹ Wekî zimanê kurdî, di gelek zimanên malbata Hînd-Ewropî ev taybetî têr dîtin.

1.2.3. Teoriya Rêvebirin û Girêdanê (*Government & Binding Theory*)

Teoriya Rêvebirin û Girêdanê (*Government and Binding Theory*) di salên 1980yî de ji aliyê Noam Chomsky ve hatiye avakirin. Bi vê teoriyê, hin rêzik û sînor hatine danîn ku pêwendîtî (*dependence*) û têkiliyên peyvrêziyî yên di risteyan de bi rê ve dibin. Di vê teoriyê de fraz li gorî têkiliyên birêvebirinê, prensîbêñ girêdanê û rolêñ teta (*theta roles*)³⁰ têñ analîzkirin ku temsîliyeta têkiliyên sentaktîk û semantîk a di navbera hêmanêñ zimanî de dîkin. Armanca teoriyê ev e ku, bi birêvebirina kategorîyan ve taybetmendiyên peyvrêziyî bêñ lîsanskirin (*licensing*)³¹, cînav û hêmanêñ vegerok (*reflexives*) bêñ girêdan û rolêñ tematîk bêñ tayînkirin. Teoriya Rêvebirin û Girêdanê dibêje qismeke zêde ya gramera zimanekî ji bo hemû zimanan hevpar e, lewma beşeke ji Rêzimana Gerdunî ye (Black, 1999: 2).



Şekl 1.13. Modela Teoriya Rêvebirin û Girêdanê. (Black, 1999: 2)

Teoriya Rêvebirin û Girêdanê modela dariştinî ya li jor pêşniyaz dike ku ev model bi çar astan ve tê temsîlkirin. Ferheng (*lexicon*), taybetmendiyên xweser yên hêmanêñ ferhengî (*lexical items*) temsîl dike ku yekîneyên atomîk (*atomic units*) ên peyvrêziyê pêk tînin. Ev taybetmendî nîşan didin bê hêmanêñ ferhengî ji bo kîjan argûmentan hatine binkategorîzekirin. Hêmanêñ ferhengî di binyada kûr (*D-structure*) de têñ kombînekirin. Binyada kûr di nav binyada rûser (*S-structure*) de tê yeksankirin (*mapping*) ku ev temsîla peyvrêziyî ya herî nêzîk a rêzbûna risteyê ye. Binyada rûser

³⁰ Theta role (θ -role), weke “Fonksiyona Semantîk” an jî “Rola Semantîk” jî tê zanîn. Teoriya *Thetayê* bala xwe dide têkiliyên fonksiyonî ên di navbera pêveber û argûmanên (*argument*) wê de. Bo nimûne: “Dîlanê bi mifteyê derî vekir.” Li vir “Dîlan” biker/faîl e (*agent*), “derî” berkar e (*patient*), “mifte” amûr e (*instrument*). Lê wextê em li vê mînakê binêrin: “Nameyek ji Dîlanê re hat.” Li vir “Dîlan” wergir e (*recipient*), “name” tema ye (*theme*).


³¹ Têgeheke zimannasiyê ye ku di demajoya sazkirinê de diyar dike bê kîjan hêmana ferhengî hewce bi kîjan kategoriya taybet, binyada avaker an jî rewşê ve heye an jî destûrê dide wan (Brown û Miller, 2013: 266).

rasterast û bi tena serê xwe nayê şirovekirin, di forma fonolojîk (*phonological form, PF*) û forma mentiqî (*logical form, LF*) de tê hesibandin. PF ew navrûya (*interface*) fonolojiyê ye ku şikl, deng û komkirina hêmanan rasterast tê temsîlkirin. LF jî navrûya semantîkê ye. Têkiliyên pêveberê û qada çendîker (*quantifiers*) û operatorên curbicur di binyada frazan a LFyê de bi eşkere tê temsîlkirin (Black, 1999: 2).

Teoriya Girêdanê bi têkiliyên referansî yên frazên navdêrî re mijûl dibe (Cook, 1988: 34) ku piranî di nav risteyeke sade an jî frazeke navdêrî de bi milkê deverî (*local domain*) an jî kategoriya rêvebirinê (*governing category*) tê binavkirin. Ango, teorî bi anaforan (*reflexives*), cînavan û navê taybet (*R-expressions*) re mijûl dibe û lê dinêre bê referansa wan, fraza navdêrî ya hundir e yan a derveyî milkê deverî ye (Kadarisman, 2009: 10). Teoriya Girêdanê ji sê prensîban pêk tê: a) Anaforek divê di nava kategoriya rêvebirinê ya xwe de girêdayî be. b) Cînavek divê di nava kategoriya rêvebirinê ya xwe de azad be. c) Navê taybet azad e (Chomsky, 1981: 188). Bo nimûne:

(4)

- a) [R [FN_i Susan] [FL [L loves] [FN_i herself]]]³²
- b) [R [FN Susan] [FL [L loves] [FN her]]]³³
- c) [R [FN She] [FL [L loves] [FN Susan]]]³⁴



Şekl 1.14. Prensibên Teoriya Girêdanê.


Di (4a)yê de biker “Susan” berkara “herself”ê girêdide (i) û herdu jî di bin hukmê risteyê (R) de ne, ango “R” wan bi rê ve dibe. Di (4b)yê de cînava “her” azad e, ne girêdayî bikerê ye. Di (4c)yê de navê taybet “Susan” azad e. Tê dîtin ku ev hersê

³² Susan ji xwe hez dike.

³³ Susan ji wê hez dike.

³⁴ Ew ji Susanê hez dike.

prensîb jî li zimanê îngilîzî tê³⁵ lê wextê mijar dibe zimanekî din dibe ku hin prensîb nexebitin. Kadarisman (2009: 11) mînaka zimanê endonezî dide ku di vê mînakê de prensîba anaforê naxebite:



Şekl 1.15. Prensîba girêdana anaforê ji bo zimanê endonezî. *Kakak Adi memuji dirinya*.³⁶

Kadarisman dibêje, em dibînin ku di mînaka endonezî de, di fraza navdêrî de rewşa xweyîtiyê (*possessive*) tune, lewma digel ku em dizanin anafor li “*kakak Adi*” vedigere, anafor dikare li “*Adi*” jî vegere. Di kurmancî de, wextê modîfiyeker neyê tewandin em rastî heman rewşê tê. Bo nimûne: 1. Xalê Mihemed xwe avêt erdê. 2. Xalê Mihemedî xwe avêt erdê. Di mînaka yekem de anafor “*xwe*” li “*Mihemed*” vedigere (Mihemed bi xwe xal e) lê di mînaka duyem de ji ber ku di fraza navdêrî de rewşa xweyîtiyê çêbûye, anafor li “*Xalê Mihemedî*” vedigere.

Teoriya Rêvebirin û Girêdanê ji bo avakirina Programa Mînîmalîst (*Minimalist Program*) bûye pêlîkeke saxlem. Lasnik û Lohndal (2010: 40) dibêjin Programa Mînîmalîst li ser bingeha serkeftinên Teoriya Rêvebirin û Girêdanê hatiye avakirin û rasyonelîzekirin.

1.2.4. Programa Mînîmalîst (*Minimalist Program*)

Wextê sal dibe 1993, Noam Chomsky bi navê *A minimalist program for linguistic theory* (Programeke mînîmalîst ji bo teoriya zimannasiyê) nivîsarekê diweşîne û piştre jî di sala 1995ê de pirtûka xwe ya bi navê *The Minimalist Program* diweşîne. Ev programa mînîmalîst heta îroroj jî rê li ber Rêzimana Gerdûnî (*Universal Grammar*) vedike û jê re dibe pêşeng (Sebzecioğlu, 2010: 97).

³⁵ Riste çiqas kompleks jî be hersê prensîb di zimanê îngilîzî de dixebeitin. Bo nimûne: [R [FN [FN [FN [FN [FN [N Susan]] [Poss 's]] [N father]]][Poss 's]] [Ni uncle]] [FL [L loves] [FNi himself]]].

³⁶ Bira Adi diecibîne xwe (Birayê Adiyî xwe diecibîne).

Programma Mînîmalîst ne ku tenê dixwaze xwe bigihîne ravekirina taybetmendiyên şiyana zimên, digel wê, dixwaze rave bike bê çîma hin taybetmendiyên wê wiha tevdigerin (Lasnik û Lohndal, 2010: 40). Di encamê de, tevî Teoriya Prensîb û Parametreyan (*Principles and Parameters Theory*)³⁷, ev teoriyên me behskirî rê li ber Rêzimana Gerdûnî (*Universal Grammar, UG*) vekirine û ew ava kirine.

Programma Mînîmalîst li ser bingeha “prensîba ekonomiyê” (*the economy principle*) dixebite. Ekonomiya zimên jî kategoriyeke gerdûnî ye ku di siruştâ hemû zimanên dinyayê de heye, ew ji bo daxwaza jêdûrketina ji lêçûnên/mesrefenê zêde yên derûnî û fîzîkî tê binavkirin ku di hilberandina axaftinê û hemû astên pergala zimên de xwe dide der (Zhurkenovich û yd., 2021: 424). Digel ku Programma Mînîmalîst ji teoriyên berî xwe zêde ne cuda be jî ew berê xwe dide vê pirsiyarê bê çawa dê têkilî di navbera deng û wateyê de bê danîn (Zwart, 1998: 215).

1.2.5. Hevparî û Cudahiyêن van Teoriyan

Di navbera van teoriyên peyvrêziyê de ku ji bo giringiya rol û fonksiyona frazan derdikevin pêş, hin hevparî û hin cudahî hene. Çend xal û rîzikên hevpar ev in:

1. Binyada Avaker (*Constituent Structure*): Herçar teorî jî frazan di nava risteyê de, wek pêkhateyên sereke yên li derdora sereyeke navendî organîzekirî pênase dikan.
2. Organîzasyona Hiyerarşîk (*Hierarchical Organization*): Bi awayekî xwedubarekir, bicihkirina pêkhateyên biçüktir di nava pêkhateyên berfirehtir de, fraz pergaleke hîyerarşîk nîşan dide ku siruştâ xwedubarekir a zimên dieynîne.
3. Kategoriyyen Peyvrêziyî (*Syntactic Categories*): Fraz bi kategoriyyen sentaktîk ên spesîfik ve têن têkildarkirin ku her yek ji wan xwedî taybetmendî û mîhengên cihê ne.
4. Pevgirêdaniya Binyadî (*Structural Dependencies*): Fraz, di nava risteyan de li gorî rîzikên binyada frazan û yên birêvebirin û girêdanê, besdarî têkilî û pevgirêdaniyên binyadî dibin.

³⁷ Li gorî teoriyê, prensîb (*principle*) ji bo hemû zimanên dinyayê derbasdar in lê parametre (*parameters*) li gorî taybetmendiyên her zimanî xweser in.

Digel van hevpariyan, di navbera Rêzimana Veguherînî-Hilberîner, Teoriya X-Barê, Teoriya Rêvebirin û Girêdanê û Programa Mînîmalîst de hin cudahiyê berçav jî hene:

1. Kirariyên Veguherînî (*Transformational Operations*): Ligel ku Rêzimana Veguherînî-Hilberîner balê dikişîne ser rola kirariyên veguherînî ku ji binyadêñ kûr binyadêñ rûser yên cuda tên hilberandin, Teoriya X-Barê û Teoriya Rêvebirin û Girêdanê berên xwe didin taybetmendî û organîzasyona hundirîn a frazan.
2. Teoriya Girêdanê (*Binding Theory*): Teoriya Rêvebirin û Girêdanê ji bo lêbelaviya cînav û vegekan û şirovekirina wan prensîbêñ girêkir pêşkêş dike ku ev mijar neketiye rojeva Teoriya X-Barê û Teoriya Veguherînî-Hilberîner.
3. Têkiliyên Rêvebirinê (*Government Relations*): Ligel ku Teoriya Rêvebirin û Girêdanê balê dikişîne ser têkiliyên rêvebirinê yên di navbera hêmanêñ peyvrêziyî de, Rêzimana Veguherînî-Hilberîner û Teoriya X-Barê berê xwe zêdetir dide taybetmendiyêñ binyadî û organîzasyona hiyerarşik a frazan.
4. Prensîba Ekonomiyê (*Principle of Economy*): Programa Mînîmalîst hewl dide rave bike bê binyadêñ zimêñ bi awayê herî sade çawa dikare bêñ avakirin. Lewma Programa Mînîmalîst xwe ji parametreyan dûr dixe û hewl dide bi qayîdeyêñ gerdûnî curbicuriya di zimêñ de rave bike.

Axirî, vekolîna frazan di nav teoriyên zimannasiyî yên wekî Teoriya Veguherînî-Hilberîner, Teoriya X-Barê, Teoriya Rêvebirin û Girêdanê û Programa Mînîmalîst de, derbarê organîzasyon, binyad û şirovekirina risteyêñ zimanê siruştî de ferasetê dide peydakirin. Ev teorî ligel ku derbarê binyad û analîza sentaktîk a frazan de rêzik û prensîbêñ hevpar nîşan didin, derbarê kirariyên veguherînî, diyardeyêñ bestinê û têkiliyên desthilatdariyê de xwedî layenêrînê cuda ne. Vekolîna frazan ji aliyê van teoriyan ve, dike ku em bi awayekî kûrtir prensibêñ sereke yên binyada peyvrêziyî û temsîla zimêñ têbigihêñ.

1.2.6. Binyada Avaker (*Constituent Structure*)

Carnie (2010) li ser binyada avaker berhemekê serbixwe bi navê *Constituent Structure* amade kiriye. Di vê berhemê de fonksiyon û rola frazan a avakeriyê gelek

zelal hatiye ravekirin. Herwiha, Tallerman (2015) di berhema xwe *Understanding Syntaxê* (Famkirina Peyvrêziyê) de bi gelek nimûneyan ev mijar zelal kiriye. Lewma derbarê vê fonksiyonê de em ê gelek sûd ji van berheman wergirin. Hêmanên avaker ji bo diyarkirina hiyerarşiyê gelekî giring in, lewma binyada avakerî jî di nava pergala hiyerarşik a sentaksê de têkiliya perçeyên cuda ên risteyê saz dike. Bi vî awayî diyar dibe bê kîjan morfem/peyv/fraz nêzî hev in, kîjan dûrî hev in, kîjan dikarin bêc cem hev, kîjan nikarin... Ji bo tesbîtkirina wan jî hin testê avakeriyê (*constituency tests*) hene. Carnie (2010: 18), behsa van testan dike, dibêje ji bo avakerî bê testkirin gelek diyardeyên standart hene, lê ew di xebata xwe de çend hebêne sereke pêşkêş dike. Herwiha, diyar dike ku ji van testan jî gelek caran encamên xelet û nehevgirtî derdikevin.

1.2.6.1. Testê Avakeriyê (*Constituency Tests*)

1.2.6.1.1. Testa Beşa Risteyê (*The Sentence Fragment Test*)

Testa herî besît ya avakeriyê ew e ku, peyv an jî komepeyv wekî perçeyeke risteyê (bersiva pirsekê) dikare bisekine yan na. Navê vê testê Testa Beşa Risteyê ye (*The Sentence Fragment Test*). *Sentence Fragment* têgeheke zimannasiyê ye ku wiha tê pênasekirin: Di metnên nivîskî de sekansên (*sequences*) peyv û frazan e ku ne temamê risteyê ne lê dikarin bi tena serê xwe jî bisekinin (Brown û Miller, 2013: 401). Bo nimûne (Carnie, 2010: 18) em li risteya jêr binêrin:

(5) Bruce hez dike li restorantên bi rastî jî lûks, xwarinê bixwe.³⁸

(6)

- a) li restorantên bi rastî jî lûks, xwarinê bixwe (avaker e)
- b) *bi rastî jî lûks, xwarinê bixwe (ne avaker e)

Wextê em pirsa “Bruce hez dike çi bike?” dipirsin, (6a) dibe bersiveke temam lê (6b) nabe, kêm dixuyê, lewma (6a) perçeyeke serbixwe ya risteyê ye û ji ber ku sere lêker e, em wê wekî fraza lêkerî etîket dikan.

Testeke din a binyada avakeriyê, derxistin an jî jêbirin e. Wextê meriv perçeyeke risteyê ji risteyê derxe an jî jê bibe jî dîsa di destê me de risteyeke biwate bimîne, wê çaxê em dikarin bêjin ku perçeyê derxistî avaker e.

³⁸ Bruce loves to eat at really fancy restaurants.

(7)

- a) bi rastî jî lûks (avaker e)
- b) *restorantên bi rastî jî (ne avaker e)

(8)

- a) Bruce hez dike li restorantan xwarinê bixwe.
- b) *Bruce hez dike li lûks, xwarinê bixwe.

Xuya dibe ku em (7a)yê ji risteyê derxin dîsa jî di destêne me de risteyeke biwate (8a) dimîne. Lê dema ku em (7b)yê ji risteyê derxin tiştekî ecêb dimîne. Lewma em dikarin bêjin ku (7a) avaker e, fraz e, perçeyeke serbixwe ya risteyê ye. Lê divê bê zanîn ku meriv nikare hemû avakeran ji risteyê derxîne. Bo nimûne, fraza lêkerî ku me di (6a)yê de wekî avaker diyar kiribû (li restorantên bi rastî jî lûks, xwarinê bixwe), nabe ku ji risteyê bê derxistin.

(9) *Bruce hez dike.

Carnie (2010: 19) dibêje bi îhtîmaleke mezin ji ber ku hin tiştên alîkar pêwîst in wiha dibe. Weku di vê mînakê de tê dîtin, ji ber ku “hezkirin” hewce bi pêvebereke karî (*verbal predicate*) dike an jî ji ber ku binyad bêwate ye.

Tallerman (2015, 153-155) ji bo vê testê balê dikişîne ser vê rewşê ku avaker dikare di nava avaker de cih bigire. Ew rewş, pirîcaran di guhdarkirinê de dibe problem. Tallerman, ji bo mijarê zelal bike vê mînakê dide:

(10) *The boy and the girl's uncle stayed to dinner.*³⁹

Di vê minaka zimanê îngilîzî de meriv dikarê du pirsan bipirse: Kî ji bo şivê maye? Apê kê ji bo şivê maye? Li gorî van pirsan jî em dikarin van bersivên jêr bidin:

(11)

- a) *The boy and the girl's.*⁴⁰ (kesek ji bo şivê dimîne)
- b) *The girl's.*⁴¹ (du kes ji bo şivê dimînin⁴²)

Tê dîtin ku heger em pirsa ewil bikin, *Who stayed to dinner?* (Kî ji bo şivê maye?); bersiv *The boy and the girl's uncle* (Apê lawik û keçikê) ye. Lewma ev fraz

³⁹ Apê/n lawik û keçikê ji bo şivê maye/mane.

⁴⁰ È lawik û keçikê.

⁴¹ È keçikê.

⁴² Lawik û apê keçikê.

avaker e, û di nav xwe de jî frazêñ avaker dihewîne. Lê, heger wextê riste baş neyê bihîstin, kesek dikare vê pirsê jî bipirse: *Whose uncle stayed to dinner?* (Apê kê ji bo şîvê maye?). Wê çaxê jî li gorî têgihiştinê bersiv dikare (11a) be jî (11b) be jî.

Lê wextê em vê risteyê li kurmancî bînin, em dibînin ku bi alîkariya veqetandekan û kişandina lêkerê ve ev problem ji holê radibe. Lê dîsa jî em dizanin ku di axaftinê/bilêvkirinê de, ketina dengan di kurmancî de pêk tê.⁴³

Testa beşa risteyê bi me dide zanîn ku du risteyên ku dişibin hev, dibe ku xwedî binyadêñ cuda bin. Bo nimûne ev herdu mînakêñ li jêr ji hêmanêñ di heman kategoriyê de û bi heman rêzê ve pêk hatibin jî di eslê xwe binyada wan cuda ye (Tallerman, 2015: 154).

(12)

- a) Zozanê ev pirtûka bi bergê şîn nivîsî.
- b) Zozanê ev pirtûk bi meaşê pêşîn kirî.⁴⁴
- c) N Dk N D N R L

Helbet axiverê niştecih çawa ku van risteyan bibihîze, dê zanibe ku ev herdu riste ji hev cuda ne. Di (12a)yê de “bi bergê şîn” fraza daçekî ye (FD) û sereya “pirtûk”ê modîfiye dike: “pîrtûkeke bi bergê şîn” cureyeke pirtûkan e. Lewra “ev pirtûka bi bergê şîn” avaker e. Lê di risteya (12b)yê de “bi meaşê pêşîn” ji bo me diyar dike bê wê çawa/bi çi pirtûk kiriye û tu têkiliya wê bi “pirtûk”ê re tune ye. Lewra fraza daçekî “bi meaşê ewil” lêkerê (kirîn) modîfiye dike û opsiyonel e (*adjunct*⁴⁵). Lewma, di testa beşa risteyê de ji bo her pirsekê, em ê ji bo bersivê besen risteyê ên cuda bibînin.

(13)

- a) Wê çi nivîsî? [ev pirtûka bi bergê şîn]
- b) Wê çi kirî? [ev pirtûk]
- c) Wê çi kirî? *ev pirtûk bi meaşê pêşîn.

⁴³ Ji bo zêdetir zanyariyan bnr. Prjimarî di Kurmancî de (Açar, 2023)

⁴⁴ Di kurmancî de berkara nerasterast dikare bê pêşıya berkerâ rasterast jî (Zozanê bi meaşê pêşîn ev pirtûk kirî).

⁴⁵ Ew pêkhate ne ku di risteyê de ji bo pêveberê, modîfiyerên opsiyonel in, ango meriv dikare wan ji risteyê derxe jî (Brown û Miller, 2013: 12)

Heta vir, me ji testa beşa risteyê fahm kir ku pirsa ku dê bê pirsîn divê rêzimanî be, ango test bersiv bixwe ye. Heger hin peyvên rêzî an jî fraz dikarin bibin perçeyeke rêzimanî wê gavê bi ihtiâmaleke mezin ew perçe pêkhateyeke avaker a risteyê ye. Heger berevajî wê be, bi ihtiâmaleke mezin ew perçe ne pêkhateyeke avaker e lê divê hin testê din jî bêñ kîrin (Tallerman, 2015: 155).

1.2.6.1.2. Pirsên Dengvedanê (*Echo Questions*)

Testeke din a bikêrhatî Pirsên Dengvedanê (*Echo Questions*) ye. Bi taybet, di zimanê axaftinê de derbirîneke axiver bi binyada pirsînê ve tê dubarekîn. Di zimanê îngilîzî de ji bo avakirina binayada pirsê, katogerîyeke peyvan bi navê *wh-words* heye “*what, which, who, when, why, where, how*” (Brown û Miller, 2013: 147; Tallerman, 2015: 155-6). Ji bo kurmancî jî em dikarin van peyvên pirsînê diyar bikin: Çi, kî, kê, kîjan, kengî, çima, çawa, ku û varyantên wan. Bi van pirsan, meriv dikare bike ku ew beşa em dixwazin bê dubarekîn, bi axiver bide dubarekîn. Bersiva pirsê ne çawalêhato ye, bersiv dibe avakereke risteyê.

(14)

- a) *Zozanê **çi** bi bergê şîn nivîsî?
- b) Zozanê **çi** bi measê pêşîn kirî?

Di mînaka (14a)yê de ji ber ku “ev pirtûk” aîdî perçeyeke jê mezintir e (ev pirtûka bi bergê şîn), nabe bersiva “Çi?”yê. Lê di mînaka (14b)yê de bersiva pirsê “ev pirtûk” dikare bi tena serê xwe bisekine, lewma em dibêjin ew avakereke serbixwe ye.

1.2.6.1.3. Hevokêñ Veqetandî (*Cleft Sentences*)

Testeke din ji bo diyarkirina avakeran ew e ku di risteyên aloz de meriv dikare wê bisepîne. *Cleft Construction* an jî *Cleft Sentences*⁴⁶ çend derfetan dide ku meriv karîbe bi guhertina binyada risteyê, perçeyên risteyê yên serbixwe yên avaker diyar bike. Di zimanê îngilîzî de ev test bi çend awayêñ cûda pêk tê lê yên sereke ev in: *it-cleft, wh-cleft, reverse-wh-cleft* (Brown û Miller, 2013: 79).

⁴⁶ Bi navê “*Ayrık Tümceler*” ketiye zimanê tirkî. Herçi li vir bi peyva “*sentece*”ê hatibe nîşandan jî ji ber ku perçeyê risteya sereke ye, ji bo kurmancî meriv dikare bibêje “Hevokêñ Veqetandî”.

Di rêbaza “*it-cleft*”ê de, ji bilî pêveberê her perçeyeke risteyê dikarê bê pêşxistin û fokûskirin. Perçeyê avaker ê fokûskirî bi kopûlayê⁴⁷ ve tê girêdan. Perçeyê din jî dibe hevoka peywendiyê (*relative clause*⁴⁸). Di zimanê îngilîzî de ev qalib wiha çêdibe: “*It is [...] that ...*”. Heger em vî qalibî ji bo kurmancî saz bikin, minakên li jêr derdikevin pêşberî me: “*Ew [...] e ku ...*”.

(15)

- a) **(Ew)** [ev pirtûka bi berga şîn] **bû** ku Zozanê nivîsî.
- b) *(Ew) ev pirtûk bi meaşê pêşîn **bû** ku Zozanê kirî.
- c) **(Ew)** [ev pirtûk] **bû** ku Zozanê bi meaşê pêşîn kirî.
- d) **(Ew)** [bi meaşê pêşîn] **bû** ku Zozanê ev pirtûk kirî.

(16)

- a) Patronê min hefteya borî e-poste şand.⁴⁹
- b) **(Ew)** [e-poste] **bû** ku hefteya borî patronê min şand.
- c) **(Ew)** [hefteya borî] **bû** ku patronê min e-poste şand.

Dema em li mînakan dînihêrin, em dibînin ku qalibê zimanê îngilîzî rasterast li kurmancî nayê. Lewra ji bo kurmancî em dikarin “*it*”ê (ew) bi kar neyînin. Anglo em dikarin vî qalîbî bi kar bînin: “... *is that ...*”, “... *e ku ...*”. Bi vî awayî, bi vê metodê ew perçeyê ku li pêşîya kopûlayê dimîne, perçeyeke serbixwe ye, frazeke avaker e.

Di zimanê îngilîzî de *wh-clefts*, hevokek peywendiyê ya azad, kopûlayekê û frazeke navdêrî an jî frazeke lêkerî dihewînin. *Wh-clefts* ji binxêzkirina beşeke nîqaşê û ji bo derbasbûna beşa din tê bikaranîn. Fonskiyona duyem ji bo destpêkirina mijarekê ye (Brown û Miller, 2013: 79).

⁴⁷ Hêmaneke taybet a rêzimanî ye ku (piranî lêker e) ji bo derbirîna nasnameyê an jî endamtiya komekê tê bikaranîn. Di zimanê îngilîzî de kopûla (*copula*) “*be*” ye û xwedî du fonksiyonan e. Erka yekem, wekhevirkirina du tiştan e ku di bîrkariyê de heye: Jûpîter rojgerana herî mezin e di sîstema roja me de. Erka duyem, pênasekirin/ravekirina tiştekî ye ku ew piranî biker e: Zozan keçeke biaqil e. Zozan xemgîn e (Trask, 207: 59). Di kurmancî de kopûla “*bûn*” e. Li gorî deman û cînavan teşeya kopûlaya kurmancî diguhere. Dema niha: me/im, i/yî, e/ye, ne/in. Dema borî: bûm, bûyî, bû, bûn.

⁴⁸ Herçi wekî “risteya peywendiyê” tê bikaranîn jî ji ber ku perçeyê risteyê ye, meriv jê re bêje “hevoka peywendiyê” dê baştır be. Givon (2001b: 175) ji bo hevokên peywendiyê dibêje: “Modîfiyekerên bi qebareyê hevokê yêñ di nava fraza navdêrî de”. Meriv ji vê pênaseyê fahm dike ku navdêra frazê dibe sereya hevoka peywendiyê.

⁴⁹ *My boss sent the e-mail last week* (Brown û Miller, 2013: 79).

(17)

- a) *What my boss sent last week was [the e-mail].*
- b) Tişta (ku) patronê min hefteya borî şand [e-poste] **bû.**
- c) *When my boss sent the e-mail was [last week].*
- d) Dema (ku) patronê min e-poste şand [hefteya borî] **bû.**
- e) *What I'am going to eat for dinner is [meat].*
- f) Tiştê (ku) ez ê ji bo şivê bixwim [goşt] **e.**

Tê dîtin ku ev qalib jî rasterast li kurmancî nayê, li şûna qalibên “*wh*” ên îngilîzî, peyvîn din ên kurmancî beşdarî risteyê dibin (tişt, dem, wext, cih, a, ê, ên û ww.).⁵⁰ Herweha, li şûna peyva “tişt”ê em dikarin varyantên diyarkerên “ev, ew”ê, “eve, eva, ewe, ewa”yê jî bi kar bînin (Eva/Ewa [ku] patronê min hefteya borî şand e-poste bû). Herweha rêza hêmanên îngilîzî jî lê nayê (hevokek peywendiyê ya azad, kopûlayek û frazeke navdêrî an jî frazeke lêkerî). E dibînin ku di kurmancî de kopûla tê dawiya risteyê.

Reverse-wh-cleft heman avakerên *c-left* dihewîne lê bi awayê berevajî: frazek, kopûlayek û hevokeke peywendiyê ya azad. Heger em vê bi vê rîbazê risteyêne xwe yên kurmancî saz bikin encama li jêr derdikeve:

(18)

- a) *[The e-mail] was what my boss sent last week.*
- b) *[E-poste] bû tişta (ku) patronê min hefteya borî şand.*
- c) *[Last week] was when my boss sent the e-mail.*
- d) *[Hefteya borî] bû dema (ku) patronê min e-poste şand.*
- e) *[Meat] is what I'am going to eat for dinner.*
- f) *[Goşt] e tiştê/ewê/yê (ku) ez ê ji bo şivê bixwim.*

Em dibînin ku reverse-wh-cleft bi heman rîzkirina rîbaza zimanê îngilîzî ji bo kurmancî jî derbasdar e. Lê ligel ku zimanê îngilîzî vê testê (*wh-cleft, reverse-wh-cleft*)

⁵⁰ Ev hêman di eslê xwe de cînavêne peywendiyê ne (*relative pronouns*). Ji bo danasîna hevokên peywendiyê tên bikaranîn. Ji bo tiştan “*which, that*”, ji bo kesan “*who, whom*” (*who* ji bo biker, *whom* ji bo berkar). Di kurmancî “a, ê, ên” cînavêne peywendiyê ne. Ji ber ku anaforîk in, yanî li navdêr an jî frazeke navdêrî vedigerin, hersê cînav jî nasyar in. “a” mî û yekjimar, “ê” nîr û yekjimar û “ên” pirjimar e. Peyvîn din (tişt, wext, dem) bi ızafeyê bi hevoka peywendiyê ve tê girêdan (tiştê ku, dema ku, wextê ku).

bi peyvên pirskirinê (*wh words*) çêdike, di kurmancî de hêmanên ku têbikaranîn cuda ne, ne peyvên pirskirinê ne.

Axirî, ev hemû test û encamên wan, taybetmendiyek giring a zimanê însên nîşan didin; şiyana barkirin (*move*) an jî cihguhertina (*displace*) frazekê ji cihê wê yê eslî. Herçend, ev perçeyê avaker bi awayê fizîkî (sentaktîk û bihîzbarî) li cihêna cuda derkeve hemberî axiverên niştecih, ew ji aliyê wateyî ve dizanin bê cihê wê yê resen ku der e (Tallerman, 2015: 158).

(19)

- a) [FN Ev pirtûk] bû ku Zozanê ... bi measê pêşîn kirî.
- b) [FD Bi measê pêşîn] bû ku Zozanê ev pirtûk ... kirî.

Di risteyêni li jor de cihêna vala cihêna resen ên frazan nîşan didin ku hatine cihguhertin. Axiverên niştecih çawa ku van risteyan bibihîzin dê demildest pê derxin ku di risteyê de barkirin an jî cihguhertin çêbûye. Ev hemû testêni ku me behs bi wan kirin, bi alîkariya pêhesînên (*intuition*) axiverên niştecih dixebeitin. Bi axiveran re hebûna “darazên gramatîk” -pêhesînên ku dizanin kîjan riste mimkin e kîjan ne mimkin e- nîşanî me dide ku em derbarê frazkirina peyvên di risteyê de xwedî agahiyêne bêbîr/bêşîûr (*unconscious knowledge*) in. Testêni ji bo binyadêni avaker têbikiran, hawirdorêni sentaktîk in ku tenê dikare ji aliyê avakeran ve bêne dagirtin. Wextê hûn hin rêzepeyvên ku ne avaker in têxin van hawirdoran, encam dê ji bo axiverê niştecih bêwate be (Tallerman, 2015: 158).

1.2.7. Rêzikên Binyada Frazan (*Phrase Structure Rules*)

Rêzikên Binyada Frazan (*Phrase Structure Rules/Grammars, PSRs/PSGs*)⁵¹ koma rêzikan e ku bi van rêzikan yekeyên binyadî (fraz û riste) yên zimanekî têbikiran. Bingeha van rêzikan ji aliyê peyrewêne Bloomfeild ve, bi awayê çalak jî di nava deh salêni di navbera weşana Wells (1947) û analîzêne veguherînî yên Harris (1957) û Chomsky (1957) de hatiye danîn (Blevins û Sag, 2013: 202). Ev rêzik pênase dikin bê peyv çawa û di kîjan rêzê de têbikiran cem hev û komikan ava dikin. Rêzikên Binyada Frazan amûrek e ku ji bo modelkirina (*modeling*) binyada sentaktîk a

⁵¹ Wekî “*Phrase Structure Grammars*” jî têbikaranîn (Carnie, 2010: 71).

zimanekî tê bikaranîn û çarçoveyekê ji binyada fraz û risteyan re xêz dike (Chomsky, 1957: 26; Carnie, 2010: 71-2). Ango, avabûna fraz û risteyên zimanekî tê formûlekirin.

(20)

- a) $S \rightarrow NP + VP$
- b) $NP \rightarrow D + N$
- c) $VP \rightarrow Verb + NP$

Chomsky di sala 1957ê de ji bo binyada risteyên zimanê îngilîzî ev rêzik (20a-c) diyar kiribûn. Riste (*Sentence*, *S*) ji fraza navdêrî (*Noun Phrase*, *NP*) û fraza lêkerî (*Verb Phrase*, *VP*) pêk tê. Fraza navdêrî ji diyarker (*Determiner*, *D*) û navdêrê (*Noun*, *N*) pêk tê. Fraza lêkerî jî ji lêker (*Verb*, *V*) û fraza navdêrî pêk tê. Chomsky ji bo vê formûla sade mînaka li jêr dide (1957: 26-7):

Sentence

<i>NP + VP</i>	(i)
<i>T + N + VP</i>	(ii)
<i>T + N + Verb + NP</i>	(iii)
<i>the + N + Verb + NP</i>	(iv)
<i>the + man + Verb + NP</i>	(v)
<i>the + man + hit + NP</i>	(vi)
<i>the + man + hit + T + N</i>	(ii)
<i>the + man + hit + the + N</i>	(iv)
<i>the + man + hit + the + ball</i>	(v)

Şekl 1.16. Verêşîna rêzikên binyada risteya zimanê îngilîzî.⁵²

Piştre, her ku xebatêن zimannasiyê berfirehtir bûn û teoriyên sentaksê kemilîn, formûl jî hatin nûkirin û hêmanêن din jî li formûlan zêde bûn. Carnie (2010: 76-7) ji bo zimanê îngilîzî bi van formûlêن jêr vê mînakê dide: *A burglar shot the man with a gun.*⁵³

⁵² Zilêm li gogê xist.

⁵³ “Dizekî, bi çekê berda zilêm” an jî “Dizekî berda zilamê biçek”.


(21)

- a) $S \rightarrow NP\ VP$
- b) $NP \rightarrow D\ N$
- c) $NP \rightarrow D\ N\ PP$
- d) $VP \rightarrow V\ NP$
- e) $VP \rightarrow V\ NP\ PP$
- f) $PP \rightarrow P\ NP$
- g) $D \rightarrow \text{the, a}$
- h) $N \rightarrow \text{man, burglar, gun, } \hat{u} \text{ hww.}$
- i) $V \rightarrow \text{shot, took, } \hat{u} \text{ hww.}$
- j) $P \rightarrow \text{with, in, } \hat{u} \text{ hww.}$

(22)

- (i) S
- (ii) NP VP (a)
- (iii) D N VP (b)
- (iv) A N VP (g)
- (v) A burglar VP (h)
- (vi) A burglar V NP PP (e)
- (vii) A burglar shot NP PP (i)
- (viii) A burglar shot D N PP (b)
- (ix) A burglar shot the N PP (g)
- (x) A burglar shot the man PP (h)
- (xi) A burglar shot the man P NP (f)
- (xii) A burglar shot the man with NP (j)
- (xiii) A burglar shot the man with D N (b)
- (xiv) A burglar shot the man with a N (g)
- (xv) A burglar shot the man with a gun (h)

Li gorî vê (22) formûlê wateya “Dizekî, bi çekê berda zilêm” derdikeve \hat{u} nîşandana wê ya bi diyagramê jî li jêr e (Carnie, 2010: 77):




Şekl 1.17. Dara sentaksê ya "A burglar shot the man with a gun" (Dizekî, bi çekê berda zilêm).

Ji ber ku em ê di beşa duyem de li ser mînakên kurmancî bisekinîn, û em naxwazin li vir mînakên du zimanan bidin ber hev, ku armanc têgihiştina xebitîna rêzikîn binyada frazan e, em ê mînaka din ya Carnie jî bidin da ku xuya bibe bê ev rêzik çawa bandorê li avaniya zimên dike.

(23)

- (i) S
 - (ii) NP VP
 - (iii) D N VP
 - (iv) A N VP
 - (v) A burglar VP
 - (vi) A burglar V NP
 - (vii) A burglar shot NP
 - (viii) A burglar shot D N PP
 - (ix) A burglar shot the N PP
 - (x) A burglar shot the man PP
 - (xi) A burglar shot the man P NP
 - (xii) A burglar shot the man with NP
 - (xiii) A burglar shot the man with D N
 - (xiv) A burglar shot the man with a N
 - (xv) A burglar shot the man with a gun
- | |
|-----|
| (a) |
| (b) |
| (g) |
| (h) |
| (e) |
| (i) |
| (b) |
| (g) |
| (h) |
| (f) |
| (j) |
| (b) |
| (g) |
| (h) |

Cudahiya di navbera (22) û (23)yê de ew e ku di (22vi)yê de fraza daçekî (PP) ji fraza navdêrî veqetiyaye lê di (23vi)ê de fraza daçekî hê di hundirê fraza navdêrî (NP) de ye û di (23viii)ê de ji fraza navdêrî vediqete. Bi vî awayî wateya “Dizekî berda zilamê bi çek.” derdikeve. Dara sentaksê ya vê risteyê jî wiha ye (Carnie, 2010: 78):



Şekl 1.18. Dara sentaksê ya “*A burglar shot the man with a gun*” (Dizekî berda zilamê bi çek).

Bi pêşxistina teoriyên zimannasiyê ve rêzik û formûl jî bêtir hatine giştîkirin û gerdûnîkirin. Rêzikên leksîkal (senifandina peyvan) û rêzikên kategoriyî (kîjan peyv dikare bi kîjan peyvê re komê çêke û rêza wan ci ye) bi hev re rêzikên binyada frazan ava dikan.

(24) $X \rightarrow Y Z$

Ev rêzik (24) wiha tê xwendin: Girêka (*node*) Xê bi Y û Zyê tê firehkirin. An jî berevajî wê heger li kêleka hev (an jî li ser hev) Y û Zyek hebe, bi şertê ku ji aliyê rastê herî, meriv dikare ji Y û Zyê X’ê ava bike. Û ev kiriyar bi awayekî xwedubarekir (*recursive*) dikare bidome. Hin rêzikên kategoriyî û leksîkal ên zimanê îngilîzî li jêr in (Bhatt, d.t.: 2-3):

(25) Rêzikên Kategoriyî

- a) $S \rightarrow NP \text{ Modal } VP$
- b) $VP \rightarrow V AP PP$
- c) $AP \rightarrow AdvP A$
- d) $AdvP \rightarrow Adv$
- e) $PP \rightarrow P NP$
- f) $NP \rightarrow D N$

(26) Rêzikên Leksîkal

- a) N → *girl*
- b) N → *boy*
- c) Adv → *incredibly*
- d) A → *conceited*
- e) V → *seem*
- f) Modal → *must*
- g) P → *to*
- h) D → *that*
- i) D → *this*

Bhatt (d.t.: 3) bi van rêzikan heşt risteyêngi îngilîzî ava dike:

(27)

- a) *This boy must seem incredibly conceited to that girl.*⁵⁴
- b) *This boy must seem incredibly conceited to this girl.*⁵⁵
- c) *This boy must seem incredibly conceited to that boy.*⁵⁶
- d) *This boy must seem incredibly conceited to this boy.*⁵⁷
- e) *This girl must seem incredibly conceited to that girl.*⁵⁸
- f) *This girl must seem incredibly conceited to this girl.*⁵⁹
- g) *This girl must seem incredibly conceited to that boy.*⁶⁰
- h) *This girl must seem incredibly conceited to this boy.*⁶¹

Digel wê, bi metoda xwedubarekirinê (*recursive*) meriv dikarê heta hetayê formûlê dirêj bike û risteyêngi nû hilberîne. Bo nimûne:

(28) *The children hope that the teacher knows that the principal said that the school closes for the day* (Fromkin û yd., 2011:98).⁶²

⁵⁴ Ev kurik divê ji wê keçikê re gelekî qure bixuye.

⁵⁵ Ev kurik divê ji vê keçikê re gelekî qure bixuye.

⁵⁶ Ev kurik divê ji wî kurikî re gelekî qure bixuye.

⁵⁷ Ev kurik divê ji vî kurikî re gelekî qure bixuye.


⁵⁸ Ev keçik divê ji wê keçikê re gelekî qure bixuye.

⁵⁹ Ev keçik divê ji vê keçikê re gelekî qure bixuye.

⁶⁰ Ev keçik divê ji wî kurikî re gelekî qure bixuye.

⁶¹ Ev keçik divê ji vî kurikî re gelekî qure bixuye.

⁶² Zarok hêvî dîkin ku mamoste dizane ku birevêber gotiye ku dibistan ji bo îro girtiye.



Şekl 1.19. Dara sentaksê ya "*The children hope that the teacher knows that the principal said that the school closes for the day*".

Axirî, îroroj em dizanin ku hemû rêzikên leksîkal û rêzikên kategorîyî yên zimanê îngilîzî bê kîmasî hatine diyarkirin û li gorî wan jî rêzikên binyada frazan hatine danîn. Li gorî wan rêzikan formûlên li jêr ji bo zimanê îngilîzî birêkûpêk dixebeitin:

(29)

$$\text{NP} = \{ (\text{Det}) + (\text{Adv}) + (\text{Adj}+) + \text{N} + (\text{PP}+) + (\text{ComP}) \}$$

$$\text{VP} = \{ \text{V} + (\text{NP}) + (\text{PP}+) + (\text{AdvP})$$

$$\text{V}_L + \text{NP}$$

$$\text{V}_L + \text{Adj} \}$$

$$\text{AP} = \{ (\text{Deg}) + \text{Adj}$$

$$\text{Adj} + (\text{Deg}) + (\text{PP}) + (\text{ComP})$$

$$\text{Adj} + \text{PP} \}$$

$$\text{AdvP} = \{ (\text{Deg}) + \text{Adv} + (\text{Deg})$$

$$(\text{Deg} + \text{Adv} + \text{ComP}) \}$$

PP = Prep + NP (Chomsky, 2002: 26-30; Carnie, 2010: 72-92; Fromkin û yd., 2011: 78-111; Baker, 2003: 266-7; Kim û Sells, 2008: 22-31; Yule, 2010: 102-106; Anderson û yd., 2002:779)

Li vir sembola “{ }”yê komê nîşan dide û her rêzeke komê nîşan dide ku fraz dikare bi wî awayî jî saz bibe. Hêmanên di hundirê kevanekê “()” de opsîyonel in, yanî dikarin di frazê de cih bigirin an jî negirin. Em ê di beşa duyem de hewl bidin ji bona kurmancî jî ji bo her cureyeke frazê formûlên wiha nîşan bikin ku yek ji armancê sereke ya vê xebatê ev e.

BEŞA DUYEM

2. FRAZ DI KURMANCÎ DE

2.1. Îzafe û Ravek

Wekî me berê jî gotî, di xebatên li ser kurmancî de komepeyv/fraz bi têgehêن ravek û îzafeyê ve hatine ravekirin. Di zimêن de carinan meriv nikare hin rewş, raman û tevgeran tenê bi peyvekê ifade bike. Wê gavê, çend peyv bi hev ve tên girêdan û wateyeke hevgirtî derdibirin, di kurmancî de em ji van komepeyvan re dibêjin ravek (Güzel, 2018: 8). Li gorî Tan (2011: 320), ji bo ravekirina tiştekî, ravek (îzafe) pêwîst e û ev rewşa îzafeyî bi alîkariya veqetandekan pêk tê. Yonat (2020: 56), îzafeyê wekî termeke ûranî diyar dike ku ew ji bo avaniya ravekê tê bikaranîn. Yonat ji Haig (2011: 368-9) neqil dike ku îzafeya di kurmancî de sê fonksiyonan tîne cih: fonksiyona girêdanê (*adnominal linking*), fonksiyona anaforîk (*demonstrative/anaphoric*) û fonksiyona zemanî (*tense ezafe/extended ezafe*). Fettahoğlu (2017: 199) di xebata xwe de li ser ravekê navdêrî yên tirkî û erebî xebitiye û ji bo ravekê wiha dibêje; ev komepeyvên ku ji yek an jî zêdetir peyvan pêk hatine beramberî “*tamlama*”ya zimanê tirkî tên û di zimanê erebî de wekî (التركيب) tên binavkirin. Herwiha, têgeha îzafeyê di ferhengê de wiha cih digire: “1. *Eleqe, peywendiya di navbera du tiştan de.* 2. gr. *Raveka navdêrî, koma navan.*” (Devellioğlu, 1980, 567).

Ji pênameyan jî diyar dibe ku armanca ravekê, temamkirin an jî modîfiyekirina peyvekê (navdêr) ye. Di ravekan de “raveber” gireya îzafeyê werdigire. Raveber, ew navdêr e ku tê temamkirin/modîfiyekirin. Peyv an jî komepeyva din ku raveberê temam dike an jî modîfiye dike, wekî “raveker” tê binavkirin. Aydin û yd. (2021: 88) ji bo raveberê peyva “ravekirî” bi kar anîbin jî hema bêje xebatên rêzmanî yên kurmancî tevan li ser binavkirina raveber û ravekerê li hev kirine. Raveber û raveker bi alîkariya veqetandekan, rewşa îzafeyê ava dikin. Di kurmancî de raveber li pêş, raveker li paş e. Raveber li gorî zayend, hejmar û nasyariyê, gireyên veqetandekê werdigire, raveker heger ji peyvekê pêk hatibe û navdêr be, ditewe. Heger raveker ji peyvekê zêdetir be, navdêra herî dawî ditewe, yên pêş li gorî zayend, hejmar û nasyariyê veqetandekan werdigirin. Raveker heger cînav⁶³ be, cînavêñ tewandî (min,

⁶³ Di mijarêñ pêş de em ê bibînin ku ev hêmanêñ ku em ji wan re dibêjin cînavêñ tewandî, bi alîkariya îzafeya gireyî yên nasyar rewşa rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) ava dikin.

te, wê, wî, me, we, wan) dixin modîfiyeker. Ji ber ku rengdêrên kurmancî ne peyvên guherbar in, heger raveker rengdêr be ne ditewe ne jî veqetandekan werdigire. Heger raveker ji rengdêrekê zêdetir be, herdu rengdêr bi alîkariya veqetandekên serbixwe an jî bi alîkariya gihaneka “û”yê bi hev ve têr girêdan. Heger raveber ji peyvekê zêdetir be herdu peyvên dawî bi gihaneka “û”yê bi hev ve têr girêdan, peyva herî dawî li gorî zayend, hejmar û nasyariya xwe veqetandekê werdigire.

Tablo 2.1. Veqetandekên kurmancî.

	Mê	Nêr	Pirjimar
Nasyar	-a	-ê	-êñ
Nenasyar	-eke/-eka	-ekî/-ekê	-ine/-inêñ

(30)

- a) **Mala** wê.
- b) **Malên** wê.
- c) **Maleke** wê.
- d) **Maline** wê.
- e) Deriyê malê.
- f) Deriyêñ malê.
- g) Deriyekî malê.
- h) Deriyine malê.
- i) **Mala** wî.
- j) **Mala** wan.
- k) Deriyê Osmêñ/Osmanî.
- l) Deriyê malan.
- m) **Mala** bavê min.
- n) Deriyê mala Osmêñ/Osmanî.
- o) Deriyê sor.
- p) Deriyê sor ê mezin.
- q) Deriyê sor ê Osmêñ
- r) **Mala** sor **a** mezin
- s) Dîk û mirîşkêñ min.
- t) Dîk û mirîşkêñ reş û sipî

Ji mînakan (30a-t) jî diyar dibe ku gireya ïzafeya (veqetandek) bi dawiya sereyê ve dizeliqe û hemû modîfiyeker li aliyê rastê dimînin. Li vir, pênc rewşen balkêş derdikevin pêş:

1. Heger modîfiyeker navdêr an jî cînav be, modîfiyeker ditewe û rewşa xweyîtiyê (*possessive*) çêdibe (bnr. 31a-c).
2. Heger modîfiyeker cînav be û ïzafe nasyar be, ïzafe û cînav fonksiyona rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) ava dikin (bnr. 31a,b,l).
3. Heger modîfiyeker rengdêr be rewşa artîkilê (*article*) çêdibe (bnr. 31d).
4. Heger modîfiyeker ji yek peyvê zêdetir be peyva dawî ne bi gireyan lê bi veqetandekên serbixwe/nebestî tê ïzafekirin (bnr 31e-f). Û wekî di herdu xalên pêşî de diqewime, heger peyva dawî navdêr an jî cînav be rewşa xweyîtiyê (bnr. 31f-g), heger rengdêr be rewşa artîkilê çêdibe (bnr. 31e).
5. Wextê nenasyarî (*indefinite*) hebe; modîfiyeker rengdêr be rewşa artîkilê ya nenasyar (*indefinite article*) çêdibe (bnr. 31h-i); modîfiyeker navdêr an jî cînav be hem rewşa artîkilê çêdibe hem jî rewşa aîdîyetê çêdibe (*a/an ... of (the) ...*), (bnr. 31j-k).

(31)

Kurmancî	English
a) Mal-a wê.	<i>Her house.</i>
b) Mal-a wî.	<i>His House.</i>
c) Mal-a Osmên.	<i>Osman's house.</i>
d) Deri-y-ê sor.	<i>The red door.</i>
e) Deri-y-ê sor ê mezin.	<i>The big red door.</i>
f) *Deri-y-ê sor ê Osmên.	<i>Osman's red door.</i>
g) Mal-eke wê.	<i>A house of hers/One of her house.</i>
h) Deri-y-ekî sor.	<i>A red door.</i>
i) Deri-y-ekî sor ê mezin.	<i>A big red door.</i>
j) Deri-y-ekî Osmên.	<i>A door of Osman's.</i>
k) Deri-y-ekî sor ê Osmên.	<i>A red door of Osman's</i>
l) Mal-ên wê.	<i>Her houses.</i>
m) Mal-ine wê.	<i>Some houses of her/Some of her houses.</i>

- | | |
|--------------------|-------------------------------------|
| n) Mal-ine şivên. | <i>Some houses of the shepherd.</i> |
| o) Deri-y-ên sor. | <i>The red doors.</i> |
| p) Deri-y-ine sor. | <i>Some red doors.</i> |

Di van hemû ravekan de (31a-p) raveber navdêrî (*nominal*) ye û li gorî modîfiyekerê fonksiyona îzafeyê diguhere. Herweha, ligel ku di van mînakan de peyva avaker (sere) raveber e jî, di rêzimana kurmancî ya klasîk de senifandin û binavkirina ravekan li gorî ravekerê (modîfiyeker) hatine kirin. Ev jî problemeke mezin e li ber têgihiştina zimên, lewma yek ji armancêvê xebatê ew e ku senifandin û binavkirina xelet a ravekan nîşan bide.

Herwiha, digel ku me avaniya ravekê bi îzafeyê, yanî bi temamkirin û modîfiyekirina raveberê ve girêdabû û me gotibû ku ev girêdan bi vegetandekan çêdibe, ji mînakêni li jêr (32a-k) diyar dibe ku carinan ravek, bêyî vegetandekan û ji peyvekê jî pêk têr. Di (32a-d)yê de, ravek bi alîkariya çendîkeran (*quantifiers*) ava bûne. Di (32a-b)yê de raveker hatine pêş raveberê, di (32c-d)yê de raveker hatine paş raveberê. Di mînakêni (32e-h)yê de ravek ji peyvekê pêk hatine. Raveber, gireyên diyarker (*determiner/artîkil*) ên nenasnyariyê wergirtine. Em dikarin van mînakan wiha jî binivîsin: (32e) Yek xwendekar nehat. (32f) Hin xwendekar nehatin. (32g) Yek xwendekarê xwar. (32h) Yek xwendekarî xwar.

Di mînaka (32i)yê de rengdêra nîşander (*demonstrative adjective*) bûye raveker û hatiye pêş raveberê. Di kurmancî de du kom nîşander hene. Yêr xwerû; ev (nêzîk), ew (dûr) û yêr tewandî; vê (mê, nêzîk, yekjimar), vî (nêr, nêzîk, yekjimar), van (nêzîk, pirjimar), wê (mê, dûr, yekjimar), wî (nêr, dûr, yekjimar), wan (dûr, pirjimar). Di mînaka (32j)yê de rewşa bangkirinê heye, raveber ji hêla zayendê ve hatiye diyarkirin. Dî mînaka (32k)yê de peyva xwerû “xwendekar” bi tena serê xwe bûye ravek. Ji ber ku di kurmancî de peyvên xwerû jixweber nasyar in (bi alîkariya zero morfemê), raveber ji hêla nasyariyê ve hatiye diyarkirin. Yanî axêver/nûser dizanê bê kîjan xwendekar nehatiye.

(32)

- a) Gelek xwendekar nehatin.
- b) Bîst xwendekar nehatin.
- c) Xwendekar hemû (I) nehatin.
- d) Xwendekar tev (I) çûn.

- e) Xwendekarek nehat.
- f) Xwendekarine nehatin.
- g) Xwendekarekê xwar.
- h) Xwendekarekî xwar.
- i) Ev xwendekar nehat.
- j) Xwendekaro!
- k) Xwendekar nehat.

Lewma, em dibînin ku ravekirina binyada risteyên kurmancî bi mijarêne ravek û ïzafeyê ve qels dimîne û dibe sedema zêdetir aloziyê. Digel senifandin û binavkirina xelet ya ravekan, di kurmancî de ji bo veqetandekên serbixwe/nebestî jî rewşike nezelalkirî heye. Berî ku em derbasî mijara frazan bibin, hewce heye em li ser vê mijarê jî bisekînin.

Di kurmancî de veqetandekên nasyariyê dikarin bêyî ku bi peyvan ve bizeliqin, bi awayekî serbixwe di risteyê de cih digirin. Ev ïzafe wekî fonksiyona nîşander/anaforîk (demonstrative/anaphoric) xuya dike, wekî sereya frazê tevdigere û bi hejmar û zayendê li hev dike (MacKenzie, 1961; Haig, 2011; Gündogdu, 2023). Bedirxan (1998: 63), wan wekî “Vegetandek di pêşıya rengdêran de” bi nav dike û wiha pênase dike: “Gava veqetandeka binavkirî dikeve pêşıya rengderekê ew li şûna wê navdêrê radibe ko berî bîstekê çêl li wê kirine û ew bi xeberbêjan nas e. Hingê veqetandek mîna pronavekî navderekê dinimîne. Herwekî di bersivêne komekêne jêrîn de:

(33)

- a) Tu kîjan kumî dixwazî?
- b) Ez ê gewir dixwazim (yanî “kumê gewir dixwazim”).
- c) Tu kîjan destmalê dixwazî?
- d) Ez a sor dixwazim (yanî “destmala sor dixwazim”).
- e) Ez en gewir dixwazim (yanî “kumên gewir dixwazim”).
- f) Ez en sor dixwazim (yanî “destmalên sor dixwazim”).

Wextê meriv li mînakêne Bedirxan (33b,d-f) dînihêre meriv demildest hay lê dibe ku ji ravekê⁶⁴ navdêr (sere) hatiye derxistin, gireya ïzafeyê (veqetandek) û modîfiyeker

⁶⁴ Ji ber ku em hê derbasî mijara frazan nebûne, em rewşa ïzafeyê wekî ravek bi nav dikan.

maye. Lê em dibînin ku veqetandek êdî ne bestî ye, serbixwe ye. Ji bo rewşa xweyîtiyê (*possessive*) jî ev rewş eynî ye (destmala Zozanê > a Zozanê). Lê fonksiyona ïzafeyê di vê rewşê de jî xera nabe. Heger modîfiyeker rengdêr be ïzafe bi fonksiyona artîkilê (*article*) radibe (*I want the red one*), heger modîfiyeker navdêr an jî cînav be ïzafe rewşa xweyîtiyê nîşan dide (*I want Zozan's*).

Hin veqetandekên serbixwe jî dikevin nav ravekê û ji ber ku rengdêr nayên tewandin, sere û modîfiyekera rengdêrî bi hev ve girêdidin. Bedirxan (1998: 67) di heman xebata xwe de behsa vê mijarê jî dike, mînaka “kurê Haco ê mezin” dide. Di vê mînakê de “ê” li “kur” vedigere yanî kur mezin e, ne Haco. Heger em mezintiya Haco îfade bikin, divê em bibêjin “kurê Hacoyê mezin”. Bedirxan çend mînakênen din jî dane: “Tifinga min a dirêj. Hespekî min î xurt û beza hebû. Kitêba Hevind a peritî. Mehîna min a kumêt.” Di van mînakânan de jî xuya ye ku veqetandeka serbixwe li sereyê vege riwaye û sereyê kîjan veqetandek stendibe, veqetandeka serbixwe jî bî wî awayî hatiye bikaranin û wexta ji yekê zêdetir rengdêrîn modîfiyeker hebin, gihaneka “û”yê dikeva navbera wan.

Di van mînakênen li jor ên Bedirxan de rewşeke cuda heye. Em dibînin ku di rewşa nasyariyê de wextê hem xweyîtiyê (*possessive*) hem jî artîkil (*article*) hebe xweyîtiyê hukmê li ser artîkilê dike. Bo nimûne:

(34)

- | | |
|-----------------------------|--------------------------------------|
| a) Tifinga dirêj. | The long rifle. |
| b) Tifinga min. | My rifle. |
| c) Tifinga Hevind. | Hevind's rifle./The rifle of Hevind. |
| d) Tifinga min a dirêj. | My long rifle. |
| e) Tifinga dirêj a min. | My long rifle. |
| f) Kitêba Hevind a peritî. | Hevind's shabby book. |
| g) Kitêba peritî ya Hevind. | Hevind's shabby book. |

Li vir, ji ber ku rewşa xweyîtiyê bi navêñ taybet û rengdêrîn xweyîtiyê (*possessive adjectives*) hatiye avakirin ne hewce ye careke din diyarker bê bikaranîn. Yanî jixwe diyar e bê behsa çi tê kirin. Lê wextê modîfiyeker navdêreke din be, divê artîkil jî bê bikaranîn. Bo nimûne:

(35)

- a) Tifinga şivên a dirêj. The shepherd's long rifle.
- b) Tifinga dirêj a şivên. The shepherd's long rifle.
- c) Kitêba mamosneyê a peritî. The teacher's shabby book.
- d) Kitêba peritî ya mamosneyê. The teacher's shabby book.

Di rewşa nenasnyariyê de qalibê (*a/an ... of (the) ...*) çêdibe û dîsa li gorî modîfiyekerê artîkil û xweyîti çêdibe. Di vî qalibî de li şûna rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) cînavêñ xweyîtiyê (*possessive pronouns*) diyar dîbin. Bo nimûne:

(36)

- a) Tifingeke min a dirêj. A long rifle of mine.
- b) Tifingeke dirêj a min. A long rifle of mine.
- c) Tifingeke şivên a dirêj. A long rifle of the shepherd.
- d) Tifingeke dirêj a şivên. A long rifle of the shepherd.
- e) Kitêbeke Hevind a peritî. A shabby book of Hevind.
- f) Kitêbeke peritî ya Hevind. A shabby book of Hevind.

Sağniç (1991: 72), wexta ku veqetandek serbixwe bin, wan wekî “cînavêñ peywendiyê” (a, ê, ên, ya, yê, yêñ) bi nav dike. Elî (2006: 34) jî di xebata xwe de beşek ji bo van veqetandekan terxan kiriye, dibêje: Wexta ku modîfiyekera duyem rengdêr be veqetandek mîna cînavekî tê nasîn û sereyê dinimîne. Elî, van veqetandekên serbixwe li gorî sereya nasyar (-a,-ê,-êñ) û sereya nenasnyar (-e,-î,-en) dike du beş. Mînakên ku Elî di xebata xwe da dane ev in:

(37)

- a) Dara Êvirşê ya kevnar. (Yekjimar, mî, nasyar)
- b) Xortê jîr ê bedew ê ciwan. (Yekjimar, nîr, nasyar)
- c) Şagirtê me yêñ jîr. (Pirjimar, nasyar)
- d) Guleke sor e binxwes. (Yekjimar, mî, nenasnyar)
- e) Hespekî boz î rewan. (Yekjimar, nîr, nenasnyar)
- f) Sêvine sor ên mezin. (Pirjimar, nenasnyar)

Ciwan (1992: 193) rasterast behsa veqetandekên serbixwe nekiriye lê di mînakêñ xwe de bi kar anîne. Wî ji wekî Bedirxan, nenasyarî diyar nekiriye û sereyê kîjan veqetandek wergirtibe, ew kiriye veqetandeka serbixwe. Di bin sernavê “Ravekêñ Zincîrîn” de ev mînak dane:

(38)

- a) Çiyayê bilind ê asê yê bidar.
- b) Partiya Demokrat a Kurdistanê.
- c) Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê.
- d) Xaniyê sêtebeqe yê bilind ê spî yê gundî.
- e) Zavayê birayî yê mezin. (Zava mezin e.)
- f) Zavayê birayê mezin. (Bira mezin e.)
- g) Dara sêvîn mezin. (Sev mezin in.)
- h) Dara sêvan a mezin. (Dar mezin e.)
- i) Civîna jinêñ demokrat ên Kurdistana Iraqê. (Jin demokrat in, jin ji Kurdistana Iraqê ne.)
- j) Civîna jinêñ demokratêñ Kurdistana Iraqê. (Jin hemserêñ demokratan in, demokrat ji Kurdistana Iraqê ne.)

Di mînaka “Civîna jinêñ demokrat ên Kurdistana Iraqê.” de beriya rengdêrê du navdêr hene, veqetandeka serbixwe piştî rengdêrê hatiye û veqetandeka serbixwe ne li sereyê (civîn), li modîfiyekara sereyê (jin) vedigere. Lewma fraza piştî veqetandeka serbixwe ne bi sereyê lê bi yek ji modîfiyekera sereyê (jin) ve hatiye girêdan. Meriv dikare mînakê wiha jî biguherîne: “Civîna jinêñ demokrat a Kurdistana Iraqê.” Lê cudahiya wateyê derdikeve meydane. Di mînaka yekem de em dizanin ku “jin” ji Kurdistana Iraqê ne, lê di mînaka duyem de em nizanin bê “jin” ji ku derê ne, tenê em dizanin “civîn” li Kurdistana Iraqê li dar ketiye an jî dê li dar bikeve.

Kurdo (1981: 44-5), ji bo navêñ nêr û yekjimar “î”, navêñ mî û yekjimar “e” û ji bo pirjimariyê jî veqetandeka “êñ”ê bi kar anîye lê li gorî Kurdo, di navbera Kurmanciya Roava (Rojava) û zaravayê Kurdêñ Sovyetê de hin cudahî hene. Bo nimûne:

(39)

- a) Qîza jîr e biaqil. (Yekjimar, mî.)
- b) Qîza jîr a biaqil. (Yekjimar, mî. Di Kurmanciya Roava de.)
- c) Xortê jîr ï biaqil. (Yekjimar, nîr.)
- d) Xortê jîr ê biaqil. (Yekjimar, nîr. Di Kurmanciya Roava de.)
- e) Min xortê bedew ên delal dîtin. (Pirjimar.)
- f) Min xortêd bedew e delal dîtin. (Pirjimar, di zaravayê kurdên Sovyetê de.)

Açar (2014) di gotara xwe de bi berfirehî li ser veqetandekên serbixwe yên pêşıya rengdêran sekiniye û bi taybetî li nasyarî û nenasıriya veqetandekên serbixwe hûr bûye. Wî di xebata xwe de ew wekî qertaf bi nav kirine û erka wan jî wekî “wesfandina ravekê bi rengdêran ve” pênase kiriye. Aşar ji bo ravekirina mijarê hem bi xwe mînak amade kirine hem jî ji kilam û destanê kurdî mînak dane.

Tablo 2.2. Li gorî Aşar (2014) veqetandekên serbixwe yên berî rengêderan.

	Mî	Nîr	Pirjimar
Nasyar	e	î	ne
Nenasıyar	a	ê	ên

(40)

- a) Diya min e delal. (Dê yek e, ew jî delal e.)
- b) Diya min a delal. (Ji yekê bêtir dê hene, em behsa yekê ji wan dikin, yên din ne delal in.)
- c) Birayê min î xwendevan. (Bira yek e, ew jî xwendevan e.)
- d) Birayê min ê xwendevan. (Ji yekê bêtir bira hene, em behsa yekî ji wan dikin, yên din ne xwendevan in)
- e) Malêñ gund ne mezin. (Malêñ gund hemû mezin in.)
- f) Malêñ gund ên mezin. (Malêñ gund pir in, hin ji wan mezin in, hin ne mezin in.)

Ji mînakan jî xuya dibe ku veqetandekên nasyariyê bi şertê ku sere “yek tenê” be têñ bikaranîn. Di bikaranîna nenasıriyê de sere temsîliyeta “pir”ê dike, em ji wê “pir”ê behsa perçeyekê dikin.

Axirî, ravekêن zimanê kurmancî li gorî ravekerê hatine binavkirin û dabeşkirin lê tê dîtin ku carinan raveker ji peyvekê zêdetir e û ev peyv ne heman cure peyv in. Hin cure jî bi tena serê xwe nikarin bibin raveker û hewce bi cureyeke din dikin. Herwiha carinan raveker cihê xwe diguherîne û diçe pêşıya raveberê an jî dikeve nav bazindaçekan. Ev pirsiyar jî dibin sedema aloziyê. Di xebatêن sentaksî yên kurmancî de hem li ser hejmara cureyên ravekan hem jî li ser binavkirina ravekan lihevkirinek tune. Bo nimûne, ravekerên ku bi daçekekê û bi navdêrekê ava dibin wekî Raveka Hokerî tên binavkirin (Xwendekarê ji Amedê). Digel vê, cînav û rengdêr ku ew jî bi eslê xwe navdêr (*nominal*) in, wekî cureyên cuda hatine binavkirin. Raveka Zincîrîn jî ne li gorî cureya ravekerê, li gorî hejmara peyvên ravekerê hatiye binavkirin.

Di xebatêن sentaksî de, ji bo famkirina binyad û wateya hevokê cihê peyv û komepeyvan giring e. Ji ber ku ravek bi rewşa ïzafeyê tên bikaranin û xebatêن heta niha ku bi navê “ravek”ê li ser vê mijarê xebitîne ji bo ravekerê herî kêm du peyvan pêwîst dikin, di perçekirina hevokê de hin peyv bi tena serê xwe dimînin, an nabin perçeyê ravekan an jî ligel ku ne perçeyê ravekerê be jî bi ravekerê ve tê zeliqandin. Bo nimûne:

(41)

- a) Xelîlê Mihemedî dikare bi herikbarî pirtûkên kurmancî bixwîne.
- b) Xelîl û Mihemed dikarin bi kurmancî pirtûkan bixwînin.

Di (41a)yê de rewşa ïzafeyê heye lewma bi hêsanî meriv dikare li gorî pênasseyên ravekan, hevokê perçe bike. Li gorî qayîdeyên ravekan:

(42)


- a) Xelîlê Mihemedî
- b) Pirtûkên kurmancî

Di mînaka (41a)yê de du ravek hene. Ya yekê, (42a) ji ber ku raveker navdêr e, dibe raveka navdêrî. Di (42b)yê de raveker (kurmancî) netewiyaye, divê em wê wekî rengdêr qebûl bikin, lewma ew jî dibe raveka rengdêrî. Di hevokê de hoker “bi herikbarî” heye lê ji ber ku bi tena serê xwe ye, rewşa ïzafeyê pêk nehatiye, wekî ravek nayê qebûlkirin. Herwiha, hem lêkera modal (karîn) hem jî lêkera sereke (xwendin) li derive man.


Di mînaka (41b)yê de veqetandek nehatine bikaranin û rewşa îzafeyê jî tune ye. Li gorî qayîdeyên ravekan tu navdêr nehatine temamkirin an modîfiyekirin. Lê li gorî qayîdeyên frazan em dikarin hevokê ji hev veçirînin. Di frazan de binavkirin û dabeşkirin li gorî sereyê, yanî li gorî peyva ku navendî tê kirin. Heger em herdu hevokan (41a,b)yê li gorî qayîdeyên frazan perçe bikin:

(43)

- a) [FK [FN [N Xelîl] [F^{iz} [iz -ê] [FN Mihemedî]]] [K' [LM dikare] [FL [FH bi herikbarî] [L' [FN pirtûkêñ kurmancî] [L bixwîne]]]]]
- b) [FK [FN [N Xelîl] [FGih [Gih û] [FN Mihemed]]] [K' [LM dikarin] [FL [FH bi kurmancî] [L' [FN pirtûkan] [L bixwînin]]]]]



Şekl 2.1. Dara sentaksê ya "Xelîlê Mihemedî dikare bi herikbarî pirtûkêñ kurmancî bixwîne".



Şekl 2.2. Dara sentaksê ya "Xelîl û Mihemed dikarin pirtûkan bi kurmancî, herikbar û nermok bixwînin".

Hem ji rîbaza kevaneka goşeyî (43) hem ji ji dara sentaksê (Şekl 2.1.) diyar dibe ku hemû hêmanên risteyê li gorî cure û fonksiyonên xwe têr perçekirin û etîketkirin.

2.2. Cureyêن Frazan

2.2.1. Fraza Navdêrî (*Noun Phrase*)

Fraza navdêrî yekeya sentaktîk e ku dikare wekî biker an jî berkarê tevbigere (Trask, 2007: 189). Herwiha, ew ji bo heyberên razber û şenbêr têr referekirin (Brown û Miller, 2013: 315). Di fraza navdêrî de (FN) sere navdêr an jî navdêrî (*nominal*) ye. Fraza navdêrî dikare ji peyvekê an jî ji yekê zêdetir peyvan pêk bê. Fraza navdêrî çi kurt çi dirêj divê di hundirê risteyê de wekî avaker rabe û di nava wê de têkiliya biker û kar/lêkerê tune be (Mustafa û Omer, 2017: 267). Frazê navdêrî dikarin ji aliyê diyarker (*determiners*), çendîker (*quantifiers*), rengdêr, navdêr, cînav, daçek û hevokên peywendiyê (*relative clause*) ve bêr modîfiyekirin (Bülbül, 2017).

Di kurmancî de modîfiyekerên fraza navdêrî dikarin hem bêr pêsiya sereyê hem jî bêr paşıya sereyê. Herwiha, sere dikare hem pêşmodîfiyeker hem jî paşmodîfiyeker wergire. Bülbül (2017: 90) dibêje di kurmancî de modîfiyekerên piştî sereyê bêtir têr bikaranîn û ew bêtir kompleks in. Bülbül modîfiyekerên kurmancî wiha rêz dike:

(44)

1. Modîfiyekerên berî sereyê:

1.1. Diyarker (*Determiners*)

- a) Nîşander (*demonstratives/deictic*): ev, ew.
- b) Diyarkerên Neamajekirî (*non-referential*): tu, filan, bêvan, her...
- c) Rewşa sıfırê (*zero case*): Ø

1.2. Çendîker

- a) Çendîkerên nenasjar (*indefinite quantifier*): hinek, gelek, hemû...
- b) Çendîkera partîtîf a nenasjar (*partitive indefinite quantifier*): hinek ji, gelek ji, piçek ji...
- c) Çendîkera hejmarî (*numeral quantifier*): çar, bîst, du ... û nîv...
- d) Çendîkera dijber (*contrastive quantifier*): tenê, hew, bes...

1.3. Rengdêr (*Adjectives*)

2. Modîfiyekerên piştî sereyê:

2.1. Çendîker

- a) Çendîkerênen nenasýar (*indefinite quantifier*): giş, hemû, tev, din...
- b) Hejmarênen rêzîn (*ordinals*): yekem, sêyem, bîstem...

2.2. Diyarker (*Determiners*)

- a) Paşgirênen nenasýariyê (*indefinite suffix*): -ek, -ekê, -ekî, -ine.
- b) Nîşander û paşgira nîşander (*deictic suffix*): ha, han, hanê...
- c) Paşgira baneşanî (*vocative suffix*): -ê, -o, -no.

2.3. Rengdêr (*Adjectives*)

2.3.1. În Prototîp

- a) Endaze (*size*): mezin, fireh, zirav, kin...
- b) Reng (*color*): reş, kesk, tarî, ronî...
- c) Taybetiyênen bihîzyarî (*auditory qualities*): bideng, bêdeng, nizm, bilind, nerm...
- d) Teşe (*shape*): rast, xwar, gundorî...
- e) Çêj (*taste*): şêrîn, tahl...
- f) Destdan (*tactile*): şimatok, tûj...
- g) Jêçêbûn (*substance*): darîn, zêrîn, hesinî...

2.3.2. În Kêmprototîp

- a) Nirxî (*evaluative*): baş, xerab, xweşik...
- b) Rewşênen bihurbar (*transitory states*): germ, sar, kêfxwes, mijûl...
- c) Rewşênen jiyanî (*states of living*): pîr, mirî, sax, betal...
- d) Rengdêrenen namdariyê: necar, xanim, bijîşk...
- e) Orîjîna neteweyî: kurd, ereb...

2.4. Temamker (*Complement*)

2.4.1. Cînav

- a) Cînavênen kesî (*personal pronouns*): min, te, wî, wê, me, we, wan.
- b) Cînavênen nîşander (*demonstrative pronouns*): vî, vê, van, wî, wê, wan.
- c) Cînavâ vegerok (*reflexive pronoun*): xwe.
- d) Cînavâ hevûdînî (*reciprocal pronoun*): hev, hevdu, hevûdu.
- e) Cînavênen nenasýar (*indefinite pronouns*): hemûyan, gelekan, hinekan.

2.4.2. Navdêr

2.4.3. Hevoka Pêwendiyê (*relative clause*)

2.4.4. Frazênen daçekî (*adposition phrases*)

Bülbül (2017: 95) ji bo pêşmodîfiyekerên rengdêrî bes mînakên namdarî dide lê em dizanin ku rengdêrên piledar (*comparative, superlative*) û hejmarên rêsîn jî têñ pêşiya navdêran (xweşiktir mal, baştîrîn heval, yekem xwendekar).⁶⁵ Herwiha, diyarkerên pirsê (*interrogative determiners*) jî têñ pêşiya navdêran (kîjan mal, çi roj). Axirî em dizanin ku di kurmancî de navdêrek dikare ji aliyê diyarker (*determiners*), çendîker (*quantifiers*)⁶⁶ û rengdêran (*adjectives*) ve bê pêşmodîfiyekirin.

Wextê em têñ ser paşmodîfiyekeran, em dibînin ku hejmara wan ji pêşmodîfiyekeran gelekî zêdetir in. Ev jî nîşan dide ku di kurmancî de sere piranî li aliyê çepê/li pêş (*head initial*) dimîne. Di kurmancî de, diyarker, çendîker, rengdêr, cînav, navdêr, hevokên pêwendiyê û frazêñ daçekî dikarin bibin paşmodîfiyekerên navdêran. Ji bilî artîkila nenasyar (indefinite article) “-ek”⁶⁷, paşgira bangdanê (*vocative suffix*) û rengdêrên namdarî paşmodîfiyeker bi gireya ïzafeyê ve bi sereyê têñ girêdan. Çawa ku me berê jî gotî, li gorî cureya paşmodîfiyekerê, ïzafe bi fonksiyonê cuda radibe. Bülbül (2017: 108) erê dibêje wextê cînav bibe modîfiyekera sereyê, ïzafe bi fonksiyona xweyîtiyê radibe lê dibêje di kurmancî de komeke cînavêñ xweyîtiyê (*possessive pronouns*) tune û lewma jî cînavêñ kesî (*personal pronoun*) yên tewandî wekî paşmodîfiyeker dide. Herwiha, Bülbül wextê ji bo zimanê îngilîzî mînakên cînavêñ xweyîtiyê (*mine, yours, his, hers, its, ours, yours, theirs*) dide, bi xeletî kategoriya rengdêrên xweyîtiyê (*my, your, his, her, its, our, your, their*) dide.

Bi me, divê li vir rewşa ïzafeyê neyê piştguhkîrin, lewre heger bê piştguhkîrin wer tê fahmkîrin ku di kurmancî de ne cînavêñ xweyîtiyê (*possessive pronouns*) ne jî rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) hene. Ji ber ku di kurmancî de gelek mijar bi sernavêñ fireh hatine vekolîn⁶⁸, gelek fonksiyonê spesîfik ên zimêñ nehatine berçavkirin û hatine piştguhkîrin. Yanî, heger em li mînakêñ (34b,d,e)yê vegerin em ê bibînin ku wextê modîfiyekera fraza navdêrî cînav be rewşa xweyîtiyê bi rengdêrên

⁶⁵ Herwiha, di kurmancî de, di axaftinê de, qalibê zimanê tirkî yê piledarkirina rengdêran xuya dibe. Bo nimûne: Mala en xweş (*En güzel ev*).

⁶⁶ Çendîker (*quantifiers*), di xebatêñ zimannasiyê de, gelempêrî wekî diyarker (*determiners*) têñ qebûlkîrin.

⁶⁷ Digel halê tewandî û pirjimariyê: -ekî, -ekê, -ine. Bo nimûne: Mamosteyek hat. Mamosteyekî xwar. Mamosteyekê xwar. Mamosteyine xwar.

⁶⁸ Bo nimûne em dikarin mijarêñ ïzafe û tewangê bidin. Weku me di sernavê 2.1ê de jî rave kir gelek fonksiyonê ïzafeyê hatine piştguhkîrin. Herwiha, digel ku di kurmancî de tewang di rewş û cihêñ cuda de diqewime jî di xebatêñ rêzimanî de cudahiyêñ wan nehatine vekolîn. Fonksiyonê wan nehatine diyarkirin. Tewanga bişîñ daçekê, tewanga pişîñ lêkerê û tewanga pişîñ navdêrê wekhev têñ nîrxandin.

xweyîtiyê çêdibe (*My rifle*). Lewma di cî de ye ku em bibêjin di kurmancî de rengdêrên xweyîtiyê bi fonksiyonekê ïzafeyê ava dibe ku modîfiyekera fraza navdêrî cînava tewandî be. Li gorî vê em dikarin kategoriya rengdêrên xweyîtiyê wiha nîşan bidin: “îzafeya gireyî ya nasyar + cînavêñ tewandî”.⁶⁹ Herwiha cînavêñ xweyîtiyê jî bi ïzafeya serbixwe û cînava tewandî ava dibe: a/ê/ên min, a/ê/ên te, a/ê/ên wî, a/ê/ên wê, a/ê/ên me, a/ê/ên we, a/ê/ên wan.

Digel van, derbarê cînavan de rewşeke din jî heye ku divê em behs bikin. Di zimanê îngilîzî de cînavêñ kesî yên kesên yekem û duyem ên pirjimar (*we, you*) bi fonksiyona diyarkeran radibin (Postal, 1969: 17-23; Abney, 1987: 282-3; Panagiotidis, 1998: 84; Radford, 2012: 153). Ji mînakêñ li jêr tê dîtin ku ev rewş ji bo kurmancî jî derbasdar e:

(45)

- a) Em xwendekar gelek dixebeitin. We students work hard.
- b) Hûn xwendekar gelek dixebeitin. You students work hard.
- c) *Ez xwendekar gelek dixebeitim. *I student work hard.
- d) *Tu xwendekar gelek dixebeitî. *You student work hard.
- e) *Ew xwendekar gelek dixebite. *He/She/It student works hard.
- f) *Ew xwendekar gelek dixebeitin. *They students work hard.

Axirî, ji ber ku artîkil, çendîker, hejmar (*numbers*), cînavêñ xweyîtiyê û rengdêrên xweyîtiyê wekî diyarker (*determiner*) têñ qebûlkirin (Trask, 2007: 70-1), em ê jî van kategoriyan wekî diyarker diyar bikin. Û ji ber ku cînav jî cihê navan digirin em ê wan jî wekî navdêr bihesibînin. Bi vî awayî em dikarin modîfiyekerên frazêñ navdêrî wiha xwerûtir bikin:

(46)

1. Pêşmodîfiyeker

- a) Diyarker (*determiners*)
- b) Rengdêr (*adjectives*)

2. Paşmodîfiyeker

- a) ïzafe

⁶⁹ ïzafe: Gireyêñ veqetandekê (bnr. Tablo 2.1.1.)

- b) Diyarker (*determiners*)
- c) Navdêr (*nouns*)
- d) Rengdêr (*adjectives*)
- e) Hevoka pêwendiyê (*relative clause*)⁷⁰
- f) Fraza daçekî (*adposition phrase*)⁷¹

Bi vî awayî êdî em dikarin ji bo frazên navdêrî yên kurmancî formûlekê diyar bikin. Em ê li jêr ewilî bi kurtkirinê zimanê îngilîzî piştre jî bi kurtkirinê kurmancî formûla frazên navdêrî bidin.

(47)

$$NP \rightarrow (Det+) + (Adj) + N + (Det) + (Ezafe) + (N+) + (Adj+) + (CP) + (PP+)$$

(48)

$$FN \rightarrow (Dk+) + (Rd) + N + (Dk) + (\hat{I}zafe) + (N+) + (Rd+) + (FTk) + (FD+)$$

Di vê formûlê de em dibînin ku ji bo di kurmancî de frazeke navdêrî bê avakirin bes navderêke serbixwe bes e. Hemû hêmanê din ne hêmanê pêwîst in lê opsîyonel in. Herwiha, hin hêman dikarin ji yekê zêdetir bêن bikaranîn (zêdeka “+” di nav kevanekê tê wê wateyê). Ji bo her îhtîmalekê meriv nekarîbe nimûneyekê bide jî em ê li jêr ji bo hin kombînasyonan çend mînakan bidin:

(49)

- | | |
|----------------------------------------|--------------------|
| a) FN → (Dk) + N | Ev zilam |
| b) FN → (Dk+) + N | Ev şes zilam |
| c) FN → (Rd) + N | Apê Mûsa |
| d) FN → (Dk) + N + (\hat{I}zafe) + (N) | Çar malêñ gundiyan |
| e) FN → N + (Dk) | Hevalekê |

⁷⁰ Hevokêñ pêwendiyê ew hevokêñ jêrîn (*subordinate*) in ku sereya fraza navdêrî modîfiye dîkin. Di zimanê îngilîzî de sê cure hevokêñ pêwendiyê hene: 1) Ên bi “wh-words”an ava dibin (*the course which I took*). 2) Ên bi gihaneka “that”ê ava dibin (*the course that I took*). 3) Ên sıfir pêwendî an jî têkildar ku bi awayê sade li kêleka navdêr in (*the course I took*) (Brown û Miller, 2013: 378-9). Di kurmancî de em dikarin bi du awayan hevokêñ pêwendiyê saz bikin: 1) kursa ku ez diçim(ê). 2) kursa ez diçim(ê). Tê dîtin ku hevokêñ peywendiye jî bi ïzafeyê bi sereyê ve tê girêdan. Di vê xebatê de em ê hevokêñ peywendiye wekî fraza temamker (FTk) bi nav bikin (ing. *complementizer phrase*, *CompP*, *CP*). Di kurmancî de ji bo em bi peyvîn “wh-word” frazên temamker ava bikin divê beriya van peyvan (di kurmancî de “a, ê, ên” şuna *wh-words*ê digirin) ïzafe çêbibe: kursa bajêr ya ez diçim(ê) (*the course which I took*).


⁷¹ Frazên daçekî ew fraz in ku sere pêşdaçek e, herçî di zimanê îngilîzî de wekî fraza pêşdaçekî (PP) hatibe binavkirin jî ji ber ku di kurmancî de bazinedaçek jî hene, em ê navê fraza daçekî (adpositional phrase) bi kar bînin. Em ê di sernavê Fraza Daçekî de berfirehî li ser vê mijarê bisekinin.

- | | |
|-------------------------------------|------------------------------------|
| f) FN → N + (Îzafe) + (Rd) | Hevalekî baş |
| g) FN → N + (Îzafe) + (Rd+) | Hevalekî baş û jîr |
| h) FN → N + (Îzafe) + (FTk) | Mala ku em jê hatin |
| i) FN → N + (Îzafe) + (FD) | Xaniyê li bajêr |
| j) FN → N + (Îzafe) + (FD+) | Zarokê li kuçê yê di nav heriyê de |
| k) FN → (Dk+) + N + (Îzafe) + (FD) | ev şes zarokên ji bajêr |
| l) FN → (Dk+) + N + (Îzafe) + (FTk) | ev keçika ku ez jê hez dikim |

Ji mînakan jî tê fehmkirin ku herçî îzafe rewşeke fonksiyonî be jî di kurmancî de, di avakirina frazan de bi roleke giring radibe. Digel ku di îngilîzî de frazên daçekî dikarin dû hev bêñ (*the tall student of physics with red hair*) em dibînin ku di kurmancî de bêyî ïzafeyê (veqetandekên serbixwe), herçi frazên daçekî karibin li dû hev bêñ jî fraz an jî riste neteman xuya dibe (Zarokê li kuçê [yê] di nav heriyê de). Heger em rewşa ïzafeyê jê derxin binyada frazê diguhere:

(50)


- a) Zarokê li kuçê yê di nav heriyê de.
- b) [FN [N' [N' [N Zarok]] [Fîz [îz[îz -ê] [FD [D' [D li] [FN kuçê]]]]]] [Fîz [îz' [îz yê] [FD di nav heriyê de]]]]]



Şekl 2.3. Dara sentaksê ya "Zarokê li kuçê yê di nav heriyê de".

(51)

- a) *Zarokê li kuçê di nav heriyê de.
- b) *[R [FN Diyarkir(Spec)[N' [N' [N Zarok]] [F̂z [îz' [îz -ê] [FD [D li] [N kuçê]]]]]] [FD di nav heriyê de]]]




Şekl 2.4. Dara sentaksê ya "*Zarokê li kuçê di nav heriyê de".

Herwiha, di frazên navdêrî de hem sere hem jî modîfiyeker dikarin gihaneka “û”yê bihewînin. Bo nimûne:

(52)


- a) Zarok û dîkê li kuçê yêñ di nav heriyê de.
- b) [FN [N' [N' [N' [N zarok]] [FGih [Gih' [Gih û] [FN [N' [N' [N dîk]] [F̂z [îz' [îz -ê] [FD li kuçê]]]]]]]] [F̂z [îz' [îz yêñ] [FD di nav heriyê de]]]]]



Şekl 2.5. Dara sentaksê ya "Zarok û dikê li kuçê yên di nav heriyê de".

(53)

- a) Keç û xortên jîr û jêhatî.
- b) [FN Diyarkir(Spec)[N' [N' [N Keç]] [FGih [Gih' [Gih Û] [FN [N' [N' [N xort]] [F̂z [ïz' [ïz -en] [FR jîr û jêhatî]]]]]]]]]




Şekl 2.6. Dara sentaksê ya "keç û xortên jîr û jêhatî".

Ji bo ku di dara sentaksê de diyar bibe bê kîjan perçeyê modifiyekerê temamker (*complement*) e û kîjan perçe veser (*adjunct*) e, divê em bi Teoriya X-Barê dara xwe xêz bikin. Bo nimûne:

(54)

- a) Lawê şivên yê di nava heriyê de.
- b) [FN [N' [N' [N Law] [F̄z1(Temamker) [îz' [îz -ê][FN [şivên]]]][F̄z2(Veser) [îz' [îz yê] [FD [D' [pD di] [FN nava heriyê] [Dp de]]]]]]]




Şekl 2.7. Dara sentaksê ya Teoriya X-Barê "Lawê şivên yê di nava heriyê de".


Çawa ku ji dara sentaksê (Şekl 2.7.) jî xuya dibe, fraza îzafeyê (F̄z) ya yekem "-ê şivên" ji ber ku rewşa xweyîtiyê ava dike dibe temamkera sereya "law"ê. Fraza îzafeyê ya yekem qîza N-Barê ye û xwişka sereyê ye. Lê wextê em li fraza îzafeyê ya duyem binêrin "yê di nava heriyê de", ew hem qîza N-Barê ye hem jî xwişka N-Barê ye. Yanî ew veser (*adjunct*) e, opsîyonel e, bêyî wê jî fraza navdêrî dikare li ser xwe bisekine. Herwiha em dibînin ku frazên îzafeyê jî xwedî temamkeran in. Digel wê, frazên daçekî yên di hundirê frazên îzafeyê de jî xwedî temamkeran in.

(55)

- a) Ev keçika ku ez jê hez dikim.
- b) [FN [Dk ev] [N' [N' [N keçika]] [FTk(Veser) ku ez jê hez dikim]]]
- c) [FN [Dk ev] [N' [N' [N keçik]] [F̄z(Veser) [îz' [îz -a][FTk(Temamker) ku ez jê hez dikim]]]]]



Şekl 2.8. Dara sentaksê ya "ev keçika ku ez jê hez dikim".




Şekl 2.9. Dara sentaksê ya "ev keçika ku ez jê hez dikim".


Di Şekl 2.8. de fraza fonksiyonî ya ïzafeyê nehatiye diyarkirin (ev nîşandan xelet e) lewma fraza temamker bûye vesera (*adjunct*) izafeya gireyî. Lê çawa ku di Şekl 2.9. de tê dîtin heger em fraza ïzafeyê diyar bikin fraza ïzafeyê dibe veser û firaza temamker "FTk" (*Complementizer Phrase, CP*) jî dibe temamkera fraza ïzafeya gireyî. Ji ber ku di modîfiyekerê de ïzafeyeke din tune, veser (*adjunct*) jî tune. Wextê bi vegetandekên serbixwe, ïzafe beşdarî binyada frazê dibe, veser (*adjunct*) jî xuya dibin. Bo nimûne:

(56)

- Ev keçika cîrana me ya ku ez jê hez dikim.
- $[FN [Dk ev][N[N' [N keçik][FIZ(Temamker) -a cîrana me]]][FIZ(Veser) ya ku ez jê hez dikim]]]$
- $[FN [Dk ev][N[N' [N keçik][FIZ(Temamker) [Iz' [Iz -a] [FN(Temamker) cîrana me]]]]][FIZ(Veser) [Iz' [Iz ya] [FTk(Temamker) ku ez jê hez dikim]]]]]$



Şekl 2.10. Dara sentaksê ya "ev keçika cîrana me ya ku ez jê hez dikim".



Şekl 2.11. Dara sentaksê ya "ev keçika cîrana me ya ku ez jê hez dikim".


Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku di frazên navdêrî yên kurmancî de hêmana nêzî sereyê ku bi ïzafeya gireyî bi sereyê ve hatiyê girêdan û rewşa xweyîtiyê ava dike temamker e.⁷² ïzafeyê din ya ku bi vegetandekên serbixwe bi fraza navdêrî hatiye girêdan û sereyê modîfiye dike, dibe veser (*adjunct*), yanî opsîyonel e. Meriv vê ïzafeyê ji frazê derxîne jî fraz dîsa li ser xwe dimîne, wateya eslî ya frazê xera nabe. Ji bo nîsandana vê rewşê em dikarin mînakên li jêr bidin da ku rewş zelaltır xuya bibe:

(57)

- a) Qîza xalê bavê min.

⁷² Rengdêr bi awayê siruştî veserên (*adjunct*) navdêran in. Lewma rengderên xweyîtiyê (possessive adjectives) nabin temamker (*complement*).

- b) [FN [Diyarkir(Spec)] [N' [N q̄z] [F̄z(Temamker) [īz' [īz -a] [FN(Temamker) [N' [N xal]
 [F̄z(Temamker) [īz' [īz -e] [FN(Temamker) [N' [N' [N bav]] [F̄z(Veser) [īz' [īz -
 ē][FN(Temamker) [N' [N min]]]]]]]]]]]]]]]]]




Şekl 2.12. Dara sentaksê ya "qîza xalê bavê min".

(58)

- a) Qîza xalê bavê min ya li Mêrdînê.

b) [FN [Diyarkir(Specifier)] [N' [N' [N qîz] [Fîz(Temamker) [îz' [îz -a][FN(Temamker) [N' [N xal][Fîz(Temamker) [îz' [îz -e] [FN(Temamker) [N' [N' [N bav]] [Fîz(Veser) [îz' [îz -ê][FN(Temamker) [N' [N min]]]]]]]]]]]]][Fîz(Veser) [îz' [îz ya] [FD li Mêrdînê]]]]]




Şekl 2.13. Dara sentaksê ya "qîza xalê bavê min ya li Mêrdînê".

(59)

- a) *Lawê mezin ê xalê min.⁷³
- b) *[FN [Diyarkir(Specifier)][N' [N' [N' [N law]]][FîZ(Veser)[îz' [îz -ê][FR(Temamker)[R' [R mezin]]]]][FîZ(Veser)[îz' [îz ê] [FN [N' xalê min]]]]]]]

⁷³ Diyalekta kurmancî destûrê nade rîzkirineke wiha.




Şekl 2.14. Dara sentaksê ya "*lawê mezin ê xalê min".

Di mînaka (59)ê de em dibînin ku wextê rengdêr beriya xweyîtiyê (*possessive*) were, îzafeya xweyîtiye dibe veser. Lê em dizanin ku rewşa xweyîtiyê di binyada fraza navdêrî de temamkerê (complement) ava dike. Çawa ku em nabêjin “*qîza mezin a min” lê em dibêjin “qîza min a mezin” divê ev mînak jî wiha be:

(60)


- a) Lawê xalê min ê mezin.
- b) [FN [Diyarkir(Specifier)][N' [N' [N law][F̂z(Temamker)[îz' [îz -ê][FN(Temamker) xalê min]]][F̂z(Veser)[îz' [îz ê] [FR [R' [R mezin]]]]]]]




Şekl 2.15. Dara sentaksê ya "lawê xalê min ê mezin".

(61)

- a) Herdu lawê min ên mezin.
- b) [FN [Dk herdu][N' [N' [N law] [F^z(Temamker)[îz' [îz -êñ][FN(Temamker) xalê min]]][F^z(Veser)[îz' [îz êñ] [FR [R' [R mezin]]]]]]]
- c) Qîzeke min nehatiye.
- d) [R [FN [N' [N Qîz] [F^z [îz' [îz -eke] [FN min]]]]] [FL nehatiye]]



Şekl 2.16. Dara sentaksê ya "herdu lawê xalê min ên mezin".



Şekl 2.17. Dara sentaksê ya "Qîzeke min nehatiye".

Axirî ji mînakan jî diyar dibe ku ïzafe di binyada frazên navdêrî de bi roleke giring radibe. Hemû paşmodîfiyeker bi alîkariya ïzafeyê bi sereyê ve têr girêdan. Modîfiyekerên piştî ïzafeya gireyî wextê rewşa xweyîtiyê (*possessive*) ava dike ew

dibin temamkerên fraza navdêrî. Îzafeya gireyî wextê rengdêrekê bi sereyê ve girêdide, ji ber ku rewşa xweyîtiyê ava nabe, yanî têkîliya di navbera sere û modîfyekera rengdêrî de ne xurt e, bes hin wesfên ekstra yên sereyê dide, ew dibe veser (*adjunct*). Modîfyekerên bi îzafeya serbixwe hatine girêdan jî dibin veser (*adjunct*). Herwiha, ji Şekl 2.17. xuya dibe ku wextê cînav bi îzafeya nenasyar bi sereyê ve bê girêdan, fraza îzafî dibe temamkera sereyê (qîzeke min: *one of my girls/a girl of mine*). Û dîsa em ji mînakîn fehm dikin ku heger em fraza îzafeyê di dara sentaksê de nîşan bidin, binyada frazê zelaltir dibe û tê fehmkirin.

2.2.2. Fraza Daçekî (*Adpositional Phrase*)

Koma daçekan li gorî komên din ên peyvan ên wekî navdêr, rengdêr û lêkeran, komeke biçûk e û girtî ye. Daçek (*adpositions*) navê giştî yê pêşdaçek (*prepositions*)⁷⁴, paşdaçek (*postpositions*)⁷⁵, navdaçek (*inpositions*)⁷⁶ û bazinedaçekan (*circumpositions*)⁷⁷ e. Hemû daçek hewceyî navdêran (*nominal*) in, bêyî navdêr nikarin bi tena serê xwe bisekinin (Brown û Miller, 2013: 13). Koma daçekan ji bo nîşandana têkîliya mekan û zemên têن bikaranîn (li, ji, paş, bi ... re, piştî, berî, berê). Di hin zimanîn de hersê cure daçek jî hene lê di hin zimanîn de hin cure nayêñ dîtin.

Hagége (2010: 8), daçekan wiha pênase dike: “Daçek peyveke rêzimanî ye -dibe ku bê analîzkirin an jî neyê analîzkirin- ku bi hêmaneke din re fraza daçekî (*adpositional phrase, AdpP*) ava dike û bi wê hêmanê re pêwendiyê datîne. Ev peywendî herdu hêmanan ji aliyê rêzimanî û wateyî ve bi hev ve girêdide.” Di fraza daçekî de sere daçek e û hêmana ku dikeve bin hukmê daçekê dibe temamkera (*complement*) frazê. Heger temamker li paş sereyê be, wekî fraza pêşdaçekî (*prepositional phrase*), heger temamker li pêş sereyê be wekî fraza paşdaçekî (*postpositional phrase*). Ji ber ku di kurmancî de bazinedaçek (*circumpositions*) û navdaçek (*inpositions*) jî hene em ê di vê xebatê de bi navê giştî, wekî fraza daçekî behsa mijarê bikin. Ji ber ku di îngilîzî de daçekên zimanê îngilîzî ekserî pêşdaçek in,

⁷⁴ Bo nimûne: bi, li, ji, piştî, paş, ser û hww.

⁷⁵ Paşdaçekên kurmancî piranî tevî paşdaçekê têن bikaranîn, yanî bazindaçekê ava dikin (bi ... **re**, di ... **de**) lê paşdaçekên ku bi tena serê xwe disekinin jî hene. Bo nimûne: Du roj **berê** ez li Mêrdîn bûm.

⁷⁶ Navdaçek dikevin nav du hêmanêñ û hukmê li herdu hêmanan dikin, ev hêman piranî navderekê dubarekîrî ye. Bo nimûne: roj **bi** roj, ref **bi** ref.

⁷⁷ Bazindaçek ji pêşdaçekê û ji paşdaçekê pêk têن. Temamker di navbera herdu daçekan de dimîne. Bo nimûne: **di** dilê min **de**, **bi** min **re**, **ji** te **re**.

di pirtûkên rêzimanî yên îngilîzî de mijar bi sernavê frazêن pêşdaçekî (*prepositional phrases*) têن dayîn.

Pirîcaran, daçek û hoker bi hev têن xelitandin. Hagége (2010: 52), bal kişandiye ser vê mijarê û dibêje gelek zimannasên rojavayî wer dihesibînin ku pêşdaçekên zimanêن Hînd-Ewropî ji hokeran hatine. Herwiha, weku em ê di mijara frazêن hokerî de jî behs bikin, frazêن daçekî pirîcaran dikevin bin kategoriya frazêن hokerî. Lê li vir divê em pê zanibin ku ligel ku hoker dikarin bi tena serê xwe bisekinin jî, daçek hewce bi temamkerê dike. Lewma daçek wekî hokerên gerguhêzkirî (*transitivized adverbs*) an jî hoker wekî daçekên negerguhêz (*intransitivized adpositions*) têن binavkirin. Bo nimûne:

(62)

- a) Piştî hatim ew jî hat.
- b) Piştî hatina min ew jî hat.

Di mînaka (62a)yê de peyva ku demê nîşan dide (piştî) bi lêkere ve girêdayî ye, wextê hatinê nîşan dide, lewma ew hoker e. Di mînaka (62b)yê de lêker hatiye navdêrkirin û bi cînava “min”ê re rewşa ïzafeyê ava kiriye. Ev fraza navdêrî (hatina min) bûye temamkera pêşdaçeka “piştî”yê. Fraza navdêrî (hatina min) ji bo pêşdaçekê bûye bireser (*object*).

Di kurmancî de daçekên herî berbelav daçekên monomorfemîk (*monomorphemic*)⁷⁸ in (li, ji, bi, bê, di ... re, bi ... re, bi ... ve). Digel wan, hin daçekên din jî hene ku carinan du daçek bi hevdu re têن bikaranîn (digel, berî, piştî, li ser, di bin û yd.). Ev daçekên ji yek peyvê zêdetir piranî wekî daçekên hevedudanî (compound) bêñ hesibandin jî fikreke jê cuda heye ku peyva ewîlî pêşdaçek tê qebûlkirin û a din jî tevî peyva din wekî temamkera pêşdaçekê tê hesibandin: 1) [[li] [ser masê]] 2) [[li ser] [masê]]) (Hagége, 2010: 131-2). Li vir armanca me dê ne ew be ku em temamê daçekan rêz bikin an jî wan bisenifînin, em dixwazin binyada frazêن daçekî bêñ fahmkirin ku wextê em rastî fraza daçekî bêñ em karibin wê nas bikin. Lewma, piştî ku em binyada frazêن daçekî fahm bikin, em ê bi dayîna nimûneyan mijarê bidomînin.

⁷⁸ Peyvîn ku ji yek morfemê pêk têن.

Ji ber ku di kurmancî de em rastî xebatekê nehatin ku rêjeya hêmanên temamkerên fraza daçekî diyar dike, em nizanin bê kîjan hêman bi çi rêjeyî tê bikaranîn. Di zimanê ïngilîzî de Hagége (2010: 58) 11 hêmanên temamker ên fraza daçekî li gorî rêjeya bikaranînê wiha rêz dike:

(63)

- i. Cînavêñ kesî (*personal pronouns*)
- ii. Frazêñ navdêrî (*noun phrases*)
- iii. Nîşander (*demonstratives*)
- iv. Cînavêñ nenasnyariyê (*indefinite pronouns*)
- v. Cînavêñ peywendiyê (*relative pronouns*)
- vi. Navdêra lêkerî (*verbal noun*)
- vii. Hevok (*clauses*)
- viii. Diyarkerêñ xweyîtiyê (*possessive markers*)
- ix. Cînavêñ pirsê (*interrogative pronouns*)
- x. Frazêñ daçekî (*adpositional phrases*)
- xi. Têkiliyêñ biker-pêveberê (*subject-predicate associations*)

Wextê em çavekî li mijara fraza navdêrî bigerînin em ê bibînin ku ev 11 hêman hemû di formûla avakirina fraza navdêrî de cih digirin. Lewma bi awayekî zelal em dikarin formûla binyada fraza daçekî ya kurmancî wiha diyar bikin.

(64)

- a) PP → Prep + NP
- b) AdpP → Prep + NP
- c) FD → Dp + FN + (pD)

Herdu formûlên serî (64a,b) formûlên berbelav ên zimanê ïngilîzî ne. Formûla sêyem (64c), formûla frazêñ daçekî yên kurmancî ye. Ji bo ku di kurmancî de frazeke daçekî bê avakirin herî kêm pêşdaçekek û frazeke navdêrî pêwîst e. Heger cureya daçekê bazindaçek be wê çaxê paşdaçeka bazindaçekê tê pişt fraza navdêrî. Digel wê rewşeke awarte ji bo frazêñ daçekî heye ku ew derveyî vê formûlê dimîne. Ev daçekên ku em behs dîkin bêyî temamkerê têni bikaranîn, temamker di axaftinê de an jî di nivîsê de berê hatiye derbirîn û ev daçek amaje bi wê temamkerê dike. Bedirxan û Lescot (1990: 109,247-253) wan wekî daçekên raciviyayî bi nav dîkin.

(65)

- a) pê
- b) jê
- c) lê
- d) pê re
- e) jê re
- f) tê de
- g) tê re
- h) jê ve
- i) pê ve
- j) jev

(66)


- a) Bavê min do çû. Berî ku here ez [pê re] axivim.
- b) Bavê min do çû. Berî ku here ez [bi bavê xwe re] axivim.
- c) Ev çem kûr e. Ez [tê re] derbas nabim.
- d) Ev çem kûr e. Ez [di vî çemî re] derbas nabim.
- e) Xanî gelekî mezin e. [Tê de] her tişt heye.
- f) Xanî gelek mezin e. [Di vî xaniyî de] her tişt heye.

Di mînaka (66a)yê de fraza daçekî (pê re) li fraza navdêrî (bavê min) vedigere.

Yanî meriv dikare vê hevokê wekî (66b)yê jî saz bike. Dîsa mînakê (66c) û (66e) jî dibe ku wekî (66d) û (66f) bêñ sazkirin. Ji ber ku li ser dara sentaksê mînak xweştir têñ nîşandan em ê çend mînakan li ser diyagramê nîşan bidin.

(67)

- a) Ez bi bavê xwe re axivîm.
- b) [R [FN ez] [FL [L' [FD [D' [pD bi] [FN bavê xwe] [Dp re]]] [L axivîm]]]]




Şekl 2.18. Dara sentaksê ya "Ez bi bavê xwe re axivîm".

Di vê mînakê (67) de em dibînin fraza daçekî ji bazindeçkê pêk hatiye û frazeke navdêrî xistiye bin hukmê xwe, yanî fraza navdêrî bûye temamkera wê (FN qîza D-Barê û xwişka sereyê "pD, Dp" ye). Herwiha, fraza daçekî (FD) temamkera fraza lêkerî (FL) ye.

(68)

- a) Ew du sal berê li Mêrdînê bû.
- b) [R [FN Ew] [FL [L' [FD [D' [FN du sal] [Dp berê]]] [L' [FD [D' [pD li] [FN Mêrdînê]]] [L bû]]]]]




Şekl 2.19. Dara sentaksê ya "Ew du sal berê li Mêrdînê bû".


Di mînaka (68)ê de em digel fraza daçekî ya ku temamker li paş pêşdaçekê (pD) ye (li Mêrdînê), em fraza daçekî ya ku temamker li pêş paşdaçekê (Dp) ye jî (du sal berê) dibînin.

(69)

- a) Pirtûka min li malê li ser masê di qutiya biçûk de ye.
- b) [R [FN [Diyarkir(Spec)] [N' [N Pirtûk][F¹z [îz' [îz -a] [FN min]]]]] [FL [L' [FD [D' [pD li] [FN malê]]] [L' [FD [D' [pD li ser] [FN masê]]] [L' [FD [D' [pD di] [FN qutiya biçûk] [Dp de]]][L ye]]]]]]]
- c) [R [FN [Diyarkir(Spec)] [N' [N Pirtûk][F¹z [îz' [îz -a] [FN min]]]]] [FL [L' [FD [D' [pD li] [FN malê]]] [L' [FD [D' [pD li] [FD [D' [pD ser] [FN masê]]]]] [L' [FD [D' [pD di] [FN qutiya biçûk] [Dp de]]][L ye]]]]]]]



Şekl 2.20. Dara sentaksê ya (69b)yê: "Pirtûka min li malê li ser masê di qutiya biçûk de ye".




Şekl 2.21. Dara sentaksê ya (69c)yê: "Pirtûka min li malê li ser masê di qutiya biçûk de ye."


Di van herdu mînakên (69b,c) de, me xwest em fraza daçekî ya ku bi pêşdaçeka ji du peyvan pêk hatiye (li ser masê) bi diyagramê nîşan bidin. Di mînaka (69b)yê de pêşdaçek (li ser) wekî pêşdaçeka hevedudanî hatiye qebûlkirin, lewma sere "li ser" e û temamkera fraza daçekî jî "mase" ye. Di mînaka (69c)yê de "li" û "ser" wekî du pêşdaçekên cuda hatine qebûlkirin. Lewma sereya frazê "li" ye û temamkera fraza daçekî frazeke din a daçekî (ser masê) ye. Sereya fraza temamker jî "ser" e û temamkera wê jî fraza navdêrî "mase" ye. Herwiha, em dibînin ku wextê di hevokê de ji yekê bêtir frazên daçekî hebin, a nêzî pêveberê (li vir pêveber kopûla ye) dibe temamkera pêveberê.

(70)

- a) Pirtûka li malê ya li ser masê ya di qutiya biçûk de.
- b) [FN [Diyarkir(Spec)] [N' [N' [N' [N Pirtûk]] [F̂z [īz' [īz -a] [FD [D' [pD li] [FN malê]]]]]]] [N' [F̂z [īz' [īz' [īz ya] [FD [D' [pD li] [FD [D' [pD ser] [FN masê]]]]]]] [N' [F̂z [īz' [īz ya] [FD [D' [pD di] [FN qutiya biçûk] [Dp de]]]]]]]]]
- c) [FN [Diyarkir(Spec)] [N' [N' [N' [N pirtûk]] [F̂z [īz' [īz -a] [FD [D' [pD li] [FN malê]]]]]]] [N' [F̂z [īz' [īz' [īz ya] [FD [D' [pD li ser] [FN masê]]]]] [N' [F̂z [īz' [īz ya] [FD [D' [pD di] [FN qutiya biçûk] [Dp de]]]]]]]]]



Şekl 2.22. Dara sentaksê ya (70b)yê: "Pirtûka li malê ya li ser masê ya di qutiya bîçûk de."




Şekl 2.23. Dara sentaksê ya (70c)yê: "Pirtûka li malê ya li ser masê ya di qutiya bîçûk de."

Di mînakên (70a,b)yê de hemû frazên daçekî bi ïzafeyê bi sereyê ve hatine girêdan. Hersê frazên daçekî jî ji bo ïzafeyê temamker in lê wextê bi ïzafeyê bi sereya fraza navdêrî ve têrî girêdan dibin veserên sereyê. Hersê frazên daçekî jî cihê sereyê nîşan didin û dikarin bi hev bêr guherîn an jî ji frazê bêr derxistin. Di herdu

diyagramên (Şekl 2.21., Şekl 2.22.) ji hev cuda de jî temamker û veser bi zelalî xuya dibin.

(71)

- a) Li mala ku em lê raketin.
- b) [FD [Diyarkir(Spec)][D' [pD li] [FN [N' [N' [N mal]]] [F^z [îz' [îz -a] [FTk [Tk' [Tk ku] [R [FN em] [FL [L' [FD lê] [L raketin]]]]]]]]]]]



Şekl 2.24. Dara sentaksê ya "Li mala ku em lê raketin".

Axirî, em ji mînaka dawî (71) û yên berî wê jî fahm dikin ku di fraza daçekî de daçek sere ye û ev sere hukmê li ser temamkera xwe dike. Temamker herî kêm divê ji navdêrekê (*nominal*) pêk be lê dikare hemû hêmanên fraza navdêrî (FN) bihewîne jî.

2.2.3. Fraza Hokerî (*Adverbial Phrases*)

Hoker (*adverbs*) gelempêrî rewşa kiryarê (kar, lêker) rave dike: li ku diqewime (li vir, li jor, cem, jêr û yd.), kengî diqewime (sibê, carinan, qet, pirîcaran û yd.) an jî çawa diqewime (bi lez, baş, xweş,bihêrs û yd.) (Trask, 2007:6-7). Di eslê xwe de hoker û rengdêr navdêr in û li gorî fonksiyona xwe ya di risteyê de dibin rengdêr an jî

hoker (Badıllı, 1965: 73). Çawa ku di zimanê îngilizî de gelek rengdêr bi paşgira “-ly”yê dibin hoker, di kurmancî de jî gelek rengdêr bi pêşdaçeka “bi”yê fonksiyona hokerê werdigirin. Hin rengdêr digel pêşdaçekê paşgira “-î”yê jî werdigirin⁷⁹: hesan > bi hesanî, lez > bi lez. Herwiha gelek rengdêr bêyî ku rastî guherînên teşeyî bêñ dikarin di risteyê de bi fonksiyona hokerê rabin. Digel ku rengdêr bes navdêran modîfiye dikan, hoker dikarin rengdêr, hoker û lêkeran modîfiye bikin.

Givon (2001a: 49-87) ji bo koma hokeran dibêje koma leksîkal a herî ne gerdûnî koma hokeran e û heft cureyên hokeran diyar dike:

(72)

- i. Hokerên şêweyî (*manner adverbs*): Şêweya kirina karî derdibire. Bersiva “çi”yê dide. Mînak: zû, dereng, xweş ...
- ii. Hokerên navgînî (*instrumental adverbs*): Dişibin hokerên şêweyî lê digel ku hokerên şêweyî razbertir in, hokerên navgînî şenbertirin. Mînak: bi avê, bi kêrê ...
- iii. Hokerên dem û xuyangê (*time and aspectuality adverbs*): pirîcaran, hertim, carcaran, sibê, nîvro, iro, sêşemê ...
- iv. Hokerên agahiyî (*epistemic adverbs*): teqez, belkî, dibe ku, bêşik ...
- v. Hokerên hewceyî-nirxdarkirinê (*deontic-evaluative adverbs*): bi xêr, ji bo Xwedê, divê ...
- vi. Hokerên ku rengdêran modîfiye dikan: gelekî, pir, zêde ...
- vii. Hokerên kirpandî (*emphatic adverbs*): tenê, heqeten, bi rastî, rasterast ...

Ji senifandina Givon (2001a: 87-94) jî diyar dibe ku sînorêñ koma hokeran ne zelal in. Lewma Tallerman (2015: 64-5) balê dikişîne ser gengeşıya frazêñ hokerî ku carinan wekî frazêñ navdêrî carinan jî wekî frazêñ daçekî xuya dikan:

(73)

- a) Sibê xweş dixuyê.
- b) Em sibê diçin.
- c) Em ê hefteya bê bi dîqetî plan bikin.
- d) Em ê hefteya bê herin.

⁷⁹ Rewşa navgînî (*instrumental case*).


Ji bo xelitandina bi frazê navdêrî, pîvanek heye ku demilstest diyar dibe bê ew heman navdêr e an hoker e. Frazê navdêrî dikarin bibin biker (*subject*), berkara rasterast (*direct object*) û temamkera fraza daçekî (Tallerman, 2015: 65). Di mînaka (73a)yê de navdêr (sibê/sibe) biker e lê di mînaka (73b)yê de heman navdêr ji aliyê demê ve lêkerê modîfiye dike. Dîsa di mînaka (73c)yê de fraza navdêrî (hefteya bê) berkara risteyê ye lê di mînaka (73d)yê de lêkerê ji aliyê demê ve modîfiye dike. Axirî, cureya peyvê her ci be jî hoker bi fonksiyoneke peyvrêziyî radibe ku hevaltiya lêkerê dike.⁸⁰ Lewma divê em bala xwe bidin fonksiyona hêmanê û bi awayî hokerê ji navdêrê cuda bikin.

Derbarê hokerên ku bi daçeka “bi”yê hatine avakirin, divê meriv ewilî senifandinekê bike ku hoker û frazê daçekî bi hev neyên xelitandin. Çawa ku me di mijara frazê daçekî de jî diyar kir, fraza daçekî ji pêşdaçek (an jî paşdaçek) û fraza navdêrî pêk tê û fraza navdêrî temamkera pêşdaçekê ye. Û divê neyê jibîrkirin ku navdêra pişî daçekê dikeve rewşa tewangê (*oblique case*), li gorî zayend, jimar û nasyariyê gireyên tewangê werdigire. Lê di van hokeran de xuya dibe ku piştî pêşdaçekê rengdêr cih digire, ne navdêr û em dizanin ku rengdêr nakevin rewşa tewangê. Bo nimûne:


(74)

- a) Ew [bi derengî] çû.
- b) [R [FN Ew][FL[L[FH bi derengî][L[L çû]]]]]
- c) Min [bi xweşî] ji te re got.
- d) [R [FN Min][FL[L[FH bi xweşî][L[FD ji te re][L got]]]]]
- e) Ew [ji dil] hez dike.
- f) [R [FN Ew][FL[L[FH ji dil][L[L hez dike]]]]]
- g) Ez [bi lez] hatim.
- h) [R [FN Ez][FL[L[FH bi lez][L[L hatim]]]]]


⁸⁰ Di rêzimanên kurmancî de ji bo vê cureyê hem hoker hem jî hevalkar têbikaranîn.




Şekl 2.25. Dara sentaksê ya "Ew bi derengî çû".



Şekl 2.26. Dara sentaksê ya "Min bi xweşî ji te re got".



Şekl 2.27. Dara sentaksê ya "Ew ji dil hez dike".



Şekl 2.28. Dara sentaksê ya "Ez bi lez hatim".

Di her çar mînakan (74) de jî tê dîtin ku fraza hokerî veser (*adjunct*) e, ne temamker e, yanî heger meriv fraza hokerî ji risteyê derxe binyada risteyê xera nabe û wateya sereke tê fehmkirin. Herwiha ji mînaka (Şekl 2.26.) xuya dibe ku peyva piştî pêşdaçekê natewe (ji dil). Heger em navdêrê bitewinîn bikin (ji dilî), wê çaxê em ê bibînin ku ev hêman êdî ne fraza hokerî ye, ew êdî fraza daçekî ye û dibe berkara risteyê (Ez ji dilî hez dikim).

Digel wan, frazên daçekî jî dikarin hevaltiya lêkerê bikin ku ew di eslê xwe de ne hoker bin jî di risteyê de bi fonksiyona hokerî radibin. Lewma hemû hêmanên ku bandorê li lêkerê dikin wekî hokerî (adverbial) têن qebûlkirin (Delahunty û Garvey, 2010: 280; Tallerman, 2015: 65). Delahunty û Garvey ji bo mijar bê fahmkirin, van mînakan didin:

(75)

- a) *She drove with great caution.*⁸¹
- b) *She drove cautiously.*⁸²

Di mînaka (75a)yê de fraza daçekî "with great caution" (bi dîqetekê mezin) ji sê hêmanan pêk hatiye. Piştî pêşdaçekê fraza navdêrî hatiye û fraza navdêrî jî li gorî rê û rîbazêن xwe ava bûye. Lê wextê em li mînaka (75b)yê binêrin, em dibînin kî hokerek xwerû "cautiously" hevaltiya lêkerê dike. Belkî ji ber ku daçeka kurmancî (bi dîqetî) bi alîkariya pêşdaçeka "bi"yê ava bûye, dibe sedeme xelitandina bi fraza daçekî re.

⁸¹ Wê bi dîqetekê mezin (erebe) ajot.

⁸² Wê bi dîqetî (erebe) ajot.

Fraza daçekî (bi dîqeteke mezin) herçiqas ji aliyê çawaniyê lêkerê “modifiye bike jî ew di eslê xwe de ne fraza hokerî ye.

Ev rewş ji bo frazên daçekî yên ku mekanê nîşan didin jî derbasdar e. Ev frazên daçekî ji aliyê nîşandana cih ve hevaltiya lêkerê bikin jî ew di eslê xwe de frazên daçekî ne. Bo nimûne:

(76)

- a) Ez li malê şivê dixwim.
- b) Ez ji Mêrdînê hatim.

Di kurmancî de hin hoker dikarin bêñ serê risteyê (piranî) û nêrîna axêver nîşan bidin. Bereksî hokerên asayî ku hin rewşen kar dişayesînin, ev hoker ji aliyê demê ve bandorê li risteyê dikin (înşallah, belkî, qaşo, teqez, bêşik, helbet, û yd.). Ev rewşa ku bi van hokeran ava dibe wekî rewşa “*irrealis*” tê binavkirin ku rûdanê dixe rewşeye xeyalî an jî hê pêknehatiye (Givon, 2001a: 305-6; Mithun, 1999: 173).

(77)

- a) Erebeyeke nû kirî.
- b) Qaşo, erebeyeke nû kirî.

Frazên hokerî dikarin bêñ modifiyekirin. Çawa ku di frazên din de jî eynî ye, di fraza hokerî de jî navê cureya sereyê navê frazê diyar dike. Yanî di fraza hokerî de sere hoker e. Di frazên hokerî de fraz dikare bes ji hokerekê pêk be an jî ji aliyê hêmanên xurtkirinê (*intensifiers*)⁸³ û hokerên pileyî (*degree adverbs*) ve bêñ modifiyekirin. Lê di eslê xwe de hêmanên xurtkirinê (*intensifiers*) ji hokerên pileyî ne (Brown û Miller, 2013: 232). Lewma formûla avakirina fraza hokerî wiha tê nîşandan (Delahunty û Garvey, 2010: 280-1).

(78)

- a) AdvP → (Int) + (Adv) + Adv
- b) AdvP → (Adv) + Adv

Li gorî vê, di zimanê îngilîzî de hoker dikarin pêşmodifiyekeren wergirin lê ne mecbûrî ye. Di kurmancî de jî çawa ku me berê jî behs kir, heger em hokerên bi

⁸³ Zêdeker (*amplifiers*): Bêguman, miheqeq, bivênevê, temamî, gelekî, herî û hww. Kêmker (*downtoners*): kêmî, hinekî, piçekî, bes, hew û hww.

pêşdaçeka “bi”yê sazkirî wekî hokera serbixwe qebûl bikin (divê em qebûl bikin), binyada fraza hokerên kurmancî jî dê wekî ya zimanê îngilîzî be:

(79)

$$FH \rightarrow (H) + H$$

Bi vî awayî, em dibînin ku binyada fraza hokerî gelekî zelal e. Lê ji ber ku hin hoker ne xwerû ne, pêkhatî ne, lewma senifandina wan hinekî zehmet e, diyarkirina frazêن hokerî jî carinan zehmet dibe. Fraza hokerî herî kêm ji hokerekê pêk tê û dikare hokeran, rengdêran û lêkeran modîfiye bikin. Gelempêrî di risteyê de wekî veser (*adjunct*) xuya dixin. Lewma, wextê meriv wan ji risteyê derxîne jî riste ji aliyê wateyê ve xera nabe.

2.2.4. Fraza Rengdêrî (*Adjectival Phrase*)

Pênaseya herî zelal ya rengdêran (*adjectives*) wiha dikare bê kirin: Ew pevv in ku navan diwesfinin, taybetmendiyêن wan diyar dikan an jî derbarî wan de agahiyêن ekstra didin. Quirk û yd. (1985: 402-3) ji bo nasîna rengdêran çar krîter diyar kirine: 1) Bi awayekî azad dikarin navdêran modîfiye bikin (sêva sor, deriyê mezin). 2) Bi awayekî azad dikarin fonksiyona pêveberê bigirin ser xwe (sêv sor e, derî mezin e). 3) Dikarin bi hêmanêن xurtkirinê (*intensifier*) bêñ modîfiyekirin (sêva gelekî xweş, deriyê hinekî mezin). 4) Dikarin têkevin şeklê berawirdî (*comparative*) û sûperlatîv (*superlative*) (sêv sortir e., deriyê mezintirîn). Di binavkirina van de hin cudahiyêن biçûk hebin jî cureyêن rengdêran ên ku koma rengdêran ava dikan ev in:

(80)

- a) Rengdêrîn raveker (*descriptive*): mezin, kesk, dewlemend...
- b) Rengdêrîn navêñ taybet (*proper adjectives*): kurd, çînî, emerîkî...
- c) Rengdêrîn nîşander (*demonstrative*): ev, ew, vî, wî, wê, wan, van.
- d) Rengdêrîn hejmarî (*quantitative*): pênc, bîst, duyem, dehem, hinek, gelek...
- e) Rengdêrîn dabeşker (*distributive*): her, hemû, tu...
- f) Rengdêrîn pirsê (*interrogative*): çi, kîjan...
- g) Rengdêrîn xweyîtiyê (*possessive*): -a min, -ê te...
- h) Rengdêrîn baneşanî (*exclamatory*): çi, çito, çawa...
- i) Rengdêrîn danberhevî (*comparison*): xweşiktir, mezintir...

- j) Partîsîp (*participle*): hatî, çûyî, mirî... (Bedirxan, 1998: 89; Thomson û Martinet, 1986: 22; Jitpranee, 2017: 60-1;)

Di her zimanî de dibe ku cureyên rengdêran zêdetir an jî kêmtil bin. Bo nimûne çawa ku me berê jî behs kiribû, di kurmancî de rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) bi alîkariya îzafeya gireyê ava dibe (mal-a min: *my house*). Lewma hazir mijar hate ser, em dixwazin dubare bikin, ji ber ku mijarênen zimanê kurmancî kûr nehatine vekolîn, di senifandina komên peyvan de jî gelekî kêmasiyêne me hene û ew jî dibe astengî ji bo xebatêni bihûrgilî. Lê li vir ji ber ku mijara me ne senifandina peyvan e, lê famkirina binyada frazan e, ne ku em ê rabin yek bi yek rengdêran û cureyên wan nîşan bidin. Bi kurtasî em dikarin derbarî rengdêrên kurmancî de bêjin ku rengdêrên xwerû, lêkdayî û yên hevedudanî hene. Rengdêrên kurmancî ne peyvên guherbar in, yanî li gorî zayend, hejmar an jî nasyariyê teşeya rengdêrê naguhere.

Ji ber ku hin peyv hem dikevin koma rengdêran hem jî dikevin koma hokeran, pirîcaran rengdêr bi hokeran ve tênen xelitandin. Lê wextê peyv di riste an jî frazê de bê bikaranin, bi fonksiyona xwe diyar dibe bê rengdêr e yan hoker. Bo nimûne:

(81)

- a) Rê vekirî bû, ez di riyeke xweş de hatim.
- b) Rê vekirî bû, ez xweş hatim.

Fonksiyona rengdêrê ew e ku navdêran modîfiye bike. Di mînaka (81a)yê de tê dîtin ku “rê” bi rengdêra “xweş”ê ve hatiye modîfiyekirin. Lê wextê em li mînaka (81b)yê binêrin em dibînin heman peyv “xweş” bi fonksiyona hokerê rabûye û lêkerê modîfiye dike.


Rengdêr piranî bi rîya îzafeyê bi navdêrekê ve tê girêdan û dibe vesera (*adjunct*) sereya fraza navdêrî. Herwiha, digel îzafeyê, rengdêr dikarin bibin temamkera (*complement*) kopûlayê jî (Brown û Miller, 2013: 11). Wextê rengdêr dibin temamkera kopûlayê tênen beriya kopûlayê û di wî awayî de jî hemû taybetmendiyêne xwe hildigirin, li navdêran vedigerin û wan modifiye dikin:

(82)


- a) Mala me ya nû.
- b) [FN [N' [N' [N' [N mal]] [Fîz -a me]] [Fîz [îz' [îz ya] [FR nû]]]]]

c) Mala me nû ye.

d) [R [FN [N' [N' [N mal]]][F̂z -a me]]] [FL [L' [FR nû] [L ye]]]]



Şekl 2.29. Dara sentaksê ya "mala me ya nû".



Şekl 2.30. Dara sentaksê ya "mala me nû ye".


Di dara sentaksê ya “Şekl 2.29.”ê de rengdêra “nû”yê temamkera fraza ïzafeya serbixwe ye û di “Şekl 2.30”î de jî temamkera kopûlayê ye. Di herdu risteyan de jî rengdêr sereyê modîfiye dikin, wê diwesfînin. Lê em dibînin ku di herdu risteyan de jî rengdêr ji bo sereyê veser in (*adjunct*). Herwiha, me berê jî gotibû ku cînavêñ tewandî yêñ kurmancî wextê bi ïzafeya gireyî bi navdêrekê ve dizeliqin bi fonksiyona rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) radibin. Lewma, herçi me ji serî heta niha ew wekî fraza ïzaffi bi nav kiribin jî, di eslê xwe de meriv wan bi kategoriya wan ve etîket bike dê baştir be.

Di kurmancî de rengdêr piranî paşmodîfiyeker in lê hin cureyêñ rengdêran dikarin bibin pêşmodîfiyeker û bêñ pêşıya navdêrê. Rengdêrên hejmarî, nîşander û namdarî ew cure rengdêr in ku dibin pêşmodîfiyeker. Herwiha, kurmancî destûrê dide

ku modîfiyekera rengdêrî ji peyvekê zêdetir be. Yanî em dikarin ji yekê zêdetir rengderan bi hev ve girê bidin. Ji bo girêdanê gihaneka “û”yê tê bikaranîn.

(83)

- a) Alaya kesk û sor û zer.
- b) [FN [N' [N' [N Ala]][F¹z [îz' [îz (y)-a] [FR [R' [R' [R kesk]] [FGih [Gih' [Gih û] [FR [R'
[R' [R sor]] [FGih [Gih' [Gih û] [FR zer]]]]]]]]]]]
- c) Televîzyona res û sipî.
- d) Xortê jîr û jêhatî.
- e) Pirtûka qalind û giran.
- f) Hespê gewr û beza.



Şekl 2.31. Dara sentaksê ya "alaya kesk û sor û zer."

Di mînakên (83)yê tê dîtin ku rengdêr bêyî problem bi gihanekê “û”yê dikarin bi hev ve bêñ girêdan lê wextê em ji aliyê wateyê lê binêrin wer dixuyê ku her rengdêr taybetiyeke cuda li navdêrê bar dike (bnr. Şekl 2.31.). Bülbül (2017: 104), jî behsa vê

rewşê kiriye û ev mînak daye “sêvên sor û buha kiribûn”. Di vê mînakê de jî diyar dibe ku sêv hem sor in hem jî buha ne. Herwiha, Bülbül behsa hiyerarşıya vê rewşê jî dike û dibêje fokûs li ser rengdêra nezî sereyê ye.

Digel van, weku me di mijara îzafeyê de behs kiribû (bnr. Tablo 2.1.2.), di kurmancî de ji bilî îzafeya standard, bikaranîneke din ya îzafeyê heye ku Açar (2014) vê mijarê wekî “wesfandina ravekê bi rengdêran ve” bi nav dike. Li vir, ji ravekê meqsed ew e ku berî rengdêrê îzafeyeke gireyî heye. Li gorî Açar ev veqetandekên serbixwe (e: mî, yekjimar, nasyar; î: nîr, yekjimar, nasyar; ne: pirjimar, nasyar) “yekbûn”a sereyê nîşan didin. Bo nimûne:

(84)

- a) Xwişka min e xweşik. (*My beautiful sister.*)
- b) Birayê te yî hêja. (*Your dear brother.*)
- c) Hevalên min ne delal. (*My cute friends.*)

Wextê meriv van mînakan bi îzafeya standard berawird bike, xuya dibe ku Açar di îdîaya xwe de biheq e. Beramberî “xwişka min a delal” ku em ji risteyê fehm dikin ji yekê zêdetir xwişk hene û em ji nav wan behsa ya xweşik dikin, risteya “xwişka min e delal” pirbûnê idîa nake, berevajî wê, wateya “yekbûn”a sereyê xurt dike. Lê em dibînin ku hemû mînak bi rengdêrên xweyîtiyê (*possessive adjectives*) ava bûne. Wextê rewşa xweyîtiyê bi navekî ava bikin, riste hinekî ecêb tê guhê meriv:

(85)

- a) *Xwişka Zozanê ye xweşik. (*Zozan's beautiful sister.*)
- b) *Birayê mamosteyî yî hêja. (*Teacher's dear brother.*)
- c) *Hevalên Azadî ne delal. (*Azad's cute friends.*)

Wer dixuyê ku wextê rewşa xweyîtiyê bi navdêran pêk bê û rewşa xweyîtiyê li pêsiya rengdêrê be risteyeke ne rêzmanî dertê holê. Dema ku em rengdêrê bînin pêsiya rewşa xweyîtiyê dîsa îzafeya standard tê bikaranîn ku jixwe êdî rewşa “wesfandina ravekê bi rengdêran ve” ji holê radibe:

(86)

- a) Xwişka xweşik a Zozanê. (*The beautiful sister of Zozan.*)
- b) Birayê hêja yê mamosteyî. (*The dear brother of teacher.*)

c) Hevalên delal ên Azadî. (*Cute friends of Azad.*)

Di kategoriya rengdêran de mijareke din heye ku di gelek zimanan de hê nehatiye saffikirin. Weku me gotî, rengdêr di nav xwe de li gorî wateya wesfandinê dibin bes û ji ber ku meriv dikare di fraz an jî risteyekê de ji yekê zêdetir rengdêran li dû hev bi kar bîne, rêza rîzkirina rengdêran di bin sernavê rengdêran de babeteke serbixwe ye. Di zimanê îngilîzî de rêza rengdêran wiha tê diyarkirin:

(87)

- i. Çendanî/Hejmar (*quantitiy/number*): çar, deh, hin, gele...⁸⁴
- ii. Fikir (*opinion*): xweşik, balkêş, gêj, bikêf...
- iii. Qebare (*size*): biçûk, zirav, mezin, qelew, dirêj...
- iv. Temen (*age*): ciwan, kal, pîr...
- v. Şekl (*shape*): nerm, hişk, cargoşe, rast, xwar...
- vi. Reng (*color*): reş, kesk, zer...
- vii. Binyat/Esl (*origin*): kurd, emerîkî, rojavayî...
- viii. Materyal (*material*): polayî, hesinî, çermîn...⁸⁵
- ix. Mebest (*purpose*): wedding, running, sleeping...⁸⁶ (Thomspón û Martinet, 1986: 23-4; Berk, 1999: 180 vghz. Bülbül, 2017: 102; Endley, 2010: 96 vghz. Bülbül, 2017: 102; Murphy û Altman, 1998: 182)

Helbet belkî ne mimkin be ku meriv di carekê de hemû cureyên rengdêran li pey hev rêz bike lê di zimanê îngilîzî de rîzkirina rengdêran bi vî awayî ye. Di rîzkirina rengdêran de heger du rengdêren ji heman cureyê hebin, li dû hev têr rîzkirin an jî bi gihaneka “û”yê bi hev têr girêdan.

(88)

- | | | | | | |
|--------|------------------|------------|--------------|-----------------|------------|
| a) a | <i>beautiful</i> | <i>big</i> | <i>black</i> | <i>American</i> | <i>car</i> |
| b) yek | xweşik | mezin | reş | emerîkî | erebe |

⁸⁴ Digel ku di rîzimana klasîk de wekî rengdêr têr qebûlkirin jî, di xebatêr modern de ew wekî diyarker (*determiner*) têr hesibandin (Huddleston û yd., 2022: 89).

⁸⁵ Di kurmancî de navê materyalan rasterast wekî rengdêr jî têr bikaranîn. Bo nimûne: Deriyê hesin. Sifreya zîv. Bazinê zér.

⁸⁶ Ligel ku di zimanê îngîlîzî de partîsîp (*participle*) bi paşgiran (-ed, -ing) çêdibin (Biber û yd., 2003: 191), di kurmancî de bes bi paşgira “-î”yê partîsîp çêdibin. Lewma berevajî zimanê îngîlîzî, lêkerên ku paşgira “-ing”yê gitine di kurmancî de wekî navdêr têr bikaranîn: Sola bazdanê (*running shoes*), Saetên serdanê (*visiting hours*).

(89)

- a) Erebeyeke reş û mezin û xweşik û emerîkî
- b) Erebeyeke emerîkî ya mezin, reş û xweşik
- c) Erebeyeke emerîkî ya mezin û reş û xweşik
- d) Erebeyeke mezin, reş, xweşik a emerîkî
- e) Erebeyeke mezin, reş, xweşik û emerîkî
- f) Erebe mezin, reş, xweşik û emerîkî ye.
- g) Erebe mezin û reş û xweşik û emerîkî ye.

Wer dixuyê ku di kurmancî de rêzkirineke hişk wekî ya zimanê îngilîzî tune. Bi hin cudahiyên biçûk hema bêje hemû mînak bi heman wateyê têr rêzkirin. Bülbül (2017: 102-3) jî bal kışandiye ser vê meseleyê û li gorî tesbîten wî jî di kurmancî de rêza rengdêran ne sistematîk e. Lê dibêje wer dixuyê ku rengdêra binyat/esl (*origin*) û materyal (*material*) nêzîktirî sereyê ne. Herwiha, ji mînakên (89)ê diyar dibe ku heger em rengdêran bi gihaneka “û”yê bi hev ve girêbidin (bnr. 89a) an jî bi bêhnokê ji hev bêr veqetandin hiyerarşıya rengdêran ji holê radibe.

(90)

- a) AdjP → (AdvP) + Adj
- b) FR → (FH) + R

Axirî, em têdigihêne ku rengdêr derbarê navdêran de agahiyên ekstra didin me lewma di fraza navdêri de veser (*adjunct*) e. Lê wextê bi fonksiyona pêveberê radibe, bi kopûlayê re tê bikaranîn, dibe temamkera (complement) kopûlayê. Yanî heger em rengdêre ji risteyê derxin, binyad û wateya risteyê xera dibe. Em dikarin rengdêran bi alîkariya hêmanên xurtkirinê (intensifier) modifiye bikin ku ev hêman bi fonksiyona hokerê radibin. Lewma em forumûla binyada fraza navdêri li gorî (90b)yê saz dikan.

2.2.5. Fraza Lêkerî (*Verb Phrase*)

Fraza lêkerî (FL) yekîneyeke binyada risteyê ye ku ji lêkerekê û hêmanên din ên girêdayî wê pêk tê. Di rêzimana klasîk de riste bi biker û pêveberê tê perçekirin lê di xebatêr modern de perçeyê ku wekî biker tevdigere dibe fraza navdêri (FN) û perçeyê ku perçeyekê pêveberê temsîl dike dibe fraza lêkerî (FL). Di fraza lêkerî de hertim lêkerek heye û ew lêker sereya frazê ye. Herwiha, gelempêrî hin hêmanên din (berkara rasterast, berkara nerasterast) jî bi lêkerê ve têr girêdan (Trask, 2007: 317). Hin ji van

hêmanan dabin temamker (*complement*) û hin jî dabin vesera (*adjunct*) lêkerê. Digel wê, dibe ku hin lêkerên alîkar jî besdarî fraza lêkerî bibin (Brown û Miller, 2013: 463).

Cihê temamker, veser û lêkerê li gorî binyada peyvrêziya zimanân diguhere. Bo nimûne zimanê îngilîzî ku risteyên wê bi SVOyê⁸⁷ ava dabin lêker tê beriya berkarê (bnr. 91a). Kurmancî ku gelempêrî risteyê wê bi SOVê⁸⁸ saz dabin, lêker diçê paşıya berkara rasterast (bnr. 91b) û wextê berkara nerasterast di risteyê de hebe, lêker tê pêşîya berkara nerasterast.

(91)


- a) $SVO: S \rightarrow NP + VP$
 $VP \rightarrow V + NP$
BiLBe: $R \rightarrow FN + FL$
 $FL \rightarrow L + FN$
- b) $SOV: S \rightarrow NP + VP$
 $VP \rightarrow NP + V$
BiBeL: $R \rightarrow FN + FL$
 $FL \rightarrow FN + L$

(92)


- a) *I ate an apple.*
- b) [BiLBe(SVO) [Biker [FN[N' [N I]]]] [Pêveber [FL [L' [L ate][FN an apple]]]]]
- c) Min sêvek xwar.
- d) [BiBeL(SOV) [Biker [FN[N' [N min]]]] [Pêveber [FL [L' [FN sêvek][L xwar]]]]]

⁸⁷ Biker + Lêker + Berkar.

⁸⁸ Biker + Berkar + Lêker.



Şekl 2.32. Dara sentaksê ya BiLBe(SVO)yê. "I ate an apple."



Şekl 2.33. Dara sentaksê ya BiBeL(SOV)ê. "Min sêvek xwar."

Tallerman (2015: 40-2) dibêje di her zimanî de lêker li gorî têkîliyên di nava risteyê de dikevin bin sernavan. Ji van sernavan jî behsa sê beşên berbelav dike: lêkerên negerguhêz (*intransitive verbs*), lêkerên gerguhêz ([*mono*]*transitive verbs*) û lêkerên cotgerguhêz (*ditransitive verbs*). Lêkerên negerguhêz bes argûmentekê (*argument*) werdigire, ew jî biker e (bnr. 93a,b). Lêkerên gerguhêz hewce bi du argûmentan dike; biker û berkar (bnr. 93c,d). Lêkerên cotgerguhêz jî sê argûmentan werdigirin; biker, berkar û berkara nerasterast (bnr. 93e,f). Lê gelek lekêrên cot gerguhêz dikarin wekî lêkerên gerguhêz jî bêñ bikaranîn (bnr. 93g):

(93)


- a) **Serhedo** pişkiya.
- b) **Zozan** qîriya.
- c) **Serhedo şibake** şikand.
- d) **Zozan avê** vedixwe.

- e) **Min nameyek da Zozanê.**
- f) **Serhedo jê re pirtûk xwend.**
- g) **Serhedo pirtûk xwend.**

Nasîna cureyên lêkeran giring e ji bo meriv zanibe bê kîjan perçe temamker e û kîjan perçe vesera (*adjunct*) fraza lêkerî ye. Ji ber ku argûment perçeyên mecbûrî yên risteyê ne, em ê berkara lêkera gerguhêz û berkar û berkara nerasterast a lêkera cotgerguhêz wekî temamker nîşan bidin. Herwiha, berkara nerasterast a lêkera negerguhêz jî temamkera lêkerê ye (bnr. 94c). Helbet her ku riste ji aliyê teşeyê ve dirêjtir û ji aliyê wateyê ve firehtir bibe hêmanên din beşdarî binyada risteyê dixin. Hin ji van hêmanan beşdarî fraza lêkerî dixin ku piranî lêkerê ji aliyê çawanî û cih ve modîfiye dikin. Li vir, fraza hokerî û fraza daçekî bi vê fonksiyona modîfiyekerinê radibin. Ji mijarên berê jî êdî em dizanin ku hêmanên derbarê sereyê de agahiyên ekstra didin me, yanî ew hêmanên ku em dikarin wan ji risteyê derxin, dixin vesera (*adjunct*) sereyê.


(94)

- a) Serhedo hêdîka pişkiya.
- b) [R [FN Serhedo] [FL [L' [FH hêdîka] [L' [L pişkiya]]]]]
- c) Zozan çû malê.
- d) [R [FN Zozan] [FL [L' [L çû] [FN malê]]]]
- e) Zozan dizîka çû malê.
- f) [R [FN Zozan] [FL [L' [FH dizîka] [L' [L çû] [FN malê]]]]]
- g) Serhedo li Mêrdînê piştî nîvro bi kêfxweşî derket ser dikê.
- h) [R [FN Serhedo] [FL [L' [FD li Mêrdînê] [L' [FD piştî nîvro] [L' [FH bi kêfxweşî] [L' [L derket] [FD ser dikê]]]]]]]
- i) Ew mamoste ye.
- j) [R [FN Ew] [FL [L' [FN mamoste] [L ye]]]]
- k) Navê wî Azad e.
- l) [R [FN Navê wî] [FL [L' [FN Azad] [L e]]]]
- m) Qehwe şêrîn e.
- n) [R [FN Qehwe] [FL [L' [FR şêrîn] [L e]]]]
- o) Serhedo xwê xist nav xwarinê.
- p) [R [FN Serhedo] [FL [L' [FN XWÊ][L xist][FD nav xwarinê]]]]



Şekl 2.34. Dara sentaksê ya "Serhedo hêdîka pişkiya".


Di risteya "Serhedo hêdîka pişkiya" de lêker negerguhêz e, lewma berkara wê tune lê em dibînin ku fraza hokerî "hêdîka" bi awayekî opsîyonel çawaniya lêkerê nîşan dide. Lewma em fraza hokerî wekî veser (*adjunct*) etîket dikan.




Şekl 2.35. Dara sentaksê ya "Zozan çû malê".

Di risteya "Zozan çû malê" de, digel ku lêker "çû" negerguhêz e jî berkara nerasterast wergirtiye û çalakiyê ji aliyê cih ve temam dike. Heger em berkara nerasterast (malê) ji risteyê derxin, wateya risteyê diguhere û kêm dimîne.⁸⁹ Gündoğdu (2019), van lêkeran (çûn, hatin, ketin) wekî lêkerên tevgera armancırı/arastekirî nîşan dide û hêmana wan a armancı/alatîv (goal/allative) wekî hêmaneke pêwîst dihesibîne.

⁸⁹ Heger riste "Zozan çû" bûya, me yê bigota di vê risteyê de ne temamker ne jî veser heye.




Şekl 2.36. Dara sentaksê ya "Zozan dizîka çû malê".




Şekl 2.37. Dara sentaksê ya "Serhedo li Mêrdînê piştî nîvro bi kêfxweşî derket ser dikê".


Di risteya “Zozan dizîka çû malê” de em fraza hokerî derxin jî di destê me de risteyeke temam dimîne, wateya wê xera nabe. Dîsa çawa ku di risteya “Serhedo li Mêrdînê piştî nîvro bi kêfxweşî derket ser dikê” de tê dîtin frazên daçekî û fraza hokerî ya beriya lêkera negerguhêz (derket), veser in, em wan ji risteyê derxin jî wateya risteyê xera nabe (Serhedo derket ser dikê).



Şekl 2.38. Dara sentaksê ya "Ew mamoste ye".




Şekl 2.39. Dara sentaksê ya "Navê wî Azad e".



Şekl 2.40. Dara sentaksê ya "Qehwe şêrîn e".

Weku di gelek ziman'an de heye, kopûla (*copula*)⁹⁰ di kurmancî de jî pêveberên navdêrî û pêveberên rengdêrî ava dikin. Di risteyê "Ew mamoste ye" û "Navê wî Azad e" de, navdêr temamkerên kopûlayê ne. Di risteya "Qehwe şêrîn e" de jî temamkera kopûlayê rengdêr e.

⁹⁰ Lêkera kû naveroka wê tune lê bi awayekî sade du peyvan an jî du frazan bi hev ve girêdide. Wekî lêkera girêdanê (*linking verb*) jî tê zanîn. Di zimanê îngilîzî de kopûla "be" (*am, is, are*) ye. Peywira vê lêkerê ew e ku tiştekî bi tiştekî din ve wekhev (*equative*) bike (Brown û Miller, 2013: 112).



Şekl 2.41. Dara sentaksê ya "Serbedo xwê xist nav nav xwarinê".


Weku tê zanîn, lêkerên cotgerguhêz (*ditransitive verbs*) hem berkara rasterast hem jî berkara nerasterast distînin û herdu hêman jî temamker in. Anglo, divê herdu hêman jî qîza L-Barê (L') û xwişka sereyê (L) bin. Herçi di (Şekl 2.41.)ê de ev rewş pêk hatibe jî diviya herdu hêman ne xwişkên hev bûna. Derbarê vê mijarê de, da ku diyagram li gorî Teoriya X-Barê bê xêzkirin, Carnie (2020b) pêşniyaz dike ku Dengê Aktîv/Avaniya Aktîv (*Active Voice*) li darê bê zêdekirin. Li gorî Carnie, çi sıfir morfem (*zero morpheme*) be çi jî gireyên bi lêkerê ve zeliqandî bin, di zimanan de ev morfem referansê bi argûmentan dikan. Ji bo mijar bê fahmkirin mînakeke zimanê tirkî dide ku morfema avaniya aktîv referansê bi hêmana bikerê dide:

(95)


- a) John tezgah-1 temiz-**le**-di
J. counter-ACC clean-v-PST
“John cleaned the counter.”
- b) *Tezgah* *temiz*
Counter *clean*
“The counter is clean.”

Tê dîtin ku morfema “-le-”yê bikerê/faîlê (*agent*) diyar dike. Bêyî vê morfemê peyv wekî lêkerê tevnagere. Carnie di heman vîdyoya dersê de dibêje ji bo piraniya lêkerên zimanê îngilîzî ev avaniya aktîv vala ye, yanî sıfir aktîv (*Øactive*) e û referansê dide argûmenteke derive. Wî ji bo vê risteya îngilîzî çareseriyeke wiha pêşniyaz kiriye (*Morag gave Clay a book*⁹¹):

⁹¹ Moragî pirtûkek da Clayî.




Şekl 2.42. Dara sentaksê ya cihguhertina lêkera cotgerguhêz. (Carnie, 2010 :241)




Şekl 2.43. Dara sentaksê ya "Morag gave Clay a book". (Carnie, 2020b)

Tê dîtin ku fraza avaniyê (*VoiceP*) li darê hatiye zêdekirin û lêkerê cih guhertiye, çûye bin *Voice-Barê*. Bi vî awayî herdu berkar jî dîbin xwişka sereyê û qîza N-Barê. Em dizanin ku di kurmancî de jî ev rewş heye. Em dikarin bêyî ku faîl (*agent*) bi awayê leksîkal diyar be, frazeke lêkerî ava bikin ku lêker referansê bide faîlê derive (xwê xist nav xwarinê). Li gorî vê rîbazê em dikarin mînaka xwe ya kurmancî wiha nîşan bidin:




Şekl 2.44. Dara sentaksê ya "*Serhedo xist xwê nav xwarinê".

Haig (2022: 340), ji bo van lêkerên ku du argûmentan werdigirin dibêje ji van argûmentan yek armanc (*goal*) û yek jî tema (*theme*) ye. Hêmana armancê berkara rasterast e û di dema niha de, di rewşa tewandî (*oblique*) de ye. Armanc diçe paşıya lêkerê û dibe ku fraza daçekî be an jî di rewşa tewandî be. Axirî, bi rôbaza Carnie em dibînin ku avaniya aktîv bilind dibe û dibe xwişka fraza lêkerî (FL) û qîza Avanî-Barê (Avanî'). Bi vî awayî fraza navdêrî, berkara rasterast (xwê) dikeve bin hukmê lêkerê û wekî temamker tê etîketkirin. Lê ji ber ku wextê di risteyê de berkara rasterast hebe, peyvrêziya kurmancî ne SVO ye, li gorî diyagramê lêker tê pêşıya berkarê û rêz xera dibe (*Serhedo xist xwê nav xwarinê). Heger em cihê armanc (*goal*) û temayê (*theme*) biguherin diyagram li jêr derdikeve pêşıya me:




Şekl 2.45. Dara sentaksê ya "*Serhedo xist nav xwarinê xwê".

Wiha jî tê dîtin ku dîsa risteyeke nerêzimanî derdikeve holê (Serhedo xist nav xwarinê xwê). Lewma, çawa ku em dizanin di kurmancî de berkara rasterast berî lêkerê tê (Gündoğdu, 2011: 92-3), divê di vê diyagramê de jî berkar (xwê) biçe pêşıya lêkerê. Bi gotineke din, divê diyarkira (*specifier*) fraza lêkerî (xwê) cihê xwe biguherîne here pêşıya lêkerê. Di vê rewşê de em serî li rêkeftinê (*agreement*) didin da ku berkara akûzatîf were cihê xwe, têkeve pêşıya lêkerê. Ji bo wê jî em piştî fraza avanî (VoiceP) frazeke rêkeftinî (AgrP) ya berkarê (AgrOP) li darê zêde dikan (Carnie, 2020a).



Şekl 2.46. Dara sentaksê ya "*Briana put the mug on the counter*".⁹² (Carnie, 2020a)

⁹² Briana qedeh danî ser dezgehê.



Şekl 2.47. Dara sentaksê ya "Serhedo xwê xist nav xwarinê".⁹³

Çawa ku ji bo avaniya aktîv em dikarin binyada fraza lêkerî nîşan bidin em dikarin ji bo avaniya pasîv (*passive voice*) jî dara xwe ya sentaksê xêz bikin. Weku Quirk û yd. (1985: 167) jî diyar dikan, di gelek zimanan de cudakirina avaniya aktîv (*active voice*) û avaniya pasîv (*passive voice*) heye. Kurmancî jî yek ji wan e ku tê de ev cudadî heye. Radford (1981: 27) dibêje li gorî rîzimana klasîk ya şayesî, cihguhertina berkarê bi bikerê ve û danîna morfemên pasîv avaniya pasîv ava dike. Lê dîsa jî divê em baldar bin ku di hi zimanan de pênase û têgihiştina avaniya pasîv dibe ku ji hev cuda bin. Di diyarkirina avaniya pasîv de morfolojî, semantîk û peyvrêzî jî di nav de, divê gelek faktor li ber çavan bêñ girtin (Sherzad û Toma, 2024: 563).


Di kurmancî de avaniya pasîv bi lêkera alîkar “hatin”ê tê avakirin. Lêkera alîkar li gorî demê û li gorî bikerê tê kişandin. Herwiha, weku ku her lêker dikare bibe neyînî, di avaniya pasîv de jî lêker dikare neyînî be. Di avaniya pasîv de bikera lêkera aktîv

⁹³ Ji Chomsky ve heta niha derbarê teoriya Chomsky û li ser teoriyên din gelek nîqaş û pêşniyaz hatine kirin û îroroj jî zimannas li ser van teoriyan dixebeitin û bi lêzêdekirin an jî jêkêmkirinê têkariyê li qadê dikan. Derbarê vê mijarê de jî gelek nîqaş hene, nîşandana du temamkeran bi vî şeklî pirîçaran tenê tê pêşniyazkirin (ji bo zêdetir agahî bnr. Müller, 1995). Gündogdu (2011: 89-104) di teza xwe de ji bo lêkerên coterguhêz (dayîn, şandin) hin mînak dane û ji bo wan çend pêşniyaz kirine. Ji bo zêdetir agahiyê bnr. Radford, 2012: 315-66; Carnie, 2020a.


dibe faîlê (*agent*) lêkera pasîv û gelempêrî faîl nayê diyarkirin an jî bi fraza daçekî ya “ji aliyê” ve tê nîşandan (Thomson û Martinet, 2000: 188).

(96)


- a) Xelîl firaq şûştin.
- b) [R [FN Xelîl] [FL [L' [FN firaq] [L şûştin]]]]
- c) Firaq hatin şûştin.
- d) [FDm [FN][Dm' [Dm][FAvanî [FN ""]][Avanî [Avanî hatin_{pasîv}][FL [FN][L' [FN firaq ->1] [L şûştin]]]]]]
- e) Firaq ji aliyê Xelîl ve hatin şûştin.
- f) [FDm [FN][Dm' [Dm][FAvanî [FD ji aliyê Xelîl ve][Avanî [Avanî hatin_{pasîv}][FL [FN][L' [FN firaq ->1] [L şûştin]]]]]]]




Şekl 2.48. Dara sentaksê ya "Xelîl firaq şûştin".



Şekl 2.49. Dara sentaksê ya "Firaq hatin şûştin".




Şekl 2.50. Dara sentaksê ya "Firaq têñ/dê bêñ/dihatîn şûştin".




Şekl 2.51. Dara sentaksê ya "Firaq ji aliyê Xelîl ve hatin şûştin".

Gündoğdu (2018: 297), dit eza xwe ya doktorayê de ji bo lêkerên kompleks ku du argûmentan werdigirin û ji bo raweya aktîv û pasîv dîbêje divê sere li dawî be (head final). Lewma, ji bo avaniya van lêkeran diyagrama li jêr pêşniyaz dike:




Şekl 2.52. Pêşniyaza Songül Gündoğdu ji bo lêkerên xwedî argûmenta paşlêkerî ya armancî.


Heger em li gorî pêşniyaza Gündoğdu (2018) mînakêñ xwe yên li jor, ku me li gorî pêşniyaza Carnie (2020a) nîşan dabûn, ji nû ve bi dara sentaksê nîşan bidin, diyagramên li jêr derdikevin holê:



Şekl 2.53. Dara sentaksê ya "Serhedo xwê xist nav xwarinê", li gorî pêşniyaza Gündoğdu (2018).



Şekl 2.54. Dara sentaksê ya "Firaq hatin şûştin".




Şekl 2.55. Dara sentaksê ya "Firaq ji aliyê Xelîl ve hatin şûştin".

Di frazên lêkerî de ji bilî lêkerên leksîkal (*lexical verbs*) ku ew lêkerên sereke ne (*main verbs*), hin lêkerên alîkar hene (*helping verbs, auxiliary verbs*) ku bi tena serê xwe nayêن bikaranîn an jî wateyeke xurt dernabirin lewma bi lêkerên sereke re têن bikaranîn. Ev lêkerên alîkar binyadêن xuyang, avanî (*voice*), raweyan (*modality*) ava dikin (Trask, 2007: 29; Radford, 2012: 52; Brown û Miller, 2013: 289; Tallerman, 2015: 81). Di zimanê îngilîzî de lêkerên alîkar piranî peyvêن serbixwe ne lê hin ji wan dikarin wekî gireyan jî bêن bikaranin (*is, have, has, can, could, should, would, shall, must, may* û yd.). Digel vê, Trask (2007: 29), mînaka zimanê awîstralyayî dide û dibêje

di hin ziman de ev lêkerên alîkar ne wekî lêker lê bes wekî perçeyêna axaftinê têne qebûlkirin.

Carnie (2010: 243-4) dibêje lêkerên alîkar li diyarkira (*specifier*) V' yê têne nîşandan lê piştre Emonds (1978) pêşniyaz kiriye ku li şuna wê, kategoriyekê kêşanî (*inflection, Infl*) heye ku hemû taybetiyê keşaniyê temsîl dike. Bi vî awayî frazeke kêşanî (FK) ava dibe û li binê wê jî K-Bar (K') ava dibe:




Şekl 2.56. Dara fraza kêşanî (FK). (Carnie, 2010: 244)


Di kurmancî de hin lêkerên alîkar ên demê (dê, hatin) û lêkerên modal (divê, karîn, xwestin û yd.) wekî peyvîn serbixwe têne bikaranîn û hin ji wan jî beşdarî rehê lêkerê dibin. Di “Şekl 2.51.a” yê em dibînin ku lêkera alîkar (*was*) wekî peyveke serbixwe cih girtiye û di “Şekl 2.51.b” yê de partîsîp (*-ed*) bûye sereya I-Barê.

(97)


- a) Ez ê biçim Mêrdînê.
- b) Ew hatibû Mêrdînê.
- c) Ez dikarim/dixwazim/divê biçim Mêrdînê.
- d) Ez naçim Mêrdînê.



Şekl 2.57. Dara sentaksê ya "Ez ê biçim Mêrdînê".




Şekl 2.58. Dara sentaksê ya "Ew hatibû Mêrdînê".




Şekl 2.59. Dara sentaksê ya "Ez dikarim/dixwazim/divê biçim Mêrdînê".

Digel ku rewşa neyîniyê dikare fraza xwe li dar bixe jî (FNey, NegP), ji bo rewşa neyîniyê Carnie (2010: 244) ji Koopman (1984) neql dike ku meriv dikare neyîniyê jî li sereya kêşê bicih bike. Bo nimûne:



Şekl 2.60. Dara sentaksê ya "Ez naçım Mêrdînê".

Di zimanê îngilîzî de çawa ku lêkerên sereke têñ neyînîkirin, lêkerên modal jî dikarin têkevîn rewşa neyîniyê (Tallerman, 2015: 106). Di kurmancî de jî bi heman awayî em dikarin lêkerên modal têxin rewşa neyînî:




Şekl 2.61. Dara sentaksê ya "Ez nikarim biçim Mêrdînê".

Fonksiyona gihanekê ya di firazên din de me behskirî, ji bo frazên lêkerî jî derbasdar e. Du frazên lêkerî dikarin bi fraza gihanekî ya fonksiyonî bi hev ve bêngirêdan. Bo nimûne:

(98)

- a) Serhedo serê sibê taştê xwar û çû zanîngehê.
- b) [FK [FN Serhedo] [K' [FH serê sibê][FGih [FL taştê xwar][Gih' û [FL çû zanîngehê]]]]]



Şekl 2.62. Dara sentaksê ya "Serhedo serê sibê taştê xwar û çû zanîngehê".

Bi vî awayî, em dibînin ku fraza navdêrî, fraza daçekî û fraza hokerî dikarin bibin pêşmodîfiyekerên lêkerên kurmancî. Wekî paşmodîfiyeker jî di rewşa datîv de berkara nerasterast, yanî fraza navdêrî dikare cih bigire. Li gorî vê, em dikarin ji bo frazên lêkerî yên kurmancî formûleke wiha nîşan bidin:

(99)

$$FL \rightarrow (FD+) + (FH+) + (FN) + (FR) + L + (FN) + (FD)$$

Axirî, me hewl da ku frazên lêkerî yên kurmancî bi teoriyên modern ên zimannasiyê ve bêngirê ravekirin da ku em karîbin taybetmendiyê binyadî û fonksiyonî

yên van frazan têbigihên. Bi taybet, Teoriya X-Barê derfetê dide me da ku em taybetmendiyêñ binyadî yên zimêñ analîz bikin, lewma me jî sûd ji vê teoriyê û şemaya vê teoriyê wergirt ku binyada frazêñ lêkerî yên kurmancî berevajî rezimanêñ klasîk bi nêrînêñ zimannasiya modern bêñ dîtin. Me dît ku frazêñ lêkerî bi têkariya temamker û veseran ve carinan binyadêñ aloz ava dikin. Hêmanêñ temamker lêkerê ji aliyê wateyê ve temam dike û di frazê de bi rola pêwîst radibe. Hêmanêñ veser jî agahiyêñ ekstra didin me û wateya frazê xurttir dikin lê wateya sereke ya frazê naguherînin.

ENCAM

Me di vê xebatê de bi layenêrîneke ji nav teoriyên modern ên zimannasiyê frazên (komepeyy) diyalekta kurmancî bi binyad û fonksiyonên wan analîz kirin. Armanca me ya sereke ew bû ku frazên kurmancî ji qefesa rêzîmana klasîk azad bibin û di nav dinyaya nû ya zimannasiyê de bi awayekî zanistî li wan bê nêrîn. Çawa ku ji naverok û ji daneyên bidestketî jî tê fahmkirin êdî ne mimkin e ku em binyada risteya kurmancî bi têgehê berfireh û sîwanî rave bikin. Ci têgeha îzafeyê be ci têgeha ravekê be, di rêzîmana klasîk de ewqasî bi giştî têne ravekirin ku taybetmendiyê xweser ên kurmancî di nav wan rave û pênaseyan de wenda dibin.

Teoriyên modern ku dixwazin modeleke gerdûnî ya zimên ava bikin, ziman kirine keresteya zanista zimannasiyê û roj bi roj bi roniya van teoriyan ve xebatê berfirehtir û kûrtir têne kirin. Famkirina xebitîna zimên, bikaranîna zimên xurttir dike. Bikaranîn xurttir ya zimên ji bo mirovan tê wateya ragihandineke xurttir. Lewma divê wekî her zimanî, kurdî/kurmancî jî di vî çemî de biherike, di her pêlê de xurttir bibe.

Em li ser vê fîkrê ne ku mijara frazan ji aliyê peyvrêziyê ve binyada zimên ava dike û fahmkirin û têgihiştina avabûna frazan dê deriyê bîrbirineke nû ji mirovan re veke. Di rêzîmana klasîk de komepeyyê kurmancî di bin sernavê “Ravek”ê hatine civandin û senifandin û binavkirinê wan jî li gorî modîfiyekera wan hatine kirin. Lî di teoriyên zanistî yên zimannasiyê de ku îroroj hemû dinya hewl dide zimanê xwe bi van teoriyan ve keşf bike, komepeyy bi sereyên wan ve hatine binavkirin û senifandin.

Ne hewce ye ku em daneyên bidesktetî yên di beşa duyem de dubare bikin lê, berçav e ku mijara ravekên kurmancî ku di rêzaman klasîk de cihekî berfireh werdigire, êdî derbasdariya xwe wenda kiriye û divê mijar bi temamî li gorî qayîdeyên avabûna frazan ji nû ve bê amadekirin. Li gorî rêzikên binyada frazan, sereya frazê navê xwe li frazê dike û fraz dikare bi temamker an jî veserê ve bê modîfiyekirin. Temamker wateya sereyê temam dike û bi rola pêwîst radibe. Veser jî sereyê ji aliyê wateyê ve xurttir dike lê wateya sereke ya sereyê naguherîne.

Hema hema di hemû xebatê zimannasiyî yên zimanê dinyayê de fraz li gorî sereyên leksîkal hatine senifandin û binavkirin. Lewma me jî pênc frazên leksîkal li gorî cureya sereyê binavkirin û em li ser wan xebitîn. Fraza navdêrî, fraza daçekî, fraza hokerî, fraza rengdêrî û fraza lêkerî ku ev pênc frazên leksîkal in. Ji bilî wan, li gorî

Teoriya X-Barê em dikarin ji her fonksiyonekê frazekê saz bikin lê di vê xebatê de ji bilî cihên pêwîst me behsa frazên fonksiyonî nekir. Ji ber ku her fonksiyon û taybetmendî bi tena serê xwe xebateke qerase heq dike, me rabûya behsa hemû frazên fonksiyonî bikira ne mimkin e ku xebat bi dawî bûbûya.

Heger em bêñ ser mijara ïzafeyê; di kurmancî de ïzafe jî wekî mijara ravekan gelekî berfireh hatiye ravekirin û xebatêñ kûr li ser ïzafeyê nehatine kirin. Wextê em kûr noq bibin, em ê bibînin ku ïzafe hertim ne bi heman fonksiyonê radibe. Bo nimûne, wextê temamkera fraza navdêrî rengdêr be, bi fonksiyona artîkilê radibe (pirtûka sor: *the red book*); wextê temamkera fraza navdêrî cînava tewandî be, rewşa xweyîtiyê ava dike û temamker bi fonksiyona rengdêrên xweyîtiyê radibe (pirtûka min: *my book*); wextê cînava tewandî tê paşıya ïzafeya serbixwe, cînavêñ xweyîtiyê ava dibin (a min: *mine*); wextê du navdêran bi hev ve girêdide rewşa aîdîyetê ava dike (pirtûka Dîlanê: *Dîlan's book*, tifingeke şivêñ: *a rifle of shepherd*).

Axirî, em dikarin ji daneyêñ bidestketî binyada riste û frazên kurmancî wiha nîşan bidin:

(100)

- a) R → FN + FL
- b) FN → (Dk+) + (Rd) + N + (Dk) + (İzafe) + (N+) + (Rd+) + (FTk) + (FD+)
- c) FD → Dp + FN + (pD)
- d) FH → (H) + H
- e) FR → (FH) + R
- f) FL → (FD+) + (FH+) + (FN) + (FR) + L + (FN) + (FD)

Em dibînin ku fraza navdêrî gelekî firawan e. Sedemeke wê ew e ku mixabin ji bo kurmancî, çawa ku me behsa fonksiyonêñ ïzafeyê kir, hê komên peyvan bi awayekî teqez nehatine senifandin. Bo nimûne, mijara diyarkeran ji bo kurmancî ne zelal e bê em ê hejmaran, rengdêrên xweyîtiyê, rengdêrên nîşander û hww. wekî diyarker qebûl bikin an rengdêr. Herwiha mijara artîkilan jî ne zelal e. Heger em komên peyvên kurmancî bi awayekî zanistî diyar bikin, ew ê fonksiyonêñ ïzafeyê berçav bibin û dê formûla fraza navdêrî jî kintir û zelaltır bibe.

Darê sentaksê diyagramên giring in ji bo dîtbarkirina binyada frazan û hêmanên frazan. Girêdan û cihêن temamker û veseran dihêle mirov binyada frazê baştir fahm bike. Heger rast hatibe nîşandan ne giring e ku bi çi awayî dara sentaksê hatibe xêzkirin lê dara sentaksê ya Teoriya X-Barê ji ber ku xwedî prensîp û parametereyên xwe yên serbixwe ye, zêdetir tê tercîhkirin. Diyagrama X-Barê têkiliyên binyadî yên frazan bi awayekî eşkere nîşan dide û modeleke bikêrhatî ji analîzêن zimannasiyî re ava dike. Lê divê em ji bîr nekin ku ev model îroroj çiqas baş bixebite jî, axirî hêmaneke teorîk e û roj bi roj tê bipêşxistin. Herçi, teorî li ser zimanê îngilîzî tên modelkirin û pêşxistin jî di rewşen aloz de zimannas gelempêrî bi idîayekê derdikevin an jî pêşniyaz dikan. Lewma sepandina zimanên din li diyagrama X-Barê dikare rewşen aloztir ava bikin. Wekî me beramberî kurtkirinên zimanê îngilîzî kurtkirinên kurmancî pêşniyaz kirin, di rewşen aloz de jî me darê sentaksê yên aloz tenê wekî pêşniyaz berpêş kirin.

Axirî, ev xebat di çarçoveya teoriyên modern ên behskirî de ji bo mijara frazan xebateke destpêkê ye. Têgihiştina taybetmendiyên binyadî û fonksyonî yên frazan qadeke berfireh a xebatêن zimannasiyê ye. Hêviya me ew e ku ev xebat ji bo xebatêن pêş bibe bingeha pêlikekê.

ÇAVKANÎ

- Abney, S. P. (1987). The English noun phrase in its sentential aspect. Ph.D. Dissertation, M.I.T.
- Açar, Z. (2014). Di Kurmancî de Qertafênu Ravekê bi Hevalnavan ve Diwesfinin. *Kovara Nûpelda*. j. 15.
- Açar, Z. (2023). Pirjimarî di Kurmancî de. *RumeliDE Dil Ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*. (Ö13), 1452-1467. <https://doi.org/10.29000/rumelide.1379376>
- Anderson, C., Bjorkman, B., Denis, D., Doner, J., Grant, M., Sanders, N., û Taniguchi, A. (2002). *Essentials of Linguistics, 2nd edition*. eCampusOntario.
- Aksan, D. (2020). *Her Yönüyle Dil (Ana Çizgileriyle Dilbilim)*. (1, 2, 3 Ciltler). Ankara: Türk Dil Kurumu Yayıncılığı.
- Al-Nasir, A. A. (1985). Sibawayh the phonologist: a critical study of the phonetic and phonological theory of Sibawayh as presented in his treatise Al-Kitab. D.Phil. Thesis. University of York. <https://etheses.whiterose.ac.uk/10917/1/354409.pdf>.
- Altun, M. (2011). *Türkçe Kelime Grupları Çözümlemeleri “Türk Romanlarından Örneklerle”*. İstanbul: Mtv Yayıncılık
- Amin, W. O. (1979). Aspects of The Verbal Construction in Kurdish. (Teza Lîsansa Bilind). School of Oriental and African Studies University of London.
- Aydın, M. (2007). *Dilbilim El Kitabı*. İstanbul: 3F Yayınevi.
- Aydın, T., Adak A., Ergün, Z., û Bülbül, M. (2021), *Kurdîzan Asta destpêkê – Pirtûka Dersê, Kurmancî*. Stenbol: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê.
- Aydin, Ö. (2007). Yarım Asırdır Chomsky. Yayımlanmamış yazı.
- Aydogan, Î. S. (2013). *Guman I Zimanê Kurdî*. Ankara: Weşanên Lîs.
- Badıllı, K. (1965). *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*. Ankara: Ankara Basım ve Ciltevi.
- Baker, M. C. (2003). Syntax. In M. Aronoff & J. Rees-Miller (Eds.), *The handbook of linguistics* (pp. 265-294). Blackwell Publishers.

- Bedir-Xan, C. A. (1998). *Elfabêya kurdî & Bingehêن gramera kurdmancî*. Stenbol: Weşanên Doz.
- Berk, L. M. (1999). *English Syntax, From Word to Discourse*. Oxford/New York: Oxford University Press.
- Biber, D., Conrad, S. û Leech, G. (2003). *Longman Student Grammar of Spoken and Written English*. Longman.
- Black, C. A. (1999). A step-by-step introduction to the Government and Binding theory of syntax. *Summer Institute of Linguistics*.
- Blevins, J. P., û Sag, I. A. (2013). Phrase structuregrammar. In M. den Dikken (Ed.), *The Cambridge Handbook of Generative Syntax* (pp. 202–225). chapter, Cambridge: Cambridge University Press.
- Bloomfield, L. (1933). *Language*. New York: Holt, Rinehart & Winston.
- Brown, K., û Miller, J. (2013). *The Cambridge dictionary of linguistics*. Cambridge University Press.
- Bülbül, M. (2016). Risteyên Peywendiyê û Peyvrêziya Wan (Devoka Mêrdînê). *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(4), 22-45.
- Bülbül, M. (2017). Peyvrêzî Di Frazê Navdêrî De (Devoka Mêrdînê). *The Journal of Mesopotamian Studies*, 2(1), 89-101.
- Campbell, L. (1998). *Historical Linguistics - An Introduction*. Cambridge, Massachusetts: The MIT Press.
- Carnie, A. (2010). *Constituent structure*. (2nd ed.). OUP Oxford.
- Carnie, A. (2020a). [Carnie 2021 Syntax 4th Edition]. (07 Gulan 2024). Video 14.4: Ditransitives Revisited [Vîdyo]. Youtube. <https://www.youtube.com/watch?v=h8DrnH8N9Lc>.
- Carnie, A. (2020b). [Carnie 2021 Syntax 4th Edition]. (07 Gulan 2024). Voice 14.2 Explaining Double Object Verbs using the VoiceP [Vîdyo]. Youtube. <https://www.youtube.com/watch?v=5todBXyClmg>.

- Carnie, A. (2020c). [Carnie 2021 Syntax 4th Edition]. (07 Gulan 2024). Video 6.4: Complements vs. Adjuncts [Vidyo]. Youtube. <https://www.youtube.com/watch?v=1avF6TiLnmA>.
- Chomsky, N. (1957). *Syntactic Structure*. Mouton: The Gruyter.
- Chomsky, Noam. (1981). *Lectures on Government and Binding*. Mouton: The Gruyter.
- Chomsky, N. (1986). *Barriers*. MIT Press.
- Chomsky, N. (1989). Some notes on economy of derivation and representation. *MIT Working Papers in Linguistics* 10: 42-74.
- Chomsky, N. (1993). *Lectures on Government and Binding – The Pisa Lectures*. Berlin, New York: De Gruyter Mouton.
- Chomsky, N. (1993). A minimalist program for linguistic theory. *MIT occasional papers in linguistics no. 1*. Cambridge, MA: Distributed by MIT Working Papers in Linguistics.
- Chomsky, N. (1995). *The Minimalist Program*. Cambridge, Mass.: The MIT Press.
- Chomsky, N. (2002). *Syntactic Structures*. (2nd Edition). De Gruyter Mouton.
- Chomsky, N. (2015). *The Minimalist Program*. Cambridge, Mass.: The MIT Press.
- Ciwan, M. (1992), *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehçesi*. Sweden: Jîna Nû.
- Cook, V. J. (1988). *Chomsky's Universal Grammar: An Introduction*. Basil Blackwell.
- Çiçekdağı, C. (2015). Aristoteles, İbn Sina ve Thomas Aquinas'ın "Peri Hermeneias"ları ("yorum üzerine"leri): Karşılaştırmalı bir değerlendirme. Yayınlanmamış doktora tezi. Uludağ Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü. <http://hdl.handle.net/11452/7578>.
- Delahunty, G. P., & Garvey, J. J. (Eds.). (2010). *The English language: From sound to sense*. Parlor Press LLC.
- Devellioğlu, F. (1980). *Osmanlica – Türkçe Ansiklopedik Lugat*. Ankara: Doğuş Matbaası.
- Delikaya, Ö. (2023). *Destpêkek ji bo Peyvsaziya Kurmancî*. Wan: Peywend.

- Ebuzeyd, S. C. (2019). *Cihgîhorîna Keristan di Ristê da (Govera Behdînî)*. Zaxo: Zanîngeha Zaxoyê.
- Elî, M. E. (2006). *Ji Bingehêne Rézimana Kurdi (Pirtûka Fêrkirinê)*. Efrîn. <https://www.scribd.com/document/487025823/Ji-bingehen-rezimana-kurdi-pdf>. (11.04.2024).
- Emonds, J. (1978). ‘The Verbal Complex V’-V in French. *Linguistic Inquiry*. 9. 151–75.
- Endley, M. J. (2010). *Linguistic Perspectives on English Grammar: A Guide for EFL Teacher*. Information Age Publishing.
- Farqînî, Z. (2022). *Ferhenga Kurdi – Tirkî*. Çapa Berfirehkirî. Enstîtuya Kurdi ya Stenbolê.
- Fettahoğlu, Y. (2017). Arapça-Türkçe İzafet Terkibi ve Türkçe Örneğinde Dil Öğretiminde Karşılaşılan Zorluklar. *International Periodical for the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume*. 12/34, p. 193-203.
- Fromkin, V., Rodman, R., & Hyams, N. (2011). *An Introduction to Language* (Int. ed.). Boston, MA: Wadsworth.
- Givon, T. (2001a). *Syntax: An introduction Volume I*. John Benjamins Publishing Co.
- Givon, T. (2001b). *Syntax: An introduction Volume II*. John Benjamins Publishing Co.
- Gökdayı, H. (2010). Türkiye Türkçesinde Öbekler. *Turkish Studies*, 5(3), 1297-1319.
- Gökenç, G. S. (2022). Çin Yazısı'nın Temeli Jiaguwen'da Çince Kavramların Gösterimi. M. Kotuk (Ed.). 7th International Zeugma Conference on Scientific Research, The Book Full Papers (369-377).
- Gross, H. (1998). *Einführung in die germanistische Linguistik*, iudicium verlag. München.
- Gündoğdu, S. (2011). The Phrase Structure of Two Dialects of Kurmanji Kurdish: Standart Dialect and Muş Dialect. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Boğaziçiyê.
- Gündoğdu, S. (2018). Argument-Adjunct Distinction in Kurmanji Kurdish. (Teza Doktorayê). Zanîngeha Boğaziçiyê.

- Gündoğdu, S. (2019) Asymmetries in Kurmanji Morphosyntax. in Haig, G., ÖpengIn, E., Gündoğdu, S. and Anoby, E. (Eds.). *Current Issues in Kurdish Linguistics*. Bamberg University Press.
- Gündoğdu, S. (2023). Ezafe in Northern Kurdish. *Toronto Working Papers in Linguistics (TWPL)*. Special Volume on Linkers. Kahnemuyipour, A. & S. Taghipour (eds).
- Güzel, Ş. (2018). Lêkolîneke sentaksî lı ser berhema Camî'eya Rîsaleyan û Hîkayetan, (Teza Lîsansa Bilind). <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Hagége, C. (2010). *Adpositions*. Oxford: Oxford University Press.
- Haig, G. (2011). Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle: On the Ezafe in West Iranian. In F. Yap, K. Grunow-Härsta & J. Wrona (Eds.), *Nominalization in Asian Languages: Diachronic and Typological Perspectives Volume 1: Sino-Tibetan and Iranian Languages*. (pp. 363-392). Amsterdam: John Benjamins.
- Haig, G., û Öpenguin, E. (2018). Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties and status. In C. Bulut (Ed.), *Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speaking minorities of the peripheries* (157-229). Wiesbaden: Harrassowitz.
- Haig, G. (2022). Post-Predicate Constituents in Kurdish. *Structural and Typological Variation in the Dialects of Kurdish*. (ed.) Yaron Matras, George Haig, Ergin Öpenguin. Palgrave Macmillan. 335-377.
- Harper, D. (d.t.). Etymology of phrase. Online Etymology Dictionary. 25 Berfanbar 2023, ji <https://www.etymonline.com/word/phrase>.
- Huddleston, R., Pullum, G. K., û Reynolds, B. (2022). *A Student's Introduction to English Grammar*. (Second Edition). United Kingdom: Cambridge University Press.
- Jackendoff, R. (1977). *X' Syntax: A Study of Phrase Structure*. Cambridge. MA: MIT Press.
- Jitpranee, J. (2017). A study of adjective types and functions in popular science articles. *International Journal of Linguistics*, 9(2), 57.
- Kadarisman, A. E. (2009). Chomsky's Universal Grammar: A Chronological And Critical Overview.

- Karahan, L. (1999). *Türkçede söz dizimi: cümle tahlilleri*. Akçağ Basım Yayın Pazarlama.
- Kareem, R. (2016). The Syntax of Verbal Inflection in Central Kurdish. (Teza Doktorayê). Newcastle University.
- Kayabaşı, D. (2018). Üretici Dilbilgisi. Özge Can (Ed.). *Dilbilim Kuramları İki Düzlem Beş Kuram*. (261-329). İthaki Yayınları.
- Kayaoğlu, M. N., û Çetinoğlu, A. (2013). Mısır Hiyerogliflerini Çözüme Götüren Dilbilim Anahtarları. *Karadeniz Uluslararası Bilimsel Dergi*, 1(17), 39-52.
- Khoshnaw, S. R. A. (2023). Firawankirdinî Girêyî Naw Le Zarî Kirmancî Nawerastî Zimanî Kurdî Da. (Teza Lîsansa Bilin). Zanîngeha Bîngolê. [https://tez.yok.gov.tr/..](https://tez.yok.gov.tr/)
- Kıran, Z. û Eziler Kıran, A. (2018). *Dilbilime Giriş*. (5. Baskı). Ankara: Seçkin Yayınevi.
- Kim, J-B., û Sells, P. (2008). *English Syntax: An Introduction*. (CLSI Lecture Notes). CSLI Publications.
- Kornai, A. û Pullum, G. K. (1990). The X-Bar Theory of Phrase Structure. *Linguistic Society of America*. Vol. 66, No. 1 (Mar., 1990), 24-50.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî Rêziman*. Frankfurt: Weşanên KOMKAR.
- Lasnik, H. û Lohndal, T. (2010). Government-binding/principles and parameters theory. *Wiley Interdiscip Rev Cogn Sci*. 2010 Jan;1(1):40-50. doi: 10.1002/wcs.35. Epub 2009 Dec 30. PMID: 26272837.
- Macdonell, A. A. (1900). *A History of Sanskrit Literature*. New York: D. Appleton and Company. (eBook). <https://www.gutenberg.org/cache/epub/41563/pg41563-images.html>. 06.01.2024.
- MacKenzie, D. (1961). *Kurdish Dialect Studies*. Vol. 1. London: Oxford University Press.

- Matasović, R. (d.t.). Comparative and Historical Linguistics. *Linguistic Anthropology*.
 14 Çile 2024. Ji <https://www.eolss.net/sample-chapters/c04/e6-20b-05-00.pdf>
 hatiye standin.
- Me'rûf, 'E. M. (2010). *Dirusteyî Frêz le Zimanî Kurdi da*. Melbendî Kurdolocî.
- Mithun, M. (1999). The languages of Native North America. New York : Cambridge University Press.
- Murphy, R. û Altman, R. (1998). *Grammar in Use: Reference and Practice for Intermediate Students of English*. Cambridge University Press.
- Mustafa, J. A., û Omer, T. (2017). Function and Position of Noun Phrases in English and Kurdish. 8th International Visible Conference on Educational Studies & Applied Linguistics. doi: 10.23918/vesal2017.a20.
- Müller, G. (1995). A-bar Syntax – A Study in Movement Types. Berlin – New York: Mouton de Gruyter.
- Panagiotidis, P. (1998). The internal structure of English pronouns. *Selected papers on theoretical and applied linguistics*, 12(1), 84-94.
 doi:<https://doi.org/10.26262/istal.v12i1.6669>
- Pelz, Heidrun. (1998). *Linguistik, eine Einführung*. Hamburg: Campe paperback Verlag.
- Perrot, J. (2021). *Dilbilim*. (2. Baskı). (Çev. İşık Ergüden). Ankara: Dost.
- Pollock, J. (1989). Verb movement, Universal Grammar, and the structure of IP. *Linguistic Inquiry* 20: 365-424.
- Postal, P. (1969). On So-Called Pronoun s in English. In Reibel, David and Schane, Sanford (Eds.) *Modern Studies in English*. Prentice-Hall Inc.
- Quirk, R., Greenbaum, S., Leech, G. Û Svartvik, J. (1985). *A Comprehensive Grammar of the English Language*. London and Newyork: Longman.
- Radford, A. (2012). *Syntactic Theory and the Structure of English: A Minimalist Approach*. UK: Cambridge University Press.

- Raheem, K. J. (2019). The structure of Verb phrase in the Kurdish language. *International Journal of Kurdish Studies* 5 (1), 237 – 252 DOI: 10.21600/ijoks.516508
- Rifat, M. (2008). *XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Robins, R. H. (1997). *A Short History of Linguistics*. (Fourth Edition). New York: Routledge.
- Sağrıç, F. H. (1991). *Hêmana Rezimanê Kurdi*. Stenbol: Melsa Yayınları.
- Šarić, A. (2018). *Nominalizations, Double Genitives and Possessives: Evidence for the DP-Hypothesis in Serbian*. Berlin/Boston: De Gruyter.
- Sebzecioğlu, T. (2010). Ana Yönüyle Minimalist Program. *Sarkaç*. Sayı 2, Güz 2010. 97-106)
- Sedley, D. (2003). *Plato's Cratylus*. UK: Cambridge University Press.
- Sherzad, R. û Toma, S. S. (2024). Investigating Passive Voice Problems in Kurdish Student' Translations from and into English. *Academic Journal of Nawroz University (AJNU)*. Vol. 13, No. 1, 562-580.
- Sideeg, A. (2016). Key Arguments for the Determiner PhraseHypothesis. *Journal of Humanities And Social Science (IOSR-JHSS)*, 21 (2). 18-25.
- Tahir, R. S. (2018). The Structure of DP in central Kurdish. (Teza Doktorayê). Newcastle University.
- Tallerman, M. (1998) *Understanding Syntax*. (Third Edition). Hooder Education.
- Tallerman, M. (2015) *Understanding Syntax*. (Fourth Edition). New York: Routledge.
- Tan, S. (2011). *Rezimana Kurmancî (Çapa Berfirehkiri)*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Tan, S. (2018). Du xebatêñ destpêkî yên bi îngilîzî yên rêzimana Kurmancî: Analîzeke zimanzanî û rêzimanî. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Mardin Artukluyê. <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Thomson, A. J. û Martinet, A. V. (1986). *A Practical English Grammar* (4. Edition). Oxford University Press.

- Trask, R. L. (2007). *Language and linguistics: The key concepts* (2nd ed.). P. Stockwell (Ed.). NY: Routledge.
- Toklu, M. O. (2021). Dilbilime Giriş. (8. Baskı). Ankara: Akçağ Yayıncıları.
- Uzun, N. E. (2000). *Anaçızgileriyle Evrensel Dilbilgisi ve Türkçe*. İstanbul: Multilingual.
- Uzun, N. E., ü Aydin, Ö. (2006). *Sözdizim. dilbilim temel kavramlar sorunlar tartışmalar*. Ankara: Dil Derneği, 63-76.
- Wells, R. S. (1947). Immediate constituents. *Language*. 23, 81-117.
- Whitney, W. D. (1873). *Oriental And Linguistic Studies*. New York: Scribner, Armstrong, And Co.
- Wilson, R. & Keil, F. (2001). *The MIT Encyclopedia of the Cognitive Sciences* (MITECS = electronic title). Cambridge, Mass.: The MIT Press. Cognitive Linguistics Bibliography (CogBib). Retrieved 2024-03-16, from <https://www.degruyter.com/database/COGBIB/entry/cogbib.13023/html>.
- Yitik, A. İ. ü Arslan, H. (2011). Vedalar Ve Kaynağı Üzerine On the Vedas and Their Origin. *Milel ve Nihal*. 8/1 (March 2011). 225-250.
- Yonat, M. (2019). Kurmancî Kürtçesi Ağızları Hakkında Sosyolinguistik Bir İnceleme (Muş, Adıyaman, Şırnak Örneği). (Doktora Tezi). <https://tez.yok.gov.tr/>, 586923
- Yonat, M. (2020). Bikaranîna Îzafeyê di Devokên Kurdiya Kurmancî de (Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojava). *Kurdiname*. no. 3, p. 52-75
- Yozgat, U. (2018). Dilbilimde Biçimci ve İşlevci Düzlem. Özge Can (Ed.). *Dilbilim Kuramları İki Düzlem Beş Kuram*. (33-83). İthaki Yayıncıları.
- Yule, G. (2010). *The Study of Language (4th. Ed)*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Zhurkenovich, S. R., Kozhamuratkyzy, Z. A., Khatipovna, D. G., Tasbulatovna, K. B., & Aisovich, V. R. (2021). The Principles of Economy in Word-Formation in Functional Styles of English . *Arab World English Journal*, 12 (2) 424-435. DOI: <https://dx.doi.org/10.24093/awej/vol12no2.29>

Zwart, J. W. (1998). The Minimalist Program. *Journal of Linguistics*. 34(1), 213–226.
doi:10.1017/S002226797006889

PÊVEK

Ferhengoka Têgehan

English	Kurmancî
Accusative	Akuzatîv
Active Voice	Avaniya Aktîv
Adjectival Phrase	Fraza Rengdêrî
Adjective	Rengdêr
Adjective Phrase	Fraza Rengdêrî
Adjunct	Veser
Adposition	Daçek
Adpositional Phrase	Fraza Daçekî
Adverb	Hoker
Adverb Phrase	Fraza Hokerî
Adverbial Phrase	Fraza Hokerî
Affix	Gire
Agent	Fâl/Biker
Agreement	Rêkeftin
Agreement Phrase	Fraza Rêkeftinî
Amplifiers	Zêdeker
Arbitrary	Bêegerî
Article	Artîkil
Aspect	Xuyang
Atomic Units	Yekîneyên Atomîk
Auxiliary Verbs	Lêkerên Alîkar
Binding	Girêdan
Binding Theory	Teoriya Girêdanê
Case	Rewş
Clause	Hevok
Cleft Sentences	Hevokên Veqetandî
Clitics	Klîtîk
Comment	Şirove
Comparative	Berawirdî

Comparative Linguistics	Zimannasiya Berawirdî
Competence	Pêkarîn
Complement	Temamker
Complementizer	Temamker
Complementizer Phrase	Fraza Temamker
Conjunctions	Gihanek
Constituent	Avaker
Constituent Structure	Binyada Avaker
Copula	Kopûla
Dative	Datîv
Deep Structure	Binyada Kûr
Definite	Nasyar
Degree	Pile
Degree Adverbs	Hokerên Pileyî
Deletion	Jêbirin
Demonstrative	Nîşander
Dependence	Pêwendîtî
Determiner	Diyarker
Determiner Phrase	Fraza Diyarker
Direct Object	Berkara Rasterast
Descriptive Linguistics	Zimannasiya Şayesî
Displace	Cihguhertin
Distributionalism	Lêbelavgerî
Ditransitive	Cotgerguhêz/Cottêper
Double Articulation	Cot movikkirin
Downtoners	Kêmker
Ergative	Ergatîv
Ezafe	Îzafe
Ezafe Phrase	Fraza Îzafeyê/Fraza Îzafî
Function	Fonksiyon
Generative	Hilberîner
Genetive	Genetîv, Rewşa Aîdîyetê
Goal	Armanc

Government	Rêvebirin
Government and Binding Theory	Teoriya Rêvebirin û Girêdanê
Head	Sere
Head Noun	Sereya Navdêrî
Helping Verbs	Lêkerên Alîkar
Indefinite	Nenasyar
Indirect Object	Berkara Nerasterast
Inflection	Kêşan
Intensifiers	Hêamên Xurtkirinê
Interface	Navru
Intransitive	Negerguhêz/Têneper
Isomorphic	Hevteşeyî
Langue	Ziman
Lexical	Leksîkal/Peyvi/Ferhengî
Lexical Items	Hêmanên Ferhengî
Lexicon	Ferheng
Linguistics	Zimannasî
Linking Verbs	Lêkerên Girêdanê
Local Domain	Milkê Deverî
Logical Form	Forma Mentiqî
Minimalist Program	Programa Mînîmalîst
Modal Verb	Lêkera Modal
Modals	Modal/Rawe
Modeling	Modelkirin
Modifiers	Modîfiyeker
Movement	Cihguhertin/Barkirin
Native	Xwecih
Node	Girêk/Çiqilk
Noun	Navdêr
Noun Phrase	Fraza Navdêrî
Object	Berkar
Oblique	Tewang/Tewandî
Oblique Case	Rewşa Tewangê/Rewşa Tewandî

Operations	Kirarî
Paradigmatic	Rêzeyî
Parole	Gotin
Participle	Partîsîp
Passive Voice	Avaniya Pasîv
Performance	Pêkirin
Personal Pronouns	Cînavêñ Kesî
Phonological Form	Forma Fonolojîk
Phrase	Fraz, Komepeyv
Phrase Structure Gtammars	Rêzmananê Binyada Frazan
Phrase Structure Rules	Rêzikên Binyada Frazan
Portmanteau	Portmanto
Possessive	Xweyîtî
Possessive Adjectives	Rengdêrên Xweyîtiyê
Possessive Pronouns	Cînavêñ Xweyîtiyê
Postmodifiers	Paşmodîfiyeker
Postposition	Paşdaçek
Predicate	Pêveber
Prefix	Pêşgir
Premodifiers	Pêşmodîfiyeker
Preposition	Pêşdaçek
Prepositional Phrase	Fraza Pêşdaçekî
Prescriptive Grammar	Rêzimana Rêzikparêz
Principles and Parameters Theory	Teoriya Prensîb û Parametreyan
Prosody	Prosodî
Quantifier	Çendiker
Reciprocal Pronouns	Cînavêñ Hevûdinî
Recursive	Xwedubarekirin
Reflexive Pronouns	Cînavêñ Vegerok
Reflexives	Vegerok
Relative	Peywendî/Pêwendî
Relative Clause	Hevoka Pêwendiyê/Hevoka Peywendiyê
Relative Pronouns	Cînavêñ Peywendiyê

Replacement	Pevguherîn
Sentence	Riste
Specifier	Diyarkir
Structural	Binyadî
Structuralism	Binyadîgerî
Structuralist	Binyadîger
Structure	Binyad
Subject	Biker
Suffix	Paşgir
Superlative	Pileya Bilind
Surface Structure	Binyada Rûser
Syntactic Structure	Binyadêن Peyvrêziyî
Syntagmatic	Rêzikî/Asoyî
Syntax	Peyvrêzi/Sentaks
System	Pergal
The Economy Principle	Prensîba Ekonomiyê
Theme	Tema
Topic	Mijar
Transformational	Veguherînî
Transformational-Generative Grammar	Rêzimana Veguherînî-Hilberîner
Transitive	Gerguhêz/Têper
Universal Grammar	Rêzimana Gerdunî
Verb	Lêker
Verb Phrase	Fraza Lêkerî
Voice	Avanî
Voice Phrase	Fraza Avanî/Fraza Avaniyê
X-Bar Theory	Teoriya X-Barê
Zero Case	Rewşa Sifirê